



**NÛBIHAR  
AKADEMÎ**

Kovara Akademîk a Xebatên Kurdî ya Navneteweyî  
International Peer-reviewed Journal of Kurdish Studies

**Cild 2 Jimar 8 Sal 4 - 2017**

**Volume 2 Issue 8 Year 4 - 2017**



**Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti.**

Büyük Reşitpaşa Cad. Yünni İş Merkezi No: 22/29

Vezneciler – Fatih / İSTANBUL

Tel & Faks: 0212 519 00 09

www.nubiharakademi.com | email: nubiharakademi@gmail.com

**Li Ser Navê Pak Ajansê Xwediyê Kovarê û Bepirsê Karên Nivîsê**  
**On Behalf of Pak Agency the Owner of Journal and Responsible Editor**  
Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti. adına Sahibi ve Yazışları Müdürü  
Süleyman Çevik

**EDİTÖRÊ JIMARÊ / ISSUE EDITOR**

**Ergün, Zülküf / Dr., Mardin Artuklu University, Turkey**

**ALİKARÊ EDİTÖR / ASSISTANT EDITOR**

**Subaşı, Kenan / Mardin Artuklu University, Turkey**

**DESTEYA EDİTÖRİYÊ / EDITORIAL BOARD**

**Acar, Hayrullah / Assoc. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey**

**Adak, Abdurrahman / Assoc. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey**

**Aydın, Tahirhan / Assoc. Prof., Indiana University, USA**

**Baluken, Yusuf / Dr., Independent Scholar, Turkey**

**Beltekin, Nurettin / Asst. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey**

**Bor, İbrahim / Assoc. Prof., Indiana University, USA**

**Ergün, Zülküf / Dr., Mardin Artuklu University, Turkey**

**Tek, Ayhan / Asst. Prof., Mus Alparslan University, Turkey**

**Türel, Vehbi / Assoc. Prof., Bingöl University, Turkey**

**ÇAP / PRINTED BY**

Alioğlu Matbaacılık Bas. Yay. ve Kağ. San. Tic. Ltd. Şti. Orta Mah.  
Fatin Rüştü Sk. No: 1-3 / A Bayrampaşa / İstanbul

**MİZANPAJ & PAGE DESIGN**

Şemal Medya (semalmedya@gmail.com)

**Kovara Nûbihar Akademîyê ji aliyê van îndeksan ve tê naskirin:**  
The Journal of Nûbihar Akademî is accepted by these indexes:



**INTERNATIONAL**  
Scientific Indexing



Eurasian  
Scientific  
Journal  
Index



Nûbihar Akademî kovareke bihekem, akademik û navneteweyî ye. Di demsalên bihar û payîzê de salê du caran tê weşandin. / Nûbihar Akademî is an international peer-reviewed academic journal. It is published biannually in spring and autumn.

Yayın Türü: Yerel Süreli Yayın.  
ISSN: 2147-883X

## **DESTEYA ŞÊWRÊ / ADVISORY BOARD**

**Akın**, Salih / *Assoc. Prof., Rouen University, France*

**Bozarıslan**, Hamit / *Prof., École des Hautes Études en Sciences Sociales, France*

**Bruinessen**, Martin Van / *Prof., National University of Singapore, Singapore*

**Jalil**, Jalile / *Prof., Instituta Kurdzaniyê, Wien, Austria*

**Kreyenbroek**, Philip G. / *Prof., Georg-August University, Germany*

**Musa**, Abdulwahab Khalid / *Assoc. Prof., Zakho University, Kurdistan-Iraq*

**Vali**, Abbas / *Prof., Boğaziçi University, Turkey*

**Yeğen**, Mesut / *Prof., İstanbul Şehir University, Turkey*

## **HEKEMÊN VÊ JIMARÊ/REVIWERS OF THIS ISSUE**

**Acar**, Hayrullah / *Assoc. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*

**Adak**, Abdurrahman / *Assoc. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*

**Aslanoğlu**, Osman / *Asst. Prof., Dicle University, Turkey*

**Bingöl**, İbrahim / *Dr., Mardin Artuklu University, Turkey*

**Çeçen**, Ramazan / *Independent Scholar, Mardin, Turkey*

**Ergün**, Zülküf / *Dr., Mardin Artuklu University, Turkey*

**Keskin**, Necat / *Asst. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*

**Mohammaed**, Tareq / *Assoc. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*

**Tek**, Ayhan / *Asst. Prof., Mus Alpaslan University, Turkey*

**Vali**, Shahap / *Asst. Prof., Mardin Artuklu University, Turkey*



## NAVEROK / CONTENTS

**JI EDÎTOR/EDITORIAL..... 07-10**

زولف و ده‌لله‌ته‌کانی له شیعرێ مه‌لای جزیری دا

The Connotation of Hair Flattop in Jaziri Poetry

**HÊMIN OMAR AHMAD.....11-40**

**Qonaxa Stenbolê di Edebiyata Kurdî ya Modern de**

The Istanbul Period in the Modern Kurdish Literature

**RAMAZAN ÇEÇEN .....41-63**

**Giredayeyê Edebîyatê Polîtîkî de Romanê Kılama Şilane**

The Novel Named Kılama Şilane (The Song of Şilane) in the

Context of the Political Literature

**İLYAS AKMAN .....65-80**

**Lêkolîneke Berawirdî li ser “The Interlopers” û “Bêbextî”yê**

A Comparative Study on “The Interlopers” and “Bêbextî”

**FERHAT YILMAZ.....81-95**

**WERGEREK / A TRANSLATION**

**Lêkolînên Kurdolojîyê li Îranê**

**Destpêkek ji bo Mijar û Xwendinan**

**EHMED MIHEMEDPÛR & MEHDÎ RIZAÎ..... 99-137**

**DOKUMENTEK / A DOCUMENT**

**Nivîsteka Medreseya Mîr Hesenê Welî**

An Inscription of Madrasah of Mîr Hesenê Welî

**HANÎFÎ TAŞKIN..... 141-148**



## Ji Edîtor

Ji Nûbihar Akademiye silav û rêz, di dawiya sala çaran û jimara heştan de em bi kêfxweşi radigihînin ku Nûbihar Akademî niha di her çar îndeksên navneteweyî yên *International Scientific Indexing* (ISI), *Acedemic Resource Index*, *Eurasian Scientific Journal Index* (ESJI) û *Directory of Research Journals Indexing* (DRJI) de tê nasîn. Îndeks ji bo girîngiya akademîk a kovarekê û belavbûna xebatên akademîk gelek pêwîst in. Ji aliyê din ve hebûna kovarên bi vî rengî di warê kurdnasiyê de ji bo akademîsyenên Kurd ên ku dixwazin pileya xwe ya zanistî bilind bikin derfeteke baş e. Em hêvî dikin piştî vê pêşketinê gotarên baştir ji bo NAYê bînin şandin da ku em jî di dewlemendkirina kurdnasiyê de beşdariyêke çalaktir bikin.

Herwekî jimarên me yê berê di vî jimarê de jî em bi çar gotaran, wergerek û dokumentek pêşberî we ne. Hêmin Omar Ahmad bi gotara xwe ya “Zulf û Delaletekanî le Şîrî Melay Cizîrî da” piştî ku li ser wateya ferhengî û çemkî ya zulfê radiweste vê çemka tesewufî bi awayekî dorfireh di helbestên Melayê Cizîrî de vedikole û diyar dike ku Melayê Cizîrî digel wate û bikaranînên wê yê nerîtî hem di asta rewanbêjîyê de hem jî di asta îrfanî de wateya zulfê berfirehtir û kûrtir kiriye.

Ramazan Çeçen di gotara xwe ya “Qonaxa Stenbolê di Edebiyata Kurdî ya Modern de” li ser destpêka cureyên nû yê edebiyata Kurdî radiweste. Ji bo vî armancê pêşî behsa peywendîya bajaran û edebiyatê dike û li Stenbolê sedemên geşbûna edebiyata Kurdî berçav dike. Paşê jî di mînaka helbestên Hacî Qadirê Koyî û Ebdurehîm Rehmî Hekarî de li ser nûkirina helbesta Kurdî, yekem çîroka modern a Fuad Temo, şanoya yekem a Ebdurehîm Rehmî Hekarî û wergerên edebî yê Xelîl Xeyalî radiweste. Bi vî awayî Çeçen rewş û dîmena giştî ya qonaxa Stenbolê ya edebiyata Kurdî û paşxaneyê wê ya dîrokî destnîşan dike.

Îlyas Akman gotara xwe bi Kurdiya Zazakî nivîsiye û di bin sernavê “Giredayeyê Edebiyatê Polîtîkî de Romanê Kılama Şilane” de li ser naveroka romana *Kılama Şilane* ya Îlhamî Sertkaya hûr dibe. Li gor nivîskar ev roman dikeve çarçoveya romaneke siyasî û li dor kêşeya Kurdî hatiye hûnandin. Ji ber vî jî di romanê de li ser hin mijarên diyarkirî radiweste ku peywendîya wan bi kêşeya Kurdî re heye. Avakirina nasnameyê û jiyana gundan, qedexekirina zimanê Kurdî, bêdadî, wekhevî û hişyarbûn di metropolan de, derbeya 1980î û diyardeya mişextî û xerîbiyê mijarên sereke yê vî vekolînê ne.

Ferhat Yılmaz bi gotara xwe ya “Lêkolîneke Berawirdî li ser “The Interlopers” û “Bêbextî”yê” diyar dike ku Celadet Bedirxan bi nasnavê Bişarê Segman çîroka xwe ya “Bêbextî”yê bê ku nav û çavkanî diyar bike ji çîroka “The Interlopers”a Hector Hugh Munro adapteyî Kurdî kiriye. Nivîskar ji bo îspatkirina vê îdîaya xwe di çarçoveya bûyer, leheng, cih û demê de çîrokan berawird dike û nîşan dide ku serçaviya çîroka Celadet Bedirxan çîroka Hector Hugh Munro ye.

Wergera vê jimarê di bin sernavê “Lêkolînên Kurdolojiyê li Îranê Destpêkek ji bo Mijar û Xwendinan” ji aliyê Ferhat Yılmaz ve hatiye kirin. Ev gotar ji aliyê Ehmed Mihemedpûr û Mehdî Rizai ve hatiye nivîsîn û herwekî ji navê gotarê jî diyar e lêkolînên kurdnasiyê yên li Îranê dide nasandin. Her du nivîskar piştî kategorîkirina giştî, xebatên kurdnasiyê yên di warê dîrok-siyaset, civak, çand û erdnîgariyê de didin nasandin û wêneyê giştî yê xebatên kurdnasiyê li Îranê derdixin holê.

Dokumenta vê jimarê jî bi sernavê “Nivîsteka Medreseya Mîr Hesênê Welî” ji aliyê Hanifi Taşkın ve hatiye amadekirin. Taşkın di vê xebatê de pêşî derbarê mîrên Miksê de bi giştî agahî dide û paşê di çend çavkaniyan de bi taybetî li ser Mîr Hesênê Welî radiweste. Herî dawî Taşkın cih dide wêneyê nivîsteka Medreseya Mîr Hesênê Welî û bi rêya nivîsên ser vê nivîstekê dîroka mirina Mîr Hesênê Welî destnîşan dike ku ew ji 1457/58ê mîladî ye.

**Dr. Zülküf ERGÜN**  
**Edîtorê Jimarê**



## Editorial

Greetings and regards from Nûbihar Akademî (NA), at the end of the fourth year we pleased to announce that the journal of Nûbihar Akademî is indexed by four international indices such as *International Scientific Indexing* (ISI), *Acedemic Resource Index*, *Eurasian Scientific Journal Index* (ESJI) and *Directory of Research Journals Indexing* (DRJI). Indices are necessary for academic value of a journal and spread of academic works. On the other hand, existence of such journals in Kurdish Studies is a good opportunity for Kurdish academics who are tend to their academic titles. We hope that better articles would be sent to NA and we would participate more actively to enrich Kurdish Studies.

As in our former issues, this issue of NA features four articles, a translation and a documentary. In his article “The Connotation of Hair Flattop in Jaziri Poetry” Hêmin Omer firstly introduces lexical and terminological meanings of *hair flattop*, then takes this sufic term under scrituny in Molla al-Jazari’s poems and finds out that al-Jazari extend and deepens both rhetoric and wisdom meanings of *hair flattop* alongside its traditional meanings.

Ramazan Çeçen focuses on the emerge the new genres of Kurdish literature in his article “The Istanbul Period in the Modern Kurdish Literature”. In his articticl he firstly presents the relationship between cities and literature and gives the reasons of development of Kurdish literature in Istanbul. Then he focuses on the modernization of Kurdish poetry based on examples from Hadji Qadir Koyi and Ebdurehim Rehmi Hekari’s poems, moreover he focuses on the first modern shortstory by Fuad Temo, the first theatre paly by Ebdurehim Rehmi Hekari and literary translations by Khalil Kheyali. Thus Çeçen put forwards a general situation and perspective of Istanbul period of Kurdish literature and its background.

Ilyas Akman’s article titled “The Novel Named Kilama Shilane (The Song of Şilane) in the Context of the Political Literature” is in Zazaki Kurdish, it focuses on the content of novel *Kilama Shilane* by İlhami Sertkaya. To the author the novel is a political one that fictionalized around the Kurdish question. Therefore the novel focuses on some certain topics which are in relation with the Kurdish questions. The formation of identity and village life, ban on Kurdish language, injustice, ega-

lite and consciousness in cities, military coup in 1980, exile and homesickness are leading topics of this study.

In his article “A Comparative Study on ‘The Interlopers’ and ‘Bêbextî” Ferhat Yılmaz reveals that Celadet Bedirkhan with his penname Bishare Segman adapts his short story named “Bêbextî” to Kurdish from Hector Hugh Munro’s “The Interlopers” without any names and referances. The researcher compares both stories in terms of event, characters, place and time in order to proof his claim and shows that Celadet Bedirkhan’s story springs from Hector Hugh Munro’s.

The translation part of this issue named “ Kurdish Studies in Iran –An Introduction to Topic and Readings” is done by Ferhat Yılmaz. The article is written by Ehmed Mihemedpûr and Mehdi Rizai and as it is clear from the title it introduces the Kurdish studies in Iran. Both authors firstly do a general categorization then they introduce Kurdish studies on history, politics, social, culture and geography, thus they gives a general view of Kurdish studies in Iran.

The documentary of this issue named “An Inscription of Madrasah of Mîr Hesenê Welî” is prepared by Hanifi Taşkın. Taşkın firstly presents information on Emirats of Miks, then he focuses on Mîr Hesenê Welî from the light of some sources. Lastly, he presents photos of the scripts on Madrasah of Mîr Hesenê Welî, thus he reveals the date of death of Mîr Hesenê Welî which is 1457/58 A.D.

**Dr. Zülküf ERGÜN**  
**Issue Editor**

## زولف و ده‌لاه‌ته‌کانی له شیعرى مه‌لای جزیری دا

# The Connotation of Hair Flattop in Jaziri Poetry

Hêmin OMAR AHMAD\*

### پوخته

زولف و ده‌لاه‌ته‌کانی له شیعرى مه‌لای جزیری دا ناوونیشانی ئەو توێژینه‌وه‌یه تیشك ده‌خاته سه‌ر واتای عیرفانی په‌یفی زولف وه‌ك ئەندامێك له‌ پرووخساری مرۆف و، خستنه‌ ناو‌قالبی شیعرى عیرفانی و په‌سندانی له‌ چوارچێوه‌ی ئیستیتیکى ده‌ق و چینی وێنه‌ی شیعریه‌وه‌ . بێگومان شاعیرانی کلاسیکی کورد به‌ شیعرى سۆفییانه‌ به‌ناویانگن و له‌ کانیای ته‌سه‌ووفی ئیسلامیدا تام و بۆنیان وه‌رگرته‌وه‌ و له‌ سه‌رووی هه‌مووشیانه‌وه‌ مه‌لای جزیری كه‌ به‌ ده‌ستپێکی شاعیرانی بواری عیرفان داده‌نریت، ناوبراو زاراوه‌کانی ته‌سه‌ووف و عیرفانی به‌ شێوه‌یه‌کی زۆر له‌ناو شیعره‌کانیدا به‌کارهێناوه‌ و له‌ نێو ئەو زاراوانه‌شدا كه‌ به‌ پێژه‌یه‌کی زۆر به‌کارهێناوه‌ بریتیه‌ له‌ زولف و هاوواتا‌کانی له‌ ده‌روبه‌ر (سیاق)ی جوداجودادا . ئەم توێژینه‌وه‌یه به‌ پشت به‌ستن به‌ میتۆدی هیرمینۆتیکى سۆفییانه‌ جۆراوجۆری به‌کارهێنانی ده‌لاه‌ته‌کانی زولف ڕوون ده‌کاته‌وه‌، بۆ ئەم مه‌به‌سته‌ش باسه‌كه‌ به‌سه‌ر چهند سه‌ره‌بابه‌تیک دابه‌ش کراوه‌، له‌ گرنگترینیان: ناساندنی زولف و شوێنی له‌ناو ئەده‌بیاتی عیرفانی، زولف و دل، زولف و خال و زولف و شێوه‌کانی و مانا عیرفانییه‌کانی لای مه‌لای جزیری .

وشه‌ی کللی: زولف، كه‌ثره‌ت، وه‌حده‌ت، دل، شیعرى عیرفانی،

مه‌لای جزیری

\* زانکۆی سۆران، فاکه‌لتیی ئاداب،  
به‌شنى کوردی، هه‌روه‌ها مامۆستای  
مێقان له‌ به‌شنى کوردی، زانکۆی  
بێنگۆل.

Ass. Prof., Department  
of Kurdish Language  
and Culture, Bingol  
University, Turkey.

e-mail:

heminahmad40@gmail.com

### ABSTRACT

The connotation of hair flattop in Jaziri poetry is the title of this research based on the meaning of gnosis of hair flattop word as a member of human's face, and put it to the content of gnostic poetry. This knowledge gives a poetry field as a text of gnosis. All classic poems have been well known as gnostic users and taken good benefits from Islamic gnosis for their poetries, and particularly

Malaye Jaziri was one of the first poems who known as gnostic poems and he used all dialects of quietism and gnosis from his poetries. In his quietism and gnosis, hair flattop and its derivates have been used in different sides. This research has been done based on the explanation of quietism and gnosis for hair and its derivates in the poetries of Malaye Jaziri. This research is classified into some subjects as follows; "Definition of Hair Flattop and Its Position in the Kurdish Gnostic Literature", "Hair Flattop and Heart", "Types of Hair Flattop and Its Meaning according to Malaye Jaziri. In addition, this research focuses on, effluent, heart, gnostic poetries, and key words of quietism and gnosis by Malaye Jaziri.

**Keywords:** Hair Flattop, Kesret, Wahdat (Unity), Heart, Gnostic Poetry, Malaye Jaziri.

## 1. پێشهکی

شيعری کلاسیکی کوردی هەر له سه‌ره‌تاوه به بۆن و به‌رامه‌یه‌کی سۆفییانه‌وه هاته ناو گۆره‌پانی ئەده‌بیاتی کوردی و هاوشیوه‌ی شيعری فارسی و عه‌ره‌بی له‌و سه‌رده‌مه‌دا زۆرتین مۆتیش و بنه‌ماکانی ئەو بزاشه‌ی ئاوێزه‌ی چینه‌کانی خۆی کرد. بۆیه هەر له باباته‌هیره‌وه بگه‌ر و ده‌گه‌سته‌پێک و تا ده‌گاته سه‌ره‌تاکانی قوتابخانه‌ی شيعری کرمانجی ژووورو و دواتریش، ئەم بنه‌مايه‌ی ته‌سه‌ووف و عیرفان بووه مۆرکێکی چه‌سپاو له‌ناو شيعری کوردیدا.

زولف و ده‌گه‌سته‌پێک له‌و مۆتیشه‌ی بآکیشانه، وێرای ئەوه‌ی ئەندامه‌یکه له ئەندامه‌کانی له‌شی مۆف، ده‌گه‌سته‌پێک سه‌رنج ڕاکێشه‌کانی دیکه بۆته‌ بابه‌تی شيعر و له چوارچێوه‌ی ئیستیتیکدا ته‌ماشای کراوه. ئەمه‌ ده‌گه‌سته‌پێکی گشتی، به‌لام له هورده‌بوونه‌وه‌دا بۆ قوولایی بابه‌ته‌که و چۆنه‌تی ته‌وزیف‌کردنی بۆ ناو ده‌قی کلاسیکدا واته‌ و ده‌لاله‌تی جۆراوجۆری له‌خۆگرتوه‌وه. له‌و روانگه‌وه ئەده‌بیاتی سۆفییانه که‌م تا زۆر په‌یوه‌ندی له‌گه‌ڵ ئەم وشه‌یه‌ش هه‌یه و شاعیران له‌ناو شيعره‌کانیادا ده‌گه‌سته‌پێک بۆ گوزارشت‌کردن له‌ خۆشه‌ویستی خودایی و هه‌روه‌ها ده‌گه‌سته‌پێکیش بۆ شيعریه‌تی ده‌ق ته‌ماشایان کردوه. له‌م سۆنگه‌یه‌دا «مه‌لای جزیری»<sup>١</sup> و ده‌گه‌سته‌پێک که شيعره‌کانی له‌ناو سۆفیه‌گریدا رسکاوه، به‌چه‌ندین

١ مه‌لای جزیری، نا‌قی و ئەحمه‌ده و نا‌قی بابی و محمه‌ده، خه‌لکی جزیرا بۆتانه. ل سا‌لا ٩٧٥ی مشه‌ختی به‌رانبه‌ری (١٥٦٧-١٥٦٨)ی زایینی ژ دایک بوویه و ل سا‌لا ١٠٥٠ی مشه‌ختی، به‌رانبه‌ری ١٦٤٠ی زایینی چوویه به‌ر دلقانیا خۆدی. شێخ ئەحمه‌دی جزیری ناسنا‌قین (مه‌لای، مه‌لا و نیشانی) د هوزانین خودا بکار نینا‌ینه. ده‌می ژ یی و ی ٣٢ سال ل گوندی سترباسی ل نزیکێ نامه‌دی و ژ مه‌لایه‌کی دبیژنی: مه‌لا طاه‌ا نیجا‌زا مه‌لاتیی و مرگرت و بوو مه‌لایه‌کی دوا‌ده‌ده‌ علم و بوو ئیک ژ سه‌یدا‌یین مه‌دره‌سا سور ل جزیری. مه‌لای جزیری

واتای جودا و له دهو رویه ر (سیاق) ی جودادا له گه ل ئەم په یقه دا کار لیککی کردوه.

ئەم توێژینه وهیه ” زولف و دهلاله ته کانی له شیعی مه لای جزیری دا ” به پێی میتۆدی تهئو یل (هیرمینۆتیککی) که تێیدا دیوی دووه می واتای ده رپرینه کان لیک ده داته وه و پالپشت به که له پووری ته سه وه وفی ئیسلامی هه ولیدا وه بناغه و بنه ماکانی په یقه که و دهلاله ته کانی و چۆنیه تی رۆل هه بوون له چینی دهق و به خشی نی شیعی ریه ته به دهقه که دا، شیبکاته وه و له چوارچی وه ی عیشق و هیزی وشه دا شروقه بیان بکات. بۆیه له سنووری لیکۆلینه وه که دا ته نیا دیوانی مه لای جزیری به نمونه وه رگیرا وه و له و نپوهنده شدا زیاتر له سه ر په یقی زولف سه نگراره ته وه و له بهر فراوانبوونه که ی نه توانا وه هه موو نمونه کانی زولف له دیوانه که و وشه نزیکه کانی بخریته نیو چوارچی وه ی لیکۆلینه وه که<sup>۲</sup> و له ژیر چند سه ره مزاریککی وهک (ناساندنی زولف، زولف و پینگه که ی له ناو ته ده بیاتی عیرفانیدا و زولف لای مه لای جزیری و په یوه ندی له گه ل مۆتیقی تر، زولف و دل، زولف و نوور، زولف و خال و شیوه کانی زولف له شیعی جزیری و رۆلی خواستن له چینی زولف و شیوه ئاسایی و نا ئاساییه کانی زولف لای جزیری و واتا نه رتییبه کانی زولف ..) به وردی توێژینه وه ی له باره وه کرا وه.

## 1.2 ناساندنی زولف

### 1.1.2 زولف له رووی زمانه وه

ئەم وشه یه و پیرای ته وه ی له ناو کورد و به شیک له گه لانی ئیرانیشدا هه یه. به لām ته گه ر بۆ میژوو بگه رپینه وه له زمانی ئاویتساییدا وهک zarfan به کارهاتوه، که له فره هه نگه کانی فارسیدا به شیوه ی جۆراوجۆری وهک زفرین، زوفرین، زورفین، زرفین، زلفین... هتد هاتوه. (قلب زاده: ۱۵۰، ۱۳۸۳) ته گه رچی له ناو ته ده بیاتی فارسیدا و به تاییه تی شیعی کۆنی فارسی هه ر به ” زلف ” جینی گرتوه. ته وه ی په یوه ندی به زمانی عه ره بیسه وه هه یه، کت و مت ئەم وشه یه له قورئانی پیرۆزدا نه هاتوه، به لām رۆنانه که ی به کارهاتوه، ته ویش به شیوه ی (زلفا) که له تاییه تی ۱۱۴ ی سوپه تی هود هاتوه (اقم الصلاة

بـی دوونده بـی چووی چونکی ژن نه ئینابوو و گۆرا وی بـی د سه ر داقه کیقه ل ئاقا هـیـی مه ره سا سوـر. (دۆسکی: ۲۰۰۵، ۱۹-۲۶).

۲ له بهر زۆر دوبرانه بوونه وه ی ناوی دیوانه که له په ر او یزه مکاندا، هه ر کاتیک نمونه ی شیعی ریککی مه لای جزیری مان هینایینه وه، له ته نیشتی شیعی مه که ژماره ی لاپه ره ی دیوانه که مان نوو سیوه و هه ر ئەو دیوانه شمان وهک سه ر چا وه نمونه کان به کار هینا وه که له لیستی سه ر چا وه مکاندا تو مار مان کردوه.

طرفی النهار وزلفا من اللیل) و لیره‌دا هه‌مان واتای زولف ناگه‌یه‌نیت، به‌لام له پێ‌خستنی وشه‌کاندا له‌گه‌ڵ وشه‌ی شه‌و (لیل) هاتوووه و وه‌ک بگوتری دهر‌وازه‌ی شه‌و، په‌رچه‌می شه‌و، یان تاریکی‌ی شه‌و، که‌ ئه‌مه‌ش له‌ په‌نگ و تاریکی‌یدا ده‌بنه‌وه خالی هاویه‌ش له‌گه‌ڵ زولف و دواتریش هه‌ر ئه‌م بنه‌مایه‌یه‌ لای شاعیران په‌واجی پێ‌ ده‌دریت به‌وه‌ی زولف به‌ شه‌و بچویندریت (ابن منظور، کلمه‌ زلف). لی وشه‌که‌ گۆرانکاری به‌سه‌ردا دیت و له‌ناو فه‌ره‌ه‌نگه‌کانی عه‌ره‌بیدا له‌سه‌ر بنچینه‌ی شیعه‌ره‌کانیان وشه‌کانی (القرن، الغدائر، الغدران، الغدیره، شوشه، الجمائر، الصدغ) به‌کارهاتوون. به‌لام به‌ شیوه‌یه‌کی گشتی په‌یقی زولف زیاتر له‌ناو ئه‌ده‌بیاتی فارسییدا به‌کارهاتوووه و کورد و تورکی‌ش هه‌مان وشه‌یان به‌کاره‌یناوه‌.

له‌ فه‌ره‌ه‌نگه‌ کوردیه‌کانیشدا به‌ ”زلف“ (خال: ۲۶۰، ۲۰۰۵) و ”پرچ، که‌زی، بسک، ده‌سته تووکه‌ سه‌ری سه‌ر لاجانگ“ (هه‌ژار: ۱۳۶۹، ۱۴۰۹) و ”زولف، زووف، بژی، گودله، فر، که‌زی، که‌زیه، تیت، ئه‌گرجه، چینک، بسک، گیشک، قژی سه‌ر“ (روحانی: ۱۳۶۵) و ”گیس، قژ، ئه‌گرجه، گیسو، په‌رچه‌م، ئه‌و به‌شه‌ تووکه‌ی ئافه‌رته‌تانه که‌ به‌ سه‌ر نیوجاوانیدا شو‌ربیته‌وه“ (موکریانی: ۱۹۹۹، ۵۴۶) هاتوووه. به‌لام وشه‌که‌ ئه‌و کاته‌ی له‌ ده‌قی شیعه‌ری کلاسیکی کوردیدا به‌کاردیت، به‌ پله‌ی یه‌که‌م زولف و پاشان گیسوو و کاکۆل و بسک... دین.

## 2.1.2 زولف له‌ ئه‌ده‌بیاتی عیرفانیدا

ئه‌گه‌رچی زمانی شیعه‌ر جۆریک لادانی تێدایه، ئه‌م لادانه‌ زۆر بوار ده‌گرێته‌وه و ته‌نانه‌ت زۆر جارن له‌ رووی وشه‌یه‌شه‌وه‌ له‌ پێ‌وه‌ی ئاسایی خۆی لاده‌دات و هه‌ر ئه‌مه‌شه‌ شیعه‌رییه‌ت ده‌خاته‌ ناو ده‌ماره‌کانی ده‌ق، بۆیه‌ هه‌تا رێژه‌ی لادان له‌ هه‌موو بواره‌کاندا زیاتر بیت، ده‌ق به‌ره‌و بال‌تر هه‌نگاو‌ده‌نیت. به‌ مه‌رجێک ئه‌م لادانانه‌ بنه‌ما و بنچینه‌یه‌کیان هه‌بیت، که‌ به‌شیکیان له‌ چوارچۆیه‌ی زانسته‌کانی ناو په‌وانبێژیدا قالیان بۆ داده‌پێژریت و به‌شیکی دیکه‌شیا هه‌ر له‌ چوارچۆیه‌ی وشه‌کاندا ره‌وت و رێبازه‌ ئه‌ده‌بی و ئایینی و عیرفانییه‌کان واتای دیکه‌یان بۆ ده‌تاشن. هه‌ر ئه‌مه‌شه‌ ته‌ئویل و هیرمنیۆتیک دینیتته‌ کایه‌وه‌ و له‌ رووکه‌شدا له‌ چوارچۆیه‌ی مزاریکدا خۆی به‌رجه‌سته‌ ده‌کات و له‌ واتا ناوه‌کیی و نادیاره‌که‌شیدا خۆی ده‌خزینیتته‌ ناو واتای دیکه‌وه‌.

له‌ناو ئه‌ده‌بیاتی عیرفانیدا، به‌شیکی زۆر له‌ په‌یقه‌کان، مه‌دلۆلی دیکه‌ له‌خۆیان هه‌لده‌گرن، ئه‌مه‌ش به‌ مه‌به‌ستی گه‌یانندی ئه‌و په‌یامه‌ رۆحیی و ئاسمانیه‌، یان گوزارشت کردنه‌ له‌ بیر و هزر و ئایدیایه‌که‌یان

که به درێژایی میژووی ئەدهبیاتی عیرفانی واتاکان له هه‌لبه‌ز و دابه‌ز دابوونه و سیمایه‌کی دیکه‌یان نیشانداوه. به‌لام به کۆی گشتی ده‌رده‌که‌وێت که هه‌موو ئەو که‌ره‌سته عیرفانیانه تا راده‌یه‌کی زۆر به چینگیری ماونه‌ته‌وه و سه‌دان ساڵه شیعی گه‌لانی مسوڵمانیان ته‌نیوه. له‌به‌رئه‌وه شیعی کلاسیکی کوردیش که زۆری هه‌ره زۆری هه‌لقوڵاوی ئەو دونیا عیرفانییه‌یه و ناگرێ له ئاست شیکردنه‌وه و چۆنیه‌تی به‌کاره‌ینانی ئەو که‌ره‌ستانه ده‌سته‌وه‌ستان بین و ناچارین به‌ره‌و شیکاری ئەو بنه‌مایانه بچین که خۆیان له‌گه‌ڵ ئەو جیهانه‌دا په‌یوه‌ست کردوه، بۆیه دێین له سیاقی په‌یقه‌کانه‌وه واتای دیکه‌یان لێ هه‌لده‌کرێین، نه‌ک به زۆر واتایان لێ باربه‌که‌ین، ئەویش به پالپشتی ئەو واتایانه‌ی که به درێژایی میژووی سوڤیگه‌ری و عیرفان له ده‌قه‌کاندا بارکراون.

له نیو واژه و تیگه‌ه و زاراوه به هینما و ره‌مز چنراوه‌کاندا که گرنگیه‌کی فراوان و زۆری له‌ناو زمان و هه‌روه‌ها شیعی عاریفانه و عاشقانه هه‌یه، تیگه‌ه و زاراوه‌ی زولفه، ئەم زاراوه‌یه به گشتی له پال هاوواتاکانی وه‌ک گیسوو، توڤره، جعد، موو... له زۆرتین په‌یقه به‌کارهاتووه‌کانی عاریفانه و عاشقانه له شیعی فارسیدا (قلیزاده ۱۳۸۳: ۱۴۹) ته‌نازه‌ت له شیعی نه‌ته‌وه مسوڵمانه‌کانیشدا چینگه‌یه‌کی زۆری هه‌یه، به‌تایبه‌تی له شیعی کوردیدا که هه‌م له رووی عیرفانییه‌وه زیاتر له بن کاربه‌گه‌ری ئەدهبیاتی عیرفانی فارسیدا ماوه‌ته‌وه ده‌بیریت.

له‌ناو بنه‌ما عیرفانییه‌کاندا زولف واتای دیکه‌ی لێ بارکراوه، که به‌گشتی بۆته ره‌مزی غه‌یب و ناسنامه‌ی حق و حه‌قیقه‌ت و هه‌روه‌ها ته‌جه‌للای سیفات و تووڤدی خودا، ته‌جه‌للای جه‌مال و جوانی، که‌ثره‌ت و ده‌رکه‌وتنی بنگه‌هی حق، ئاسته‌نگه‌کانی نه‌پنی خودایی له‌به‌رده‌م ڕینگای سلووک و ڕیبار، هه‌روه‌ها نیشانه‌ی حیجاب و داپۆشینی حق و ئاسته‌نگه‌ دیار و به‌رچاوه‌کانی ڕینگای عیشقی راسته‌قینه‌یه. هه‌ر یه‌ک له‌مانه‌ لای که‌سانیک و لای قوتابخانه‌یه‌ک په‌یره‌و کراون. بۆ وینه‌ خاوه‌نی کتییی (قواعد العرفاء واداب الشعراء) نووسیویه‌تی که ”زولف غه‌یبی بنه‌ما و ناسنامه‌ی حه‌قه... ئاماژه‌یه به ته‌جه‌للای جه‌لال له‌باره‌ی وینه‌ی شیوه و لاشه.. هه‌ندیکیش زولف به که‌ثره‌ت ده‌چوین که ده‌بینه‌ داپۆشه‌ری رووی وه‌حده‌ت، چونکه به لابردنی په‌رده‌ی که‌ثره‌ت، رووی وه‌حده‌ت دێته‌ بینین و خویاکردن“ (قلیزاده: ۱۳۸۳، ۱۵۴).

ته‌هانه‌وی ده‌لێ: زولف گوزارشته له تاریکیی کوفر، یان گرفت له‌ناو شه‌ریعه‌ت و ئاسته‌نگه‌کان له ڕینگا و ته‌ریقه‌ت، هه‌موو که‌ثره‌تیک له وجود و هه‌موو داپۆشین ”حجاب“ ێک ده‌شی‌ وای دابنێی که زولفه (ته‌هانوی: ۱۹۹۶، ۹۰۸).

ئىمام محەممەدى غەزالى لەم بارەوہ گوتیوہ تی: لە زولف و کوفر تیدەگەین و لە نووری رووخساریش نووری باوەر ڤیہ دەگەین. زولف زنجیرەى ئاستەنگ و ڤەفتارەکانی حەزرتی خوداوەندییە، کە کەسێ بیەوێت بە عەقڵ مامەلە لەگەڵ سەری موویەك بکات، لە سەیرو سەمەرەکانی حەزرتی خوداوەند بناسێ، یەك پینچ کە لە دەوری ویدایە ھەموو ژمارەکان شاش دەکا و ھەموو عەقلەکان مەست دەکات. (قلیزادە: ۱۳۸۳، ۱۵۰)

لاھیبجی لە شەرحی گولشەنی ڤازدا ئاماژە بووہ دەدات کە زولف ڤەردەى ڤووی مەجبوبە... لە ھەر کوێ زولف لەپیش ڤیگای داواکار و عاشق بێت، ھەرچەندە کە بشروات بە ئامانج و مەبەست ناگات. (لاھیبجی ۱۳۸۱: ۵۷۹)

سەید جەغفەری سەجادی لە فەرھەنگەکەى خۆیدا (فەرھنگ اصطلاحات و تعبیراتی عرفانی) دەنووسێت کە زولف لە زاراوہى سۆڤیاندا درکەبە لە ڤلەى ئیمکانی لە کوللییات و جوزئیات و مەعقولات و مەحسوسات و رووح و لاشە و جەوھەر و سیفەتەکانە، ھەرۆک درکەبە لە تاریکی کوفر (سجادی: ۱۳۷۸، ۴۴۳)، کە ئەمانە بەشیکیان دەچنەوہ ناو بواری زانستی کەلام و مەنتیق.

پیش ئەوہى شیعەر و دونیای عیرفانی ئاویتەى یەکتەرى بن، زولف و تەواوی ئەندامانی لاشەى مەرۆک تەنیا و ئا فەرھەنگیەکەى خۆیان ھەبوو، زیاتر بۆ مەبەستى دەڤرینی ھەستى ئارەزووبازییانەى مەرۆک بەکاردەھات و خۆى لە جوانیی و خۆشەویستیی لایەنى بەرامبەر دەدیتەوہ، بەلام دواى تیکەلبوونەکە زولف و خەسلەتەکانی وەك پینچاوپینچى زولف و بێ قەرارى زولف و ڤەریشانى زولف، ڤەشیی زولف، دامى زولف... ئەمانە چەمکەگەلێك بوون و ئاوا سیاقەکەیان ھاتە گۆڤرین و لەگەڵ جەلال و جەمالی ئیلاھى ئاویتەبوون و وەك لایەنیکى ڤەوانبێژى بووہ خواستن بۆ جیھانى کەترەت، لە ھەمان کاتیشدا زنجیری زولف، دامى زولف و حەلقەبى زولف وەك چواندن و خواستنیك بۆ جەزبە و کۆششى ئیلاھیبى ھاتوہ، کە لە زاراوہى عیرفانیدا جەزبە کۆشش و حالەتیکە کەسى عارف بەدەستى دەھینیت کە عاشق لە خۆى بێ خەبەر دەبیت (زیبائی نژاد: ۱۳۸۹، ۱۶۱).

## 2.2 زولف لای مەلای جزیری

مەلای جزیری وەك دامەزرێنەرى شیعری شیوہ غەزەل لە ئەدەبیاتی کرمانجی ژوورودا و ھاوشیوہى شیوازەکانی شیعری شاعیرانی فارس<sup>۳</sup> لە بنەما عیرفانییەکان قول بۆتەوہ و بە تەنیا ڤەیشی زولفی زیاتر لە

۳ لەم ڤووموہ تا ئیستا وێرای نامەیکى دکتورا بەناوی (عیشق لە نێوان مەلای جزیری و حافزی شیرازی) و تێزیکى ماستەر لەسەر بەراوردی کێشناسی ھەردوو شاعیر و نووسین لە شیوہى گوتاردا، بەراوردی جزیری



نه‌وه‌د جار به‌کاره‌یناوه، جگه له‌وه‌ی پاش سه‌روای شیعریکی ده‌به‌یتی په‌یقی ”زولف“ ه. ده‌توانین په‌یوه‌ندی زولف به‌چهند مۆتیقیکه‌وه به‌م شیوه‌یه‌ی خواره‌وه له شیعره‌کانی مه‌لای جزیری ده‌ستنیشان بکه‌ین:

## 1.2.2 دل و زولف

له‌ناو تیگه و زاراوه‌کانی عیرفان و ته‌سه‌ووفا و له چوارچێوه‌ی ئەندامه‌ شوینی له‌شی مرۆفدا، که بوونه‌ته که‌ره‌سته‌ی زاراوه‌ عیرفانییه‌کان، دڵ و زولف په‌یوه‌ندییه‌کی به‌تینیان پینکه‌وه هه‌یه و زۆرتین به‌به‌که‌وه‌هاتنیا هه‌یه. ته‌نانه‌ت له‌ دیوانی عاریفیکی دیار و ناسراوی وه‌ک حافزی شیرازیدا ”زولف و دڵ په‌کین له‌ هه‌ره به‌کاره‌ینره‌کانی جووت و شه‌یی شیعری ناوبراو و زیاتر له‌ ۷۸ جار به‌کارهاتوه“ (صیاد کوه و رحمانیان: ۱۳۹۲، ۶۱)، ئەمه‌ش زۆرتتر په‌یوه‌سته به‌ به‌های دڵ له‌ناو دونیای ئیسلامه‌تی و عیرفاندا، به‌وه‌ی که ”له‌ بوونی مرۆفدا دڵ وه‌ک عه‌رشه‌ی ره‌حمانه“ (گوهرین: ۱۳۸۰، ۲۳۹). ئەم گرنگیه‌ی دڵ وه‌ک ناوه‌ندی بیر و روانینه‌کانی مرۆقه و له‌ سیفاته‌ ته‌جه‌لییه‌که‌ی ئەودا کاروکرده‌وه‌کانیشه‌ی ره‌نگ ده‌داته‌وه، ته‌نانه‌ت جوژی په‌یوه‌ستبوونی مرۆف به‌ خودا دیارده‌کات، هه‌روه‌ک له‌ فه‌رمووده‌شدا وا چوینراوه که له‌ نیوان په‌نجه‌ی قودره‌تی خودا دایه: ”ان قلوب بني آدم كلها بين اصبع الرحمن، كقلب واحد، يصرفه حيث يشاء“ (القحطانی: ۱۴۲۱، ۴۴۷) بۆیه په‌یوه‌ندی به‌ستنیشه‌ی له‌گه‌ڵ زولف له‌و چوارچێوه‌دایه که زولف ده‌بیتته ئاسته‌نگ بۆ دڵ و ناهیلێت وه‌زیفه و کاره‌که‌ی به‌ باشی بکات. له‌و سۆنگه‌یه‌ی که زولف «ئاسته‌نگه‌کانی به‌رده‌می شه‌ریعه‌ت و گرفته‌کانی ته‌ریقه‌ت و دژوارییه‌کانی حه‌قیقه‌ته» (گوهرین: ۱۳۸۰، ۱۶۹). بۆ ئەم مه‌به‌سته زولف له‌ شیوه‌ی به‌ند و داوه‌وه ده‌وری دڵ ده‌دات و ناهیلێت دڵ گه‌شه‌ی خۆی بکات. جا ئەم وه‌سفکردنه و چواندنه به‌ داو، ویکچواندنی ژینگه‌ی شاعیرانی چه‌ند سه‌ده له‌مه‌وه‌یه‌ره، که له‌ چوارچێوه‌ی مۆتیقه‌کانی راو و شکاردا جیی ده‌بیتته‌وه، به‌وه‌ی دڵ نیچیریکی بی‌تاوانه و زولفیش داویکه له‌لایه‌ن نه‌فس و شه‌یتانه‌وه داندراوه‌ته‌وه بۆ گرتنی دڵ و به‌ندکردنی. بۆیه ده‌توانین چه‌ند شیوه‌یه‌کی گرتنی زولف له‌لایه‌ن دله‌وه لای مه‌لای جزیری ده‌ستنیشان بکه‌ین:

### 1.1.2.2 به‌ند

به‌ند که به‌ مانای به‌ستن و گرێدان و گرتن دیت و بۆته ئەو و شه‌یه‌ی که له‌ لای جزیری له‌ چه‌ند شوینیکی جۆراوجۆردا به‌کارهاتوه و شاعیر له‌ چوارچێوه‌ی به‌نده‌وه ئەو وینه‌یه دروست ده‌کات، که

و شاعیرانی فارس کراوه، که نیشاندهری کارتیکردن و کاریگه‌رییه‌که‌یه له‌و بواره‌دا.

سهرزهنشتی دلّی خۆی دهکات، بهوهی بۆ چوونه ناو مهیدانی عیشق و هه‌جی عیشقدا، پێویست وایه دلّ به خودا و پیریکی رووحانییهوه گریّ بدریت. بهلام ئه‌وه‌ش له چوارچێوهی بهندی زولفه‌وهیه، که زولف لێره‌دا وه‌ک به‌ند هاتوه، بێگومانیش ته‌گه‌ر وه‌ک به‌ند بیت، ئیتر هه‌م چاره‌نووسی دلّ و هه‌میش چاره‌نووسی عیشقه‌که‌ باش نابیت. هه‌ر له‌به‌رته‌وه‌ش جزیری وای ده‌حه‌سبێنێ که ته‌و کاته‌ی دلّ به‌ زولف به‌ستراوته‌وه، داومه‌ته ده‌ست پیریکی عیشق، ئیحرام و زونارم به‌ستوه، که نیشانه‌ی ته‌وه‌یه عیشقه‌که‌ سه‌ری نه‌گرتوه و سه‌ره‌نجامه‌که‌ی باش نه‌بووه. ته‌مه‌شی له‌ چوارچێوهی سهرزهنشت و خۆ به‌ خراب باسکردن هێناوه، چونکه له‌ به‌ره‌تدا «زولف به‌ره‌سته‌ی که‌ثرته‌ که‌ بالنده‌ی دلّی عاشق دیل ده‌کات و ده‌بیتته‌ ناوهر و حیجاییک که‌ ناهێلێ ریبوار له‌ قوربی و یسال نزیک بکه‌وێته‌وه» (زیبائی نژاد: ۱۶۷، ۱۳۸۹). له‌ به‌ره‌ندی به‌ لای جزیره‌سه‌وه ماده‌م به‌ندکردنه، ئیدی ته‌گه‌ر به‌ ناو و رووخساریش عیشق بیت، به‌لام له‌ ناوه‌رۆکدا نیشاندانی لاوازی ده‌:

من د به‌ندا زولفه‌کی دل دا ب ده‌ستی پیری عیشق

له‌و د عیشقی دا مه‌ به‌ست ئیحرام و یه‌ک زونار به‌س / ۱۶۳

لێره‌دا جزیری و پیرای زولف، تیگه‌کانی ئیحرام و زوناریشی هێناوه‌ته‌وه، چونکه سیاقه‌که‌ سیاقیکی سهرزهنشتکردنی ده‌، به‌وه‌ی که‌وتوته‌ داوی زولفه‌وه. بۆیه “زوناری سهرزهنشتکار و په‌یوه‌ندی و دلّ به‌ستانه‌وه‌یه به‌ دنیا” (شوان: ۲۰۱۰، ۱۷۷) و به‌و واتایه‌یه که‌ شاعیر خۆی و ده‌حه‌سبێنێت هێشتا هه‌ر له‌ عیشقه‌ دنیاویه‌که‌ ماوته‌وه. له‌مه‌شدا زولف به‌ هۆکار داده‌نریت.

بسکا سیا ره‌عنایه مه‌ست یه‌ک دی ب هه‌یران پێقه‌ ره‌ست

هه‌میان ب مه‌ستی حه‌لقه‌ به‌ست، ده‌ر به‌ندی ته‌و زولفا ره‌شین / ۲۳۵

له‌م نمونه‌ی سه‌ره‌وه‌شدا جزیری ئاماژه به‌ که‌وتنه‌ ناو به‌ندی زولف ده‌کات، کاتیکی ته‌و بسکانه مه‌ستانه‌وه‌ریان گرتوه و ته‌ویش له‌ناو ته‌و به‌نده ناتوانیت ده‌ربازی بیت.

## 2.1.2.2 ئه‌سیربوون

ئه‌سیربوون که‌ هه‌ر به‌ مانای گرتن دیت، به‌لام چواندنه‌که‌ له‌ چوارچێوهی دیلبوون و ئه‌سیربوونی مرۆفیک یان بالنده‌یه‌ک خۆی نیشان ده‌دات. ته‌مه‌ش هه‌ر به‌ مانا نه‌رینیه‌که‌ی زولف دیت، که‌ رۆلی دیلکردنی دلّ و مرۆفی باوه‌ردار ده‌بینیت و به‌ شیوه‌یه‌کی دیکه‌ش ده‌کریت ته‌وه‌ی لێ بفامریتته‌وه؛ هه‌ر وه‌ک چۆن نه‌فسی ته‌مماره‌ فه‌رمان به‌ خراپه‌ ده‌کات و مرۆف ده‌که‌وێته‌ بن کاربگه‌ریه‌که‌ی و وه‌ک به‌نده‌یه‌کی

لیدیت و ناتوانی به ئاسانی خۆی له بن دهستی ده‌ریاز بکات، مه‌گهر نوورێکی باوه‌ری راسته‌قینه و سرویه‌کی ره‌حمانی بیت، ئاواش ده‌ردی گرتنی زولف هه‌مان ده‌رده. له‌و ده‌وروه‌ره‌دا دیلبوون هه‌موو چوارچێوه و سباقه نه‌رێنیه‌کان ده‌گرێته‌وه:

ظاهیر دبیژم په‌ندگیر، دا دل نه‌دی زولفا هه‌ریر

شوبه‌یی «مه‌لی» دمینی ئه‌سیر، گوهدێره قه‌ولی موخته‌به‌ر / ۱۴۲

جا له‌و سۆنگه‌یه‌وه جزیری له‌گه‌ڵ عاشق ده‌دوێت و ئامۆژگاری ده‌کات به‌وه‌ی دلی خۆت راده‌ستی زولفا هه‌ریر مه‌که و با دلت پێیه‌وه په‌یوه‌ست نه‌بیت، ئه‌گینا وه‌ک مه‌لای جزیری ده‌یه‌ دیل و ئه‌سیر (الزفنگی ۱۹۸۷، ۱/ ۲۵۰). که‌واته شاعیر به هه‌مان ده‌رد چوه که دلی په‌یوه‌ست بوونه به زولفی هه‌ریر و پێیه‌وه هه‌لخه‌له‌تاوه، ئه‌مه‌ش ره‌مزی که‌شهرت و دونیا و ئاره‌زووه‌کانی ده‌روونی مرۆفه، که دلی مرۆف له‌خودا دوورده‌خاته‌وه و به‌ره‌و ئاره‌زووه خراپه‌کانی ده‌بات.

له نمونه‌یه‌کی دیکه روونتر ئه‌سیربوونه که نیشان ده‌دات:

ئیسیر کرم زولفا چه‌له‌ک ته‌و حووریا شوبه‌هت مه‌له‌ک

تیر دان ژ ره‌شتۆزین هه‌له‌ک مه‌جرووحی قه‌وسی په‌روه‌شین / ۲۳۶

یان:

هه‌ر دلی سوته‌تی ب ئولفی یار نه‌ ده‌رمان کت ب زولفی

تا ئه‌به‌د ته‌و به‌ندی قولفی عشق ده‌رده‌ک بی ده‌وايه / ۲۶۰

### 3.1.2.2 بردنی دلی له‌لایهن زولفه‌وه، واته گرتنی

جزیری نه‌ک هه‌ر به‌ندکردنی دل به‌هۆی زولفه‌وه به‌گرت ده‌بینی، به‌لکو له‌ده‌ستچوونی دلێش ئاشکرا ده‌کات به‌وه‌ی که زولف و بسک دلێان بردوه. واته دلی ناسنامه‌ی تایبه‌تی خۆی له‌ ده‌ست داوه و که‌وتۆته چوارچێوه‌ی ناسنامه‌ی زولف و بسکه‌وه:

زولف و بسکان پور ژ من دل بر به‌لی

رشته‌یا جانی مه‌لی ته‌و کاکوله / ۲۸۰

یان له شونێکی تردا زۆر به‌ روونی جزیری ئاماژه به‌وه ده‌کات، که دلی له‌ناو به‌ندی زولفدايه زولفیکی جوړی گرێداریش:

هەر ب جان تشنه بێ له‌علا نەم

دل د بهندا گرها زولفانم / ۳۳۲

### 4.1.2.2 گرتنی دل به شیوه‌ی چهوگان

ئەمجارە زولف بە چهوگانیک دەچۆنیت و دل لەناویدا دەبەسترتیتەوه، بەلام شاعیر نەك هەر دل وەك بەشیک له لەش لێرەدا بە نمونە ناھینیتیتەوه، بەلكو له چوارچێوەی لاشە (گشت) دا هەموو بوون و لەشی ئاشکرا دەکات کە له بەندی زولفی چهوگاندا یە:

دەبەندا زولفی چهوگانم صباح الخیر یا خانم

وەرە بیناھیا چەھقان بینم بەژن و بالایی / ۳۴۰

### 5.1.2.2 گرتنی دل له شیوه‌ی کەمەنددا

چواندنی زولف بە کەمەند لەناو شیعی شیوه عیرفانیدا هەییە، ئەمەش بەھۆی ئەوہی کەمەندە<sup>۴</sup> و شیوه کەمەندییە کەش نیشاناندانی وینە و شکلیکی دیکە یە بۆ گرتنی دل:

من گۆ: ژ کەمەندا سەری زولفا تە قەرەستم

پەرۆزی لەبێ لەعلی مە گۆ: گەر قەرەسی تو / ۲۹۹

### 2.2.2 زولف و نوور

پەییوەندی نیوان زولف و نوور بە چەند زاراوەی دیکە تەسەووفەو بەندیوارمان دەکاتەوه، چونکە مەبەستە سەرەکییە کە دلی شاعیر گەیشتنە بە نووری راستەقینە خودا، بۆیە زولف خەسلەتی پۆشین و حیجاب و ئاستەنگ و شەو و نەخۆشی و گرفتاری و پەرشانی دەھینیتتە کایەو و ناھیللی عاشق بە نوورە خوداییە کە بگات. ئەمە چوارچێوە گشتییە کە یە، کە دەکریت ورده کاری زیاتری لی دابتاشریت.

لە لایەکی دیکەو نووری نوور کە بە نووری ئەحمەدی و خەسلەتەکانی ناودەبریت و راستەوخۆ سەر بە عەرشی خوای گەورەییە و پیغەمبەر موحمەد (د.خ) لەو نوورەو سەرچاوەی گرتوو و دواتر تیرێژە کە بۆ

۴ سەعدی شیرازیش زولفی یار بە کەمەند چواندوو و لە هەر موویەکە دا دلی عاشقیگ بەندە. بروانە (عباس زاده، ۱۳۹۲، ۱۱۳)

کەسانی باوەردار دەچیت، له دەورووبەرە واتاییه کەیدا لەناو دنیای غیرفان و تەسەووف و شیعری غیرفانیدا لەگەڵ ئافتاب، رۆژ، عەرش، جەمال، سەلام، خەت و خال، مەشریق و ئەزەل دیت (بەلەکی و خۆشناو: ۲۰۱۶، ۵۸). جزیری بەشیک لەم مۆتیفانەی زۆر بە رێک و پێکی لەگەڵ پەیشی نوور هیناون و لە هەمان کاتیشدا له دەورووبەرە واتاییه کە ی زولفیشدا هەمان ستراتیژی بەکارهیناوه. بۆ وینە:

من دین ل بەژنا عەرعرین تاین زەباد و عەنبەرین  
بای سەبا دا چەنبەرین زولف چۆنە سەر نوورا صەمەد

زلف چۆنە سەر نوورا زەلال جارەك وەرە بای شەمال  
بسکان ژ سەر دیمی فەمال زولفان ل سەر جۆهتی ئەسەد / ۱۳۵

لێرەدا زولف بە مانا نەرتییە کە ی بۆتە بەر بەست و ئاستەنگ تا نوور دەرنەکەوێت، بۆیە لە هۆکار و دەسیلەیه ک دەگەریت تا هەول بەدا زولفە کە لا بەدا و چاوی بە نوورە کە رۆشن ببنەوه، کە هەموو ئامانجی شاعیر ئەوێه ئەستەنگەکان بە هەموو جۆرە کانیەوه لا بەدات و دل بگاتە دیداری نووری راستەقینە. بۆیە پەنا بۆ بای شەمال دەبات کە لە رۆژەهلاتەوه هەلەدەکات تا زولفەکان لا بەدات. جا وە نەبیت شاعیر هەر وا بە رەمەکی با بەکاربەتیت و بیکاتە لا بەری زولفەکان، بەلکو سەرچاوه کە ی کە لەپووری غیرفانییه کە با، بە تاییه تیش بای سبەیان "جیلوی جەماله و لە رۆژەهلاتەوه بەختەوه ری و پەيامی خۆشیی له لایەنی جانانەوه دەهینیت" (هادی و رجب: ۱۳۹۰، ۱۱).

ئەو دەمە ی رینگاکان دەگەنە بن بەست و هیچ ئومیدیک نامینیت لەوه ی چۆن ئەو زولفە ی نووری داپۆشیوه، وەك ئەوه ی کوفر نوور بشاریتەوه، ئاوا هیچ رینگایه ك شك نابردیت تا رزگار بیت. جزیری پتویستی بە نێوەندگبیریک هەیه تا خەلاسی بکات، بۆیە دەیهوێ وینەیه کی مرۆفانە و دنیاییانە له راست لیکچواندنه کە ی ببنیتە کایهوه، ئەویش ئەوێه هەر وەك چۆن سرهوی بایه ک دەتوانیت زولف لەسەر رووی مرۆف لا بەدات و وای لئ بکات رووخسار دەریکەوێت، ئاواش چواندنه کە بە داوی دینیت، کە بای میهرەبانی و بای سۆز و بەزەیی خودا، دوا جار هەر فریادرسە و دەتوانیت کۆتایی بەو هیرشە نارەوايه ببنیت کە زولف خستویه تیه سەر نوور، چ نووریک؟ نووری صەمەد، کە نووری ئیلاهییه و ئەو سیفەتەش جینگای پامان و وردبوونه ویه. بۆیە جزیری مکره لهسەر ئەوه ی بە با زولف لا بەدا و نوورە رحمانییه کە ببینیت:

سوتن ل من جهرگ و هناف، وهردين دهور گرتی خوناف

زولف هاته سهر لی کر بلاف، بایی نهسیم وهختی سهحر/۱۴۲

دهبینین جزیری زولفی له گه‌ل ده‌پرینی بایی نهسیم و وهختی سهحر هیناوه، که ئەگەر بایش شه‌مال بی و سهر له به‌یانین له سه‌حری دا هه‌ل‌بکات، ئەوا له بای صه‌با نزیك ده‌بیتته‌وه، که له بنه‌رهدا ”سروهی ره‌حمانیه و له رۆژه‌لاتی رووحانییه‌ته‌وه هه‌ل‌ده‌کات“ (سجادی: ۱۳۷۸، ۵۲۰) و له گه‌ل رۆژه‌لاتیشدا یه‌کانگیر ده‌بیتته‌وه، که نیشانه‌ی ده‌رکه‌وتنی نووری نوور و نووری ئەحمه‌دییه. که‌وابوو زولف لیره‌دا ئاسته‌نگ نییه بۆ نیشاندانی نووری مرۆفیک، به‌لکو به واتا ته‌ئوبلییه‌که و به به‌لگه‌ی به‌کاره‌ینانی له‌و ده‌روبه‌ره عیرفانییه‌دا مه‌به‌ستی جزیری رووتتر ده‌بیتته‌وه، که نوورا زه‌لال لیره‌دا نووری نوور و نووری ئەحمه‌دییه و زولفیش تاریکایی و تاوان و گوناھ و به‌ریه‌سته‌کانی به‌رده‌م نوورن. چونکه جزیری ههر به‌مه‌ش ناوه‌ستیت به‌لکو مۆتیقی سه‌حر به شپۆزیک‌کی دیکه له هه‌مه‌هر زولف و هاوشپوه‌کانی به‌کاردینیت، که کاکۆل به شه‌و ده‌چونیت و ته‌وی‌ل و نیوچه‌وانیش به سه‌حر داده‌نیت، که نووری ره‌حمانیه و هه‌ل‌ده‌کات و ته‌وی‌ل رووناک ده‌کاته‌وه، ته‌وی‌لیک که کاکۆل دایپۆشپوه و جه‌مالیکه به لاچوونی جه‌لال، خۆی نیشان ده‌دات:

ئهو له‌ب شه‌که‌ر نازک به‌شه‌ر

جه‌به‌ت سه‌حر کاکۆل شه‌به / ۲۸۱

شه‌ب کاکۆله خال فلفله

چین سونبوله داڤا دلە / ۲۸۱

جزیری ده‌به‌ویت له چوارچپوه‌ی نیشاندانی ئەندامه شوینی مرۆف، بنه‌ما عیرفانییه‌کان قوول بکاته‌وه و خالی هه‌به‌ش که نوقتی وه‌حده‌ته به کاکۆلیکی ره‌ش داپۆشراوه و ده‌بی به لاچوونی ره‌شایی کاکۆل که که‌ش‌ته‌ته، خال ده‌رکه‌ویت و وه‌حده‌ت بدۆزرتته‌وه:

حوور وه‌شه شپیرین مه‌شه

کاکۆل ره‌شه خال هه‌به‌شه / ۲۸۹

## 3.2.2 زولف و خال

له شیعری کلاسیکیدا زۆر جار ئەندامه شوینەکان بەیەک‌ه‌وه‌ گری‌ د‌درین و پینک‌ه‌وه‌ ده‌بنه‌ وینە‌یە‌کی سەرنج‌راکینش و کاریگەر، ئەمە وپ‌رای ئە‌وه‌ی رووخسار هەر له‌ زووه‌وه‌ بۆ‌ته‌ کەرەستە‌ی شیعری شاعیران و ئە‌وه‌ ئە‌ندامانە‌ی که له‌ ناو پینک‌ه‌اته‌ی سەری مرۆ‌قدان له‌ لایە‌ک له‌ رووی جوانییە‌وه‌ به‌ شیوه‌یە‌کی گشتی به‌ سرووشت ده‌چوین‌درین و له‌لایە‌کی دیک‌ه‌وه‌ وه‌ک بواریکی خوازه‌یی و ته‌ئویلی، جاریکی دیک‌ه‌ له‌ چوارچۆ‌یه‌ی واتای واتاوه‌ ده‌بنه‌ کەرەستە‌ی روئیا و مه‌به‌سته‌کانی شاعیر. هەر له‌به‌ر ئە‌مه‌شه‌ ویستراوه‌ ئافره‌ت وه‌ک مه‌خلووقیکی جوان و وه‌ک دوین‌دراوی شاعیران ب‌پیت‌ه‌ کەرەستە‌ و له‌ نیویشیدا ئە‌ندامه‌کانی ب‌بنه‌ وه‌سپه‌لی واتایە‌کی دیک‌ه‌وه‌، که له‌وێ‌وه‌ به‌ره‌وه‌ مه‌به‌ست و واتا راسته‌قینه‌کانه‌وه‌ هه‌نگاو ده‌نرێ‌ت.

جا له‌و سۆ‌نگه‌یه‌وه‌ ئە‌وه‌ کاتانە‌ی دوو ئە‌ندام یان زیاتر به‌یە‌ک‌ه‌وه‌ دین، ئە‌گەر بناغه‌یه‌کی دژبان له‌نیو ته‌ئویلی شیعردا هه‌بیت، جوڵه‌یه‌کی دیک‌ه‌ به‌ ده‌ق ده‌به‌خشن و سەرنجی خوینەر له‌سەر وینە‌ دژ‌ه‌کان ده‌سه‌نگرین‌ه‌وه‌. له‌و ئە‌ندامه‌ کاریگه‌رانە‌ی چوارچۆ‌یه‌ی سەری مرۆ‌ف هەر یه‌که‌ له‌ زولف و خال، وه‌ک دوو ئە‌ندامی دژ‌به‌یه‌ک و دوو تینگه‌هی ب‌نکه‌ فراوانی جیهانی سۆ‌فیگه‌ری، که هەر دووکیان له‌سەر بناغه‌ی دو‌الیزمه‌کانه‌وه‌ گه‌شه‌ ده‌کهن.

به‌ زۆ‌رب‌ش شاعیر هه‌وڵ ده‌دات خۆ‌ی ب‌خاته‌ لایه‌نگری خال و زولف ب‌خاته‌ لایه‌نی یار/ به‌رامبه‌ر و له‌وێ‌شه‌وه‌ خۆ‌ی له‌ سه‌نگه‌ردا ب‌ب‌پیت‌ه‌وه‌. ئە‌مه‌ ئە‌گەر به‌ زۆ‌ری به‌ جیا جیا هاتن، واته‌ به‌ جیا په‌سنی خال ب‌دات و به‌ جیاش سه‌رزە‌نشتی زولف ب‌کات و به‌ خراب وینای ب‌کات، به‌لام له‌ چوارچۆ‌یه‌ی سیاقی شیعری جزیریدا به‌ زۆ‌ری ئە‌گەر به‌یە‌ک‌ه‌وه‌ ب‌ین، ئە‌وا سه‌رسامبوونی شاعیر نیشانه‌دات له‌ هه‌مبه‌ر ته‌جه‌للا و مه‌زینی خودا و سیفاتە‌کانی، به‌و واتایە‌ی هەر که‌سێ‌ک ئە‌گەر هه‌ردووکان به‌ده‌ست ب‌خات به‌ واتا عیرفانییه‌که‌ جه‌لال و جه‌مالی خودایی ب‌بینیت، ئە‌وا گه‌یشتۆ‌ته‌ پله‌یه‌کی به‌رز. واته‌ جه‌لال و قه‌هری خوداش ده‌ب‌پیت‌ه‌ مایه‌ی میه‌ره‌بان‌ی له‌به‌ر یه‌ک‌گرتنی هه‌ردووکیان، ب‌زه‌شه‌ شاعیر ئە‌م رواینه‌ له‌ پله‌و پایه‌ی پینغه‌مبه‌ر (د.خ) به‌کار‌دینیت و له‌ شیعری (ئیسمنی ته‌ یه‌ مه‌کتوب د دیوانی قیدم دا) ب‌چوونه‌که‌ی روونتر ده‌کاته‌وه‌:

یه‌ک‌ گرتی به‌ زولفی و یه‌کی خال نومایی

ئایینه‌ ب‌ ئە‌سه‌که‌نده‌ری و جام ب‌ جه‌م دا / ۳۲

بۆیه بئی خواستنی یار، مهزنی و تهجهللای سیفتهتی خودایی که شاعیر له نوینه رایهتی زولف و خالهوه دهیبینی دلی ئهویان بردووه:

زولف و خالان، نوون و دالان وان ژ من بر دل ب تالان  
گۆشهیی قهوسی هلالان دل ژ من بر دل ژ من / ۲۴۴  
تهنانهت پهسندانه که دهگاته حالهتی سویند پی خواردن:

سهجدیا بهر ئهسوهدان نادم ب سهه حهج ئهکبهران  
سووند ب وان زولف و خالان ههچوهکی بیژم وهیه / ۲۵۵

له شوینی دیکه دا له چوارچیهی زیارهت و تهواف دایاندهنیت، که جوړیک پیرۆزیان پی دهبهخشیت،  
ئهم پیرۆزییهش زیاتر له بهیه کهوه هاتنیانه و مانا له نهرینیه که وه بق باره ئه رینیه که دهگوازیتهوه:

چوو عومر مه د قی خهپالی ما شهقهك عیدان د سالی  
بیژم زیارهت زولف و خالی روژ و شهف من ئهف دوغایه / ۲۶۷

یان:

سهجدیا بهر نوون و دالان من طهوافا زولف و خالان  
ئهو بهسه ژ صاحب جهمالان دا بیچین لی عومرهیه / ۲۷۰

خال ئهوه کاته له گهڵ زولفدا پهیه نهدیه کی پتهو دهبهستیت، بهوهی ههر دووکیان دوو ئه ندامن له چوارچیهی  
جوانی پروخساردا، بهلام ههر دووکیشیان له گهڵ دل که سهراچهی نوور و کهماله بهندیوارن، که "له  
باوهری پهبواراندا خال په مزی وه حدهته، بهوهی که سهرهتا و کۆتایی که شرت په یوههسته به وه حدهت و  
رهشی خالی له گهڵ زولمهت و تاریکی ههست و شعوری پهبواره له مهقامی فهنافیللا و ئهوه خاله  
له ناو تهجهللای جوانیدا دانهیه که، که عاشق و پهبوار بهو داوی زولف و خهتی مهعشورقهوه که مهزههری  
تهجهللای جهلالیه گرفتاره و باوهریشی وایه که ههر جهمالیک جهلالیکی بهدواوه دیت" (هادی و رجب:  
۱۳۹۰، ۴۶). ئهم هاتنهش بهدوایه کهوه له نیوان جهلال و جهمالدا، بهوهی که دل ههلوهدای گرتنی  
سیفاتی جهمالی خوداییه که له چوارچیهی خهت و خالدا خوی دهیبینتهوه و جهلالیش که جوانی شکۆ و  
ترس و قههره و له چوارچیهی جهلالدا خوی دهیبینتهوه. لیره شدا مهلالی جزیری ئهوه خاله وهك دانیک نیشان  
دهدات که کهوتوته ناو داویک که زولفه دهوهری گرتوه و دل ناتوانیت پراوی بکات:



بایی ئه فینتی کو لقی هاتن ل سهر زولفان چهقی

هر دهم هزار دل دا کهقی خالان د دامی دا نه دا / ۵۶

### 1.3 شیوه کانی زولف

له بهر ئه وهی شیوه کانی زولف له ناو شیعه کاندایه دوو جور خویان نیشان ده دهن، ده توانین له سهر ئاستی

شیوه و خهسلته ئاساییه کانی زولف و خهسلته ئاساییه کانه وه دابهش بکهین:

#### 1.1.3 شیوه ئاساییه کانی زولف

##### 1.1.1.3 بونی زولف

لیره دا یه کیک له ههسته کانی مرۆف به شداری له دروستکردنی وینه که ده کات به شیوهی پروکه شی، به لām له ناو بنهما سۆفیکه ریبه که دا ”بونی زولف کینایه ته له ده رکه وتنی ههردوو سیفته تی جه لال و جه مال” (زیبائی نژاد: ۱۳۸۹، ۱۶۴) ه و به خشین سیفته تی خۆشیش به بۆنه که ده لاله تیککی ئه رینیا نه یه و به راستگه رانی ئه و خهسلته نه ی خودایه، له و سۆنگه یه ی که ”بونی خۆشی زولف له زنجیره ی ناو و خهسلته کانی خوا ”ئه سماء و سیفات” یه و به هۆی ئه م بۆنه وه مرۆف ده که ویته بار بکی ته جه للیبه وه، چونکه خودا خۆی ئاده می له سهر وینه ی خۆی دروست کردوه ” (لاهیجی: ۱۳۸۱، ۴۹۲)، که وایه ده رده که ویت ئه م ده قتا ویزان و هینانی بۆن بۆ زولف، بونی زولفی مرۆف نییه، به لکو بونی سر وه ی ته جه للای خودایه و لای جزیریش وه که ده رمانی دل دیته هه سباندن:

ما و هرا به لگین گولی بوو بهن و بوویا کاکۆلی بوو

دارووی قهلبی مهلبی بوو له و ب چه هقین دل جه لایه / ۲۶۴

جزیریش وه که کولتوری سۆفیا نه بونی میسک و عه نه بر و عه بیر ده کاته تایبه تمه ندی زولف و کاکۆل و ههردوو بۆنه کهش خهسلته تیککی ئه رینین و له ئه رینیشدا باره نه رینیبه کولتوریه که ی زولف کال ده که نه وه و به هۆی بۆنه وه ئیتر سه رچا وه که بۆ خودا و سیفات ه کانی نزیکتر ده بیته وه:

قزاف و سونبول مشک بوی و بسک و سووسن سپ شرین

سه روی بالا سه بزپووش و گول نشان و غونچه باز / ۱۵۰

یان:

بسکین ژ حەبیری تو ژ نوو ماوەرێ لیکه

زولفین ژ عەبیری شهکه بائنی خەم و تابێ / ۳۲۸

### 2.1.1.3 سەری زولف

سەری زولف و لا بردنی بەو واتایەیه که جوانی و جەمالی وەحدەت لە ژێر پینچە و نیاقەبەکه‌دا زیاد بێت، بە دەرکه‌وتنی جۆرەکانی تەجەللای وەحدەت بەرەو رووی هەموو ئەوانە لە کاتی سلوک و وەرزی رۆحین، خۆی دەنوینیت و سەری زولفەکه غەم و ناخۆشییە، بەلام لاکەوتن و جیاپونەوه‌ی سەرەکه لە لاشە، لە دوای خۆی خۆشی و شادی دەهینیت و نوور و رۆشنایی دەردەکه‌وێت (لاهیجی: ۴۹۰، ۱۳۸۱). ئامانجی دەستخستنی سەری زولفیش ئەوەیە ئەگەر زولف دوژمن و ناحەز و پرمەترسی بێت، ئەوا گرتنی سەری زولفەکه وەک سەرکه‌وتنیکە بۆ ئەوه‌ی بە دلخوازی شاعیرەوه سەرەکه لابدا و لە ژێریدا پروناکایی نوور دەریکه‌وێت، چونکه زولف ئاستەنگ و بەرەسته. جزیریش ئەم بەرەسته‌ی بەهۆی دوعاوه دەستکه‌وتوو:

سەری زولفا تە ب کوللابی دوعا

هاتە دەستی مە ب جەللای دوعا / ۴۶

بۆیه جزیری ئەسیربوونی خۆی بە که‌مه‌ندی سەری زولفەوه پەیوه‌ستکردوو و داوای رزگاربوون دەکات:

من گۆ: ژ که‌مه‌ندا سەری زولفا تە قەرەستم

پەروازی لەبێ لەعلنی مە گۆ: گەر قەرەسی تو / ۲۹۹

### 3.1.1.3 رەنگی زولف

رەنگ وەک یەکیک لە سیما دیارەکانی زولف نیشاندراره، ئەم روونکردنەوه و بەیانکردنی سیفەتی زولفیش مەدلواتی خۆی هەیه و لە ئەدەبیاتی عیرفانییدا رەنگەکان مەغزای تاییەتیان هەیه، بەتایبەتی لەمەر پەیوه‌ندی بوون بە نوور که رەنگی سپی لەخۆیدا بەرجه‌سته دەکات و رەنگی دژ و بەرامبەریش دەبێتە رەش. هەر بۆیه لەگەڵ شەو و تاریکایییدا پیکه‌وه دەگونجین و هونەرەکانی رەوانبێتیان تیدا تاقیدەکرێتەوه. جا بە لای جزیری‌شەوه نەک هەر زولفیکێ ئاسایی مەترسی لەسەر عیشقی حەقیقی هەیه،

به لکو ئه و زولفانه ی که خه سلته کانیان باس ده کات خراپتر خزیان دهنوتین و له لایه کی دیکه ش چینی وینه شیعیریه که ی پی به هیز ده کات:

عالمه می ویران دکن زولفین ژ رهنگی عه نه ری

چهرخ و پهروازی ددن جارک ل بای راست و چه پ / ۸۳

ئه و زولفانه ی که جیهانیک ویران ده کمن و خه لک مال و حالیان ویران بووه به هوی ئه قینه که یانه وه و په یوه ستبوونیان به زولفیکه وه که له ره شی و بۆندا رییه وه وه ک عه نه رن، جا ”با” یش ئه م زولفه ده هینیت و ده بات و به ره و لای راست و چه پی ده بات. لیره دا زولف به سیفه تی عه نه ری په یوه سترکراوه، ئه مه ش بۆ زیاتر سه رنج پراکیشانی خه لکه که به هوی رهنکه ره شه که یه وه پی هه لده خه له تین و یان به هوی بۆنی خو شیه وه خه لکی بۆ خوی که مه ندکیش ده کات. دونیاش به هه موو جوانیه کانه وه دلێ به نده بۆ خوی ده بات.

ژ خه ده نگی قه جهری سینه ته ژێ گه زمه و تیرم

دل دنیف هه لقه ی زولفا سیه ها بو ژ عه بیرم / ۳۴۶

جزیری بۆ رهنگی زولف، زیاتر سیاهی به کارهینا و جاریکیش وشه که ی کردۆته کوردی و به زولفا ره شی ناو دیر کردوو، ”ره شی زولفیش ره شی و تاریکایی جیهانی ته عه ییونات و که شه ته” (قلیزاده: ۱۳۸۳، ۱۶۰)، که ده لاله تی دنیا و بوونه وهر و عیشقی زه مینی و مومکینی وجود و گومرایی و بی باوه رییه.

حه وچه سحرئ سامری نینن کو زولفا ره ش بکت

چه شم به ندا دلرو بایان کاکولا عه ییار به س / ۱۶۳

له هیه ل شه ره کانیدا بۆ رهنگدار کردنی زولف دا ئه رینی نابینریت، به لکو سیفه تی تری خستۆته پال زولفیکه ره نگ ره ش که ئه ویش بی وه فاییه:

زولفی سیاهی بی وه فا قه ط مه نه دی ژ وی صه فا

کو شتمه ئه ز ب سه د جه فا ئه ژ ده ست جه فای زولف / ۱۹۲

یان:

زولفا سیاھ عنبەر بکه، خەملی ژ زېږی زەر بکه

زەرباف و دیبا بەر بکه، مسک و گولاقی لێ رهشین / ۲۳۶

### 4.1.1.3 زولفی پینچاوی پینچ و پر گری

زولفی پینچاوی پینچ، که هەندیک جار بە زولفی پر پینچ و خەمیش دیت ”لەو پەیفانەییە کە هۆکاری دلتەنگی و بێ قەراری و گرفتاری عاشق نیشان دەدات و کینایە یە لە جودایی و پەیوەندی بە کەشەرتی بوونەوه هەبە” (عرفانی واحد: ۱۳۸۷، ۱۹۳) و هەر کاتیکیش کەشەرت بە لای شاعیرەوه نیشان بەدریت، مانای ئەو هەبە لە نوقتهی وەحدهت دوور کەوتۆتەوه. بۆیە بە نیشانهی دلتەنگی و بیزاریبوون دەناسرێتەوه. ئەم پینچاوی پینچییە لە شیوهی گرتیش خۆی نیشان دەدات:

سەد گره من د دلن ژێ کو چەپ و راست دکت

شاهدی حوسنی قەدەم زولفی گره‌داری حودووت / ۱۰۵

لێرەدا وێرای ئەو هێ زولف شیوهیەکی تاییهتی وەرگرتووه، کە خۆی لە پینچاوی پینچی و گری بووندا دەبینیتەوه، بەلام لە سیاقی شیعەرە کەدا ”بە تەواوەتی لە واتای ئاسایی خۆی دوور کەوتۆتەوه، وشە کە خراوەتە نیو سیاقیکی تاییهت کە پەیوەستە بە خۆی گەورە و مەسەلەیی خولقاندنی مرۆف. وشە کە لە ژێر کاریگەری دوو زاراوی فەلسەفی ”حدوث” و ”قیدەم” دا کۆمەڵیک مەلۆولی ئاوێتە و ناروون بە خۆیەوه دەگرت کە تەواو جیاوازن لە هاوتاکانیان. ” (مشەختی: ۲۰۱۱، ۲۰۰)

جزیری بە تەواوی دل وەها دەبینیت کە کەوتۆتە ناو گری زولفەوه:

هەر ب جان تشنەبێ لە علانم

دل د بەندا گره زولفانم / ۳۳۲

### 5.1.1.3 زولفی ب چین

چین چینکردنی زولف دەلالەتی پر ژماری و زۆری دەبەخشیت، واتە تالە موو تالە موو نییە کە گرانی و تازارە کە کەم بکاتەوه، بەلکو ئاماژەدانە بە زۆری و (کەشەرت) و ئەمەش جاریکی دیکە دەمانباتەوه ناو مومکیناتی وجود و گوناھ و دونیا و خراپە کاری لەناو زاراوەکانی تەسەووف و عیرفاندا، بۆیە جزیری ”جگە لەو هێ کە لە دەست چین چینکردنی زولفەکانی مەعشوق دەنالین و لە دەست

که‌ش‌ه‌ت-که هه‌مان چین چینه‌که‌یه- ده‌نالینیی و ده‌پارێته‌وه له‌م گێژاوه‌ رزگاری بکات، به‌لام چونکه ده‌زانئێ ئه‌م زولفانه‌ سیفاتی “جه‌لال” ی مه‌عشووقه‌ که به‌ هۆی ته‌جه‌للی رووخسار به‌م زولفانه‌وه، عیشق به‌ده‌رکه‌وتوه، بۆیه‌ پاشایه‌تی هه‌موو جوانیه‌کی تریش به‌ ره‌شاتی ئه‌م زولفانه‌ ناگۆرێته‌وه و جوانترین جوانیه‌کانی ئه‌م سه‌ر زه‌وییه‌ش له‌ به‌رامبه‌ر ره‌شاتی و تاریکایی زولف که له‌ عه‌ینی کاتدا رینگریه‌تی له‌ گه‌یشتن به‌ مه‌عشووق، به‌ هیچ ده‌زانئێ. ” (رواندى: ۲۰۰۴، ۱۸۶) له‌به‌رئه‌وه‌ جزیری ئاوا راشکاوانه ئه‌مه‌ ده‌رده‌پرێت و ده‌لێت:

زولفان تو به‌س چین چین بکه‌ بسکین موقابل دین بکه‌

پیشکیشی یه‌ك زولفه‌ك ته‌ بن مولکێ خوته‌ن ته‌ختی خه‌تا / ۴۰

Li vir rengê nasnameya Koyî eşkere û yekceleb e: Bi saya xîret û xebata ji bo serxwebûnê gelek millet (çi mezin, çi piçûk) tebîb û siltanê xwe ne, xwediyê her tiştî ne! Hal ew e ku nîfşê Kurdan ê meşrûtiyetê (1908) xwediyê du nasnameyan e: Îslamperwer û Kurdperwer. Di qada siyasî de xerca vê Îslamîperweriyê jî Osmanîperwerî bû. Lewma di nivîsên rewsenbîrên Kurd ên vê serdemê de ax û waxeke berbiçav heye ji bo her têkçûna dewleta Osmanî û jidestçûna her bost xaka wê ya emperyal. Lê di

4 Selaheddîn û Nûredînê Kurdî/Ezîzanî Cizîr û Mûş û Wanî  
Muhelhel, Erdeşêr û Deysemî Şêr/Qubad û Baz û mîrî Erdelanî  
Emane pakyan Kurd in, nihayet/Le ber bêdefterî win bûn û fanî  
Kitêb û defter û te’rîx û kaxez/Be Kurdî ger binûsraye zubanî  
Mela û şêx û mîr û padîşaman/Heta mehşer dema naw û nîşanî (2004: 60)

nezera Koyî de Romî/Osmanî bêgane ne; zeîf bûne wekî benê mû, ew niha ketina dawiya xwe, sergêj bûne, ne wacîb e mirov pişt a xwe bide wan.

Di nav karakterê pozîtîvist ê modernîzasyonên der-ewropî de daxwazek jî nûkirina teknîkî ye. Ji bo vê çareya pêşîn vekirina dibistanên fennî be, ya duyem jî birêkirina xort û mîrzayên jîr bû ji bo Ewropayê da ku di warê siyasî, îdarî û leşkerî de bi ilmekî kêrhatî vegezin welatê xwe. Di *Dîwana* Koyî ya li ber dest de sê caran peyva “ceyş”, yanî artêş, derbas dibe. Di cara pêşîn de ceyş malê mazmûneke kevin e bo porê yarê: “*Ceyşî* hebeşî zullfî le gel xettî be şerr hat”. Lê di vê helbesta “Xakî Cizîr û Botan” de ceyş her du caran jî di wateya xwe ya rasteqîn de ye: “Kiwa ew demey ke Kurdan azad û serbexo bûn/Sulltanî mulk û millet sahibî ceyş û îrfan”. “Her êke musteqîll in kullêkî dewletêk in/Sahîbî ceyş û rayet, erkanî herb û meydan” (2004: 84, 85). Yanî artêş wek elametêkî serxwebûn û quwetê tê ditin ku esbabên wê jî top û tifeng û hawan<sup>5</sup> in. Ev, techîzatên artêşeke modern in. Lewma dikare bê gotin ku pêşketina fennî û Ewropî, di serê Koyî de jî kêr û zêde diyardeyê leşkerî ye. Jixwe rengê leşkerî yê fennê, di beyteke din de sabî e: “*Bo fennî herb û senet, bo zept û reptî millet...*” Serdem, serdemeke wisa ye ku şûr û qelem şîrikê hev in, artêşeke bêyî çekên fennî qels e. Û Koyî vê artêşê jî bo diyardeyê din a serdema xwe, ji bo musteqîliyê/serxwebûnê dixwaze.

Li cem Koyî serxwebûn ew çend dermanê hemû derdan e ku mewziyêke piçûk a serhildanekê hêjayî pesnê ye. Ji ber ku dema dibêje “Her diwênê ehilî Sûdan hestane pê wek şêr/Êstêke musteqqîll in mahsûdî kullî edyan” nîşan dide ka bi serxwebûnê re mirov çawa dibe xwediyê îmkanên berfireh. Û dîsa ev beyt cardin nîşan dide ka Koyî çiqas jî qewimînên dinyayê hayedar e. Ji ber ku ev beyt bi eşq silavek dide wê serhildana<sup>6</sup> ku bi pêşengiya Muhammed Ahmed Mehdî çêbû li dijî

- 
- 5 Ger top û tifeng ne amrazên ewçend nû bin jî hawan bi tîra xwe nû ye. Ji ber ku hawan li gor topên giran û sabî, ji sala 1673an vir ve hatibû sivikkirin, di nav artêşê de bi hêsanî dihat veguheztin; ev çek di navbera 1861-1865an de, di şerê navxweyî yê Amerîkayê de jî aliyê her du artêşan ve bi awayekî aktîf hatibû emilandin. Yanî tam di wextê Koyî de hawan popûler bûbû.
  - 6 Di dawiya sedsala 19an de dema Sûdan kete bin hikmê Misira di destê Îngilîzan de, feqîrî, zilm, ticareta koleyan li dar bû. Sûdaniyên nerazî di 1881ê de, bi pêşengiya Muhammed Ahmed Mehdî serî hildan. Li gor vî kesî ku xwe xelîfe îlan kiribû, misliman di bin banê mezhep û terîqetan de zeîf ketibûn; lazim e kitêbên mela û faqîhên ku hestên misilmanan suîstîmal dikirin, bihatana şewitandin; çare ew bû ku misilman car din vegeziyana Qur’an û sunetê û jiyanê sade bijîyana... Ev serhildan jî bo Misrê jî ewlehiya ticareta Nîlê re û jî bo Îngilîzan jî jî ewlehiya Behra Sor re metirsiyek bû. Lê artêşa Muhammed Ahmed Mehdî di 1881 û 1883an de çend caran zora yekîneyên Îngilîz û Misirîyan bir. Heta vê artêşê salek şûnde berê xwe da Hartûmê, piştî abluqeya salekê bajar bi dest xist û gelek serbazên Ewropî kuştin û dil girtin. Lê Muhammed Ahmed di 1884an de jî tîfoyê mir, ji qumandarên wî Abdullah Îbn Muha-

Îngilîzan û serkeftina wê ya emirkinê jî wekî musteqîliyê nişan dide. Ev serhildan diyar e bi rêya hîdîviya Misrê jixwe Dewleta Osmanî eleqedar dikir û dihat di rojeva rewşenbîr û rayagiştî ya Osmaniyan de cih digirt. Lê balkêş e ku Koyî şûna ax û wax bike, pesnê gelê Sûdanê dide û wek nimûneyeke baş serhildana wê pêşkêşî Kurdan dike.

Ji van îzahan derdikeve ku bi hinek xezelan Koyî mijareke yekpare, zimanekî dûrî belaxetê, dengêkî şexsî yê ku li gor çavdêrî û tecrûbeyan diaxive, hişekî ku ruhê serdemê û nîmetên serxwebûnê fêhm kiriye datîne ber me. Di edebiyata Kurdî de ji bo rûdana hemû wechên helbesteke modern wext divê, lê taybetiyên navborî vê fersendê dide ku em behsa welidîna wê bikin.

Bêguman di vê dewrê de helbest, wek cureyekî modern bi Ebdurrehîm Rehmî Hekarî (1890-1958) re gihiştîye îstîqrareke berdewam. Ev şexsiyete ku di dewra duyem a jiyana xwe de ji Kurdan û Kurdî dûr ketiye û qelema xwe ji bo hukmên nimêj, rojî, paqijî, cenaze, helal û haram û hasilî mijarên ilmîhalî xebitandîye, di vê maweya Kurdperwer de ji aliyê dirûvî ve ji xwediyê taybetiyeke esrî ye. Mesela ji yên Koyî û Pîremêrd cihê, navekî helbestên E. Rehmî hene: “Nezanîn”, “Hewar”, “Yekbûn”, “Selaya Şevê”, “Bang”, “Xebat”, “Eşqa Welat”, “Nûr” hwd. Ku ev nav, meyla dewrê ya ku pêbendê idealên fikriyateke ronakger in jî eşkere dikin. Ji ber ku naveroka helbestên E. Rehmî yên ku bi navê *Gaziya Welat* (1919) gihiştîye qewareya kitêbekê, gelek tîpîk in. Digel fezîletên dinî, di helbestên wî de temayên hezkirina welat, cehda ji bo xilashûna cehaletê, banga hişyariyê, pêdiviya yekîtiyê, feqîrî û perîşaniya ji penaberiyê jî berbiçav in. Ji bo naverokeke wisa, normal e ku dengê hebe “şîret” li muxatabên xwe bike. Di kakilê helbesteke wisa de (1918-17: 16) dê edayeke dîdaktîk li dar be:

Ey cehl û nezanîn, tu yî dijmin, tu yî xaîn  
Zulma te ye hêlan hemî bêsenet û bêdîn  
Qehra te ye wêran kirî ah... wetenê min  
Kîna te ye bêlane kirî cîsm û tenê min  
Serwet te ji me istandiye bê mal û dirav in  
Em mayîne belangaz û feqîr, xanebelav in

Elbet gelek caran di ber şîretê de psîkolojiya teyaqqûzê jî serê xwe derdixe. Xwediyê deng, ji muxebatan bi awayekî lezgîn cehd û xebatê daxwaz dike ku pêdiviya “demê” binin cih (1918-5: 14):

---

med wekî xelîfe kete şûnê û serhildan heta 1898an dewam kir. Belam artêşa Îngilîzan a ku ji top û tifengên modern hatibû pê, di 1898an de dawî li vê bizava mehdîrew anî û îqtidara Îngilîzan jî li Sûdanê heta sala 1956an li ser pêyan ma.

Ey milletê sahibnîfaq  
 Lazim ji bo te îttîfaq  
 Tesîs nekin em yek wîfaq  
 Mehwiyyet e bîl-îttîfaq  
     Aqilê xwe berhev kin hemî

Wext, zeman pir nazik e  
 Bêittîfaqî tehlûk e  
 Xelqan hemî digel me rik e  
 Mehwiyyeta me bê şik e  
     Aqilê xwe berhev kin hemî

Mirov dibêje qey ev helbest gotina “esreke wisa ye, tê de razana saetekê jî ji bo miletekî mirin e” (Bir Kürd, 1918-1: 6) îcra dike. Ji ber ku zeman teng e û ger Kurd ji xewa xefletê şiyar nebin, mehwbûn li ber derî ye. Paşmana ji esrê, dê zebûniyê jî bi xwe re bîne, zilm û tariyê li her derî belav bike: “*Gelo rabin, zeman teng e/Xewa cehlê weha reng e (...) Xewa xeflet zebandin em/Ji vê esrê revandin em (...) Ji dinyayê tefandin em/Di bin zulmê civandin em*” (1918-6: 19).

Welatevînî ango niştimanperwerî, êdî temayeke sereke ya vê helbestê ye. Ne tenê dubarebûna peyvên wek “welat” û “weten” nîşaneya vê yekê ne; helbestên wek “Eşqa Welat”, “Girya Welat”, “Loriya Welat”, “Kew”, “Bihuşt”, “Zozan”, “Deng”, “Loma Ji Bilbil”, “Weslet” rasterast vê temayê vediguhêzin. Portreya vê welatevîniyê ji halên jiyane pêk tê. Ew welat çiqas di bin zehmetiyan de bike nalenal, çiqas li wê derê jar û penaberî serî ji aramiyê standibe, çiqas objeya bêrîkirin û nostaljiyê be, heta çiqas çiyê hemû xweşî û şadiyan be, di rojên teng û tarî de ewqas hêjayî canfedakirinê ye jî (1918-3: 15):

Dibêjin welat bo dijmin e  
 Ez bim qet mimkun e!  
 Xîret, hemiyet zamin e  
 Eşqa wî mêhvanê min e  
 Qurban j’ wî ra mêrgê min e  
     Eşqa welat, eşqa welat  
     Te cerg û mêlaka me pat.

Bi peydabûna fikra netewetiyê re niştimanperwerî jî wek temayeke sereke tev li helbestê bûye. Heta ev tema di helbestên kesên wekî Qazîzade Mistefa Şewqî, Lahûtî, Qazîzade Letîf, Dawer Ardelanî, Mihemed Mîhrî de ku ji her yekê çend

helbest mane, berdewam e. Heta bi rêya nezmê eşkerekirina pêdiviya vê guherînê, bi vê beyta Qazîzade Letîf (1919-7: 18) navdar e: “*Şairî Kurdan, meken behsî uzar û zulfî yar/Behsî behsêkî biken bo Kurd l’ eme w paş bête kar*”. Li gor xwediyê vê beytê milletê Kurd ji ehlê Gurcistan û Ermenistanê pirtir e, malmezînan wan xwediyê qesr, sifre û ni’metan in, lê ji ber ku ne hakimê xwe ne, malê wan ji Tirk û Tetaran re dibe fêkî; erê tiştêkî çak e ku ji wan leheng, şair û alimên mezin derketine, lêbelê ger îro Kurd ji xwe re meclîsekê, yekdestiyekê ava nekin, dê tarûmar bibin.

Mijara helbestê û wezîfeya nû ya şair êdî ew e ku “ji berê cudatir” behsa babeteke kolektîf bike. Wekî “Hemûman”a Dawer Ardelanî (1919-20: 18), divê Kurd dev ji min û tu berdîn û bibin yek, jêrdestî ji bo wan zillet e, ji bo çî dê êsîrê xelqê bin, eqwam bi emrê hezretî Wilson xelas bûne, serbest û azad in. Helbesta ku ji bo ruhê piçûkên Kurdan hatibe nivîsîn jî (Lahûtî, 1919-23: 16) dê behsa “hubbî weten”, “esl û neseb”, “qîmeta xwendina tarîxê” bike... Her wekî “rica”ya Baban Abdulazîz qebûl bûbe, helbestê rûyê xwe ji babetên kevin badaye. Baban Abdulazîz ji edîban rica kiribû ku (1913-4: 14) dev ji pesnê mîr û wezîran, bedewiya hûrî û cariyeyan berdîn, faydeyê bibêjin û qewmê xwe îqaz bikin ji bo metirsiyan; bi raya Baban Abdulazîz, dema huner ne ji bo xwe, ji bo faydeyê be, dikare tiştên qenc nîşanî insanên xwe bide; jixwe di serkeftinên Almanya, Îtalya, Yewnanistan, Sirbistan, Bulxaristan û Japonyayê de paya edîbên wisa hene ku bi vê wesfê edebiyatê îcra dikin.

Ev cure terkkirina belaxatê, normal e ku bi xwe re mirina bikerê lîrik bîne û bibe destpêka siyasîbûna helbestê, heta helbesteke ku di heman mijarê de bi awayekî palempsest xwe dubare dike (Yekdeş&Erdem, 2014: 343). Wekî ku hat gotin, di vê maweyê de êdî niştîmanperwerî temayeke sereke ya helbesta nû ya Kurdî ye, lêbelê heman tema ye ku rûdana aliyekî din ê vê helbestê dereng dixîne: Şexsîbûn! Bi rastî jî zehmet e mirov rastî dengêkî şexsî bibe ku xwe qiset dike. Di şûna vê de, bêtir cînaveke kolektîf (em/me) heye ku li ser navê civakê xeber dide. Lê wekî ku hate zîman, daxwaza ji edebiyatê ku ji kêşeyên civakî ne dûr be jî bergeheke (riwangeh) nû ye. Ev daxwaz di heman demê de keşîfkirina civakê, kêşeyên wê yên neteweyî ye. Dibe ku ev alî, bûbe guvaşek li ser rûdana kêşeyên takekesî. Lewra heta astekê peydabûna helwesteke nû, sebebê derengketina peydabûna taybetiyeke din e. Di helbestên Koyî, Pîremêrd, Ebdurrehîm Rehmî, Qazîzade Mistefa Şewqî û heta Şêx Nûrî Şêx Salih de kêmbûna dengêkî tekane (singulier), heta dereceyekê bi rûdana vê temaya kolektîf re têkildar e.<sup>7</sup>

7 *Elem Çiçekleriya Kemal Fewzî* (li gor jimara 16an a *Jînê* ew kitêbeke 95 rûpelî ya helbestan e) heye û wisa diyar e bi Tirkî ye. Li gor katalogeke zanîngeha Princetonê (<http://library.princeton.edu/find/all/Hizanizade%20Kemal%20Fevzi>) ev kitêb di 1919/1335an de li Stenbolê, li matbaaya Necm-i Istiqlal çap bûye, lê halê hazir ew ne

### 3.2. “Çîrok”a Fuad Temo

Ji aliyê edebiyata modern ve xaleke din a vê qonaxê, peydabûna çîroka nû ye. Di nav xebatên edebiyata Kurdî de qenaetêke giştî ye (Shakely, 1998: 26; Ahmedzade, 2004: 190) ku *Çîroka* Fuad Temo (?-?), nimûneya yekem a vî cureyî be. Ev metna ku di jimara yekem û duyem a *Rojî Kurd* de çap bûye, wekî hin nimûneyên *Meseley Wijdan* û *Le Xewmaya* qonaxa Silêmaniyê nîvçe maye. Dîsa jî ev nimûne, di heman kovarê de ji nimûneya “Çîrokê Kurmanca” ya Kendo (1913-3: 31) û ji “Çîrok”a Babê Rewşo (1913-4: 31-32) cudatir, afirandineke şexsî û xwediyê bûyereke asayî ye. Temoyê ku kurê Tewfiq Begê mebûsê Wanê û aktivîstekî Kurd ê komeleya Hêviyê bû, bi vê metnê dimenek ji jiyana Şewêş, bavê wî, hezkirin û piştgiriya navbera gundiyan pêşkêş dike.

Ji çîrokê diyar dibe ku Şewêş kurekî deh salî ye, dêya xwe ya mirî nedîtîye, bavê wî şivanê gund e; feqîr in, di mala wan de tiştêk tune; meteke wî ya pîr heye. Şewêş zarokêkî qenc û bêdeng e, lewma hemû gundî jê hez dikin û rîspiyê gund xwedîtî lê dike, gelek caran dibe malê, xwarinê didê. Şewêş jî her êvar diçe ser rê, li hêviya bavê xwe dimîne, dema ku bav tê, baz dide diçe pêşiya wî, destê wî digire û maç dike. Dîsa êvarekê diçe pêşiya bavê xwe, lê bav dereng dimîne, tarî dikeve, Şewêş di nava tariyê de tenê dimîne, gazî bav dike, lê ji tu derê deng nayê, li ciyekî rûdinê û di nav tirsê de ji bo bavê xwe digirî. Lê piştî demekê ji aliyê tewlê de kerî û şivan xuya dikin, Şewêş dibaze pêşiya bavê xwe û bi girî jê dipirse ka çima dereng maye, qey ew nizane ku li malê kesekî wî tune. Ji bersiva şivan diyar dibe ku wê rojê pez têr nexwariye û ew jî hinek westî bûye. Lê ji girîna kurê xwe şivan jî diltenik dibe, digirî, kurê xwe himbêz dike û radimûse. Paşê pez dikin hewşê, berê xwe didin malê. Roja din dema şivan şiyar dibe, ferq dike ku gava rakirina pez bihuriye û ew jî nexweş e. Vê keliyê rîspiyê gund (ku lehengê sêyem ê çîrokê ye, lê wekî şivan nivîskar navek nedaye wî jî) li derî dide ka heta vê demê çima pez ranekiriye. Rîspî dibîne ku şivan nexweş e û jê rica dike ku wê rojê yekî din di şûna wî de bişîne ber pez heta ku deriyekî hêviyê li rûyê wî jî vebe. Dema Şewêş ji nexweşî û nalîna bavê xwe diltarî dibe û digirî, rîspî dilê wî aş dike ku nexweşiya bavê wî ne giran e, piştî çend rojekê dê baş bibe û heta wê demê dê xulamê wî Rizqo here ber pez. Rîspî, Şewêş bi xwe re dibe malê, zikê wî têr dike, amanekî tije xwarin dike ku ji bo şivan bibe û çend şîretên qenc lê dike ku ji gotina bavê xwe dernekeve, dilê wî neşikîne (1913-1: 25-26; 1913-2: 24-25).

Her çend di jimara duyem a *Rojî Kurd* de ji bo wê “dawî heye” hatibe gotin jî halê hazir di tu metnê de heta niha lêkoler rastî dewama wê nehatine, lewma

---

li ber destê me ye, lewma derbarê wê û *Les Fleurs du Mala* Charles Baudelaire de em nikarin qiyasekê bikin ka şexsîbûna ku wead dike çiqas werger e an çiqas îlham e.

aqubeta lehengan nediyar e. Lê ji terza wê diyar e ku dewama çîrokê hebûya dê bêyî rûdaneke nişkegav an girêkeka pevçûnî, çend halên din ên jiyana vê malbetê û gund pêşkêş bikira. Nebûna navê wê, nebûna navê her du lehengên sereke (şivan û rîspî), kêmiya hêmanên derûnî û teswîrên ku mekan muşexxes dikin, çend qelsî ne ji bo aliyên wê yên modern.<sup>8</sup>

### 3.3. Şanoya Yekem: *Memê Alan*

Nimûneya pêşin a şanoya Kurdî jî di vê maweyê de peyda bûye. *Memê Alana* Ebdurrehîm Rehmî Hekarî, wekî piyeseke du perdeyî di jimara 15 û 16ê *Jînê* de (1919-15: 24-28; 1919-16: 15-19) çap bûye. Mijara wê ev e: Ji bo parastina Qudsê Siltan Selaheddîn senceq vekiriye, mîrê Hekariyê tebaya xwe agahdar kiriye ku dê biçe arîkariya wî. Memoyê kurê Çavreşê jî biryar daye ku here vî şerî pîroz. Perdeya yekem vê biryara Memo, haletê ruhiyeya jina wî ya ku bûka hefteyekê ye û fikrên dêya Memo qiset dike. Perdeya duyem jî vegera Memo ji şer, sihêtikirina sêdaqata jinê û aqubeta trajîk a Memo qiset dike ku dêya wî ji vegera kur ne xebarder e û ji ber doza namûsê bi şaşî lawê xwe yê li bal bûkê razayî dukuje.

Leheng, bi niyeta Ebdurrehîm Rehmî tije ne, lewma ne xwe, lê fikrên nivîskar îcra dikin. Mesela di perdeya yekem de dema Memo destûr ji dêya xwe dixwaze da ku biçe şer, dêya wî şûna ku bibêje neçe, ez bi serê te me û tu hêj zavayê hefteyekê yî, wiha dibêje: “Kurê min, di rêya dînê xwe û di rêya welatê xwe de eger ez te helal nekim, Xwedê jî min helal naket. Eger tu îro neçî, sibê dijmin dê bêtin. Min tu ji bo rojekê weha xwedan kirî. Ku tu wî ciyî ji bo dîn û welatê xwe bigirî, navê kurdîtiyê, kurmancîtiyê îla bikî, min şîrê xwe helal kir.” (1919-15: 25). Ji aliyê dayikeke adetî ve ev gotinên ha elbet zorakî ne, leheng ewçend realist nehatine xêzkirin. Xezala jina Memo jî ku di perdeya yekem de ji ber çûna mîrê xwe digirî û xemgîn e, di ya duyem de dema li cem Kurdan qedrê mêvanan tê rojevê, dikeve nav xîtabeke antropolojîk. Heta di metnê de anakroniyê berçav heye dema ku Çavreş wekî dêyêke niştimanperwer diaxîfe. Lewra nivîskar ji bîr dike ku di salên parastina Qudsê de (1189) fikra kurdayetiyê, heta belkî peyva “welat” jî peyda nebûye. Bi ser de ji xeynî kurdayetiyê bi rêya cîhad û xezayê dîndarî, li cem Kurdan qedrê mêvanan û di dawî de jî hesasiyeta namûsê tev li vê metna piçûk bûye. Her çend nefesa metnê, di ber van temayên mezin de teng bibe jî nivîskar bi qerar e ku van mijaran parve bike û peyama xwe bigihîne me. Lewma hem di diyalog û hem jî monologên wan de, ev fezîlet (kurdayetî, dîndarî, qedrê mêvanan û namûs) dibin

8 Ger “Bir Kürd Mahbubesinin Sabah Meşgulyeti”ya (Mijûliya Sibehê ya Dîlbereke Kurd) Ebdurrehîm Rehmî Hekarî (*Jîn*, 1919-4: 10-12) û “Bir Hikâye”ya (Çîrokek) Dersîmlî Hûznî (*Jîn*, 1919-11: 10-11) bi Tirkî nebûna, dê wek nimûneyên din ên vî cureyî behsa wan jî bihata kirin.



naveroka metnê. E. Rehmî Hekarî, şanoyê wek enstrûmanekê dibîne. Dixwaze bibêje ku Kurd her daîm amade ne herin cîhadê, ew niştimanperwer û mêvanperwer in û di doza namûsê de gelek hesas in. Li vir xwediyê metnê ji nivîskarekî zêdetir, wekî aktîvistekî neteweyî tevdigere. Lê jixwe ne xerîb e ku li binê sernava metna *Memê Alan* di nav kevanê de ev hevok hebe: “Tiyatroya Kurdan fezîletê Kurdan noşî didit.”

### 3.4. Wergera Edebî

Her çend werger ne cureyekî edebî be jî di destpêka modernbûna edebiyatê de çalakiyeke taybet û girîng e. Ew temaseke rasterast e bi çand û edebiyatên din re. Werger, çalakiyeke taybet û girîng e, ji ber ku tesîrek li edebiyata heyî dike û îstiqametekê didê (Tanpınar, 1985: 287-288). Bo nimûne di dewra Tenzîmatê de wergerandina hin berhemên Ewropî, têrî kiriye ku edîb hêdî hêdî ji edebiyata Dîwanê dûr bikevin û berê xwe bidin pêvajoyeke afirînertir (Paker, 2003: 31). Bi qewlê Tanpınar (1985: 286) ev werger çiqas bê pusile, bê şûr û keyfî bin jî bi demê re îqamekirina formên edebî yên nû hêsan kirine. Ev kar, wextê Komara Tirkiyê di salên 1940î de bi Tercüme Bürosu (Saziya Wergerê) re geştir bûye û hema bibêje ji bo hemû pratîkên modernîzasyonê du armancên karakterîstîk wergirtiye: “Ji bo memleket, anîna fikir û hessasiyetên alema medenî” û “dewlemendkirina zimanê Tirkî” (Gürçağlar, 2003: 49-51).

Pêşî ji bo bidestxistina fikir û hesasiyetên esrî û dûre ji bo dewlemendkirina zimanê xwe, rola saziyên fermî yên wek *Tercüme Odası*ya Tirkan<sup>9</sup> û *Merkez-î Terjome-î Saltanata Farisan*<sup>10</sup> gelek e. Lêbelê ev sazî li cem Kurdan nînin ku li gor

- 
- 9 Li gor Ahmet Hamdi Tanpınar (1985: 142-143, 285), di dewra Tenzîmatê de Te - cüme Odası, Encümen-i Dâniş û hin qelemên ku li ber serê van ava bûne (Mabeyn Kalemî, Tophane Kalemî, Gümrük Kalemî), ne tenê rê li ber paşa û edîbên nûhez ên wek Ali, Fuad, Saffet, Edhem Pertev, Ziya Paşa vekirine; di heman demê de bûne amadekarên îdealeke siyasî ya nû jî. Bi xêra wan, di nav xortan de hînbûna zimanên ecnebî zêde bûye, ku van ciwanan rojnameyên Frensî û nivîskarên sedsala 18an ji eslê wan dixwendin, li ser fikrên wan diketin nav guftûgoyên germ û axir di muhîten xwe de jî bi jiyana xwe dibûn amilê îrfana xerbê. Yên ku *Sefiller*, *Télémaque*, *Topal Şeytan*, *Robinson Cruzoe*, *Monte Cristo*, *Atala*, *Paul ve Virginie* wergerandine ji nav van derketine.
- 10 Li gor Yılmaz Karadeniz (2012: 181-189) di dewra Qeçeran de li Îranê, bi avabûna Tercüme Odası re (1871), karê wergerê bi pêş ketiye. Wergêr, ji bo ku di warê meşrûtiyet û islehetê de gel sewq û îdare bikin, werger kirine karekî rojane. Wergêr bêyî ku lê binêrin ka metna li ber destê wan edebî, felsefî an dîrokî ye, ji aliyê civakî û çandî ve ew kirine amrazê guherînê û pê ji bilî kitêbên dîrok, cografya, teknîk û huqûqê, yên edebî (çîrok, roman, tiyatro) jî wergerandine. Di vê dewrê de berhemên Alexandre Dumas, Voltaire, Balzac, Fenelon, James Morie, René Lesage, Tolstoy,

bernameyeke çandî ya dewletê bi rê ve biçin. Lewma dîsa di tunebûna îmkanên dewletê de wekî gelek baran, ev bar jî maye ser piştta hin edîb û ronakbîrên Kurd. Bi ser de ji bilî Tirkî nezanîna zimanekî biyanî û duzimanîbûna (Kurdî û Tirkî) ronakbîrên vê demê, fersend nedane ku asoya edebiyata Kurdî bi wergerên curbicur fireh bibe.

Lewma di vê maweyê de hin xebatên sade yên Xelîl Xeyalî (1865-1946) derdikevin pêş. Ev kesê ku di maweya Meşrûtiyeta Duyem de li hemû saziyên Kurdan xebitiye, di kovar û rojnameyên Kurdî de gotarên civakî nivîsiye û elîfbayek ji bo kurmançî amade kiriye, du wergerên edebî jî kiriye: “Hewar û Fizar(a) Misilmanî” (*Rojî Kurd*, 1913-2: 32) û “Ey Şairê Şêrîn Zimanî Rûmî Tahiru’l Mewlewî” (*Hetawî Kurd*, 1914-10: 14-15). Ya pêşîn ji Mehmed Akîf Ersoy e, ya duyem jî ji Tahir Mevlevî ye. Ev, du wergerên serkeftî ne, ji ber ku bi giştî qaîdeyên rûxsarî û naverokî pêk anîne. Lêbelê di hilbijartina wan de ji hesasiyetên edebî bêtir, yên olî rolek listine. Ji ber ku mijara helbesta Ersoy nakokî û nîfaqên nav misilmanan e; ya duyem piştî şerê Balqanan ka çi hatiye serê misilmanên Rûmeliyê ji xwe re kiriye mijar.

Bêguman beriya Xelîl Xeyalî di *Kürd Teavûn ve Terakki Gazetesi* de (jimar 2, 3 û 6) tecrûbeyeke Haydarîzade İbrahîm (Efendî)<sup>11</sup> heye ku wî gotareke Alphonse de Lamartine a derbarê Hezretî Pêxember de kiriye helbesteke dirêj. Lêbelê ev manzûme, bi Tirkî ye. Dîsa piştî Şerê Cîhanê di kovara *Jînê* de (jimar 6 û 12) em rastî tecrûbeya Suleymaniyelî Tewfîq (Pîremêrd) tên ku ji Nalî û Mihemed Axay Derbendfeqereyî helbest wergerandine, lêbelê zimanê van wergeran jî mixabin bi Tirkî ye, lewma ew nikarin bibin malê edebiyata Kurdî. Wekî ku hate gotin, ji bilî Tirkî nezanîna zimanekî biyanî û duzimanîbûna ronakbîrên Kurd, pêkerên vê encamê ne. Bi rastî jî heta qonaxa Rewanê û piştî jî ya Şamê, em ê rastî wergerên edebî neyên.

#### 4. ENCAM

Edebiyata Kurdî ya modern, di serê sedsala bîstan de, bi giştî li bajarên derveyî Kurdistanê peyda bûye. Tunekirina otorîteyên herêmî; parçebûna duyem a Kurdistanê; di nav rêvebiriyên mandater de li Iraq û Sûriyeyê ji bo Kurdan çêbûna hin fersendan; di wextê şerê cîhanê yê Yekem de cîwarbûna hin eşîrên Kurd ên Êzîdî li Qefqasyayê; di dema cuntayên leşkerî de koçberiya ber bi diyasporayê ve; bi geşbûna têkoşîna Kurdî re li Kurdistanê çêbûna hin reform û destkeftiyan

---

Turgenyev, Cervantes, Molière, Shakespeare û ji Erebi *Be Hezarî Yek Şeb* tev li edebiyata Farisî bûne.

11 Em ji nivîsa “Bir Hasbihal”ê (*Jîn*, 1918-1:3-5) derdixin ku xwediyê wê Haydarîzade İbrahîm, Kurdek e.

hwd. çend sebebên vê rewşê ne. Lê sebeba sereke, tunekirina navendên Kurdî ne ku ew nebin cihê daxwazên siyasî. Bi vê niyetê Dewleta Osmanî bi politikayên merkezî re statûya yurtluk-ocaklık a erdên Kurdan guhertiye. Di encama vê yekê de li Kurdistanê bajarekî ku bibe qibleya rêvebiriya Kurd û daxwazên wî yên edebî nemaye. Wek paytextekê, Stenbolê ev rol listiye. Ev cihê ku otorîteyên çeperî û reqîb tune kiriye, bi awayekî paradoksî ji bo heman unsûrên çeperî û reqîb bûye cihê çalakîyên edebî û daxwazên siyasî. Lewma di vê sedsalê de ji milletê Kurd gelek şexsiyet li Stenbolê berhev bûne û ew ji bo edebiyata Kurdî kirine mekanek. Di dawîya vê rewşê de jimara wan kêm jî be, ew xwediyê hin acemîtiyên destpêkê bin jî hin cureyên nû yên wek çîrok, şano, wergera edebî peyda bûne, fêhm û feraseteke nû hatiye helbestê. Ger di şûna Tirkî de Kurdî bihata tercîhkirin, dibe ku jimara çîrok û wergerên edebî yên vê periyodê zêdetir bûna. Lê dişa jî bi hêsanî dikare bê gotin ku şexsiyetên wekî Hacı Qadirê Koyî, Ebdurrehîm Rehmî Hekarî, Fuad Temo, Xelîl Xeyalî pêşengên edebî yên vê qonaxê ne.

## 5. ÇAVKANÎ

- Cevdet, A. (1913), “Ermeniler ve Kürdler”, *İctihad*, 14 Şubat 1326 (27 Şubat 1913), j. 54, İstanbul.
- Cevdet, A. (1919), “Kürdçe Yeni Bir Eser”, *Serbestî*, 4 Mayıs 1919, j. 485, İstanbul.
- Adak, A. (2015), *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, ç.3, İstanbul: Nûbihar.
- Ahmedzade, H. (2003), *Ulus ve Roman, fars ve kürt anlatsal söylemi üzerine bir çalışma*, werger: Azad Zana Gündoğan, İstanbul: Pêrî Yayınları.
- Baban, A. (1913), “Edebiyyâtımız ve Udebâmızdan Bir Ricâ”, *Rojî Kurd 1913*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, 2013, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, 4, 13-14/212-213.
- Rewşo, B. (1913), “Çîrok”, *Rojî Kurd 1913*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, 2013, Stenbol: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, 4, 31-32/229-230.
- Berman, M. (2003), *Katı Olan Her Şey Buharlaşıyor*, werger: Ümit Altuğ- Bülent Peker, ç. 6, İstanbul: İletişim.
- Bir Kürd (1918), “Kürdler Uykuda Değil”, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî Kürdçe-Türkçe Dergi 1918-1919*, (amd.) M. Emin Bozarslan, cild I, 1985, Uppsala: Weşanên Deng, 1, 6/188.
- Casanova, P. (2010), *Dünya Edebiyatı Cumhuriyeti*, werger: Saadet Özen, Filiz Deniztekin, İstanbul: Varlık Yayınları.
- Celil, C. (1992), *19. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğunda Kürtler*, werger: Mehmet Demir, Ankara: Özge Yayınları.
- Ardelanî, D. (1919), “Hamûman”, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî Kürdçe-Türkçe Dergi*

- 1918-1919, (amd.) M. Emin Bozarıslan, cild V, 1988, Uppsala: Weřanên Deng, 20, 18/908.
- Dođan, C. (2011), “II. Mahmut Dönemi Osmanlı Merkezileřme Politikasının Dođu Vilayetlerinde Uygulanması”, *Turkish Studies*, 6/4, rr. 505-521.
- Erdost, M. İ. (1989), *Osmanlı İmparatorluđunda Mülkiyet İliřkileri, asya biçimi ve feodalizm*, ç. 2, Ankara: Onur.
- Ergün, Z. (2014), *Bajar, Edebiyat û Cizîra Botan*, İstanbul: Nûbihar.
- Ergün, Z. (2015), “Netewetiya Kurdî û Rengvedana Wê di Helbesta Kurdî ya Nû de”, *Nûbihar Akademi*, 4/1, rr.11-40.
- Farabi (2001), *El-Medinetü'l Fâzıla*, werger: Nafız Danıřman, Ankara: MEB Yayınları.
- Fischer, E. (1990), *Sanatın Gerekliliđi*, werger: Cevat Çapan, ç. 6, Ankara: V Yayınları.
- Temo, F. (1913), “Çîrok”, *Rojî Kurd 1913*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, 2013, Stenbol: Weřanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, 1, 25-26/121-122; 2, 24-25/155-156.
- Gencer, F. (2010), *Merkeziyetçi İdari Düzenlemeler Bađlamında Bedirhan Bey Olayı*, teza doktorayê ya neçapkirî, Ankara: Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.
- Ghaderi, F. (2014), “Hacî Qadirê Koyî û Hilatina Neteweperweriya Kurdî”, wer. Fexriya Adsay, *Zarema*, jimar 2, rr.43-50.
- Gürçađlar, ř. T. (2003), “Tercüme Bürosu Nasıl Dođdu, Birinci Türk Neřriyat Kongresi ve Çeviri Planlaması”, dnd. *Çeviri Seçkisi I: Çeviriyi Düşünenler*, (amd.) Mehmet Rifat, İstanbul: Dünya Yayıncılık.
- Koyî, H. Q. *Dîwan*, (amd.) Arif Zêrevan, (sererastkirina latînî) Newzad Hirorî, çapa dijîtal, Sweden: Nefel.
- Haydarîzade, İ. (1918), “Bir Hasbîhal”, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî Kürdçe-Türkçe Dergi 1918-1919*, (amd.) M. Emin Bozarıslan, cild I, 1985, Uppsala: Weřanên Deng, 1, 3-5/185-187.
- Hekarî, E. R. (1919) “Memê Alan”, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî Kürdçe-Türkçe Dergi 1918-1919*, (amd.) M. Emin Bozarıslan, cild III, 1986 û cild IV, 1987, Uppsala: Weřanên Deng, 15, 24-28/674-678; 16, 15-19/725-729.
- İbn Haldun (1988), *Mukaddime*, werger: Süleyman Uludađ, cild I; û İbn Haldun (1991), *Mukaddime*, werger: Süleyman Uludađ, cild II, ç. 2, İstanbul: Dergah Yayınları.
- Karadeniz, Y. (2012), “İran’da Tercüme Faaliyetleri ve Tercüme Edilen İlk Kitaplar (1830-1904)”, *Uluslararası Sosyal Arařtırmalar Dergisi*, 21/5, rr.178-191.
- Kendo (1913) “Çîrokê Kurmanca”, *Rojî Kurd 1913*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojiyê, 2013, Stenbol: Weřanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, 3, 31/196.

- Lahûfî (1919), “Le Ber Rohî Kurde Biçûkan”, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî Kürdçe-Türkçe Dergi 1918-1919*, (amd.) M. Emin Bozarslan, cild V, 1988, Uppsala: Weşanên Deng, 23:16/976.
- Minorsky, V. (2004), *Kürtler-Kürdistan*, werger: Kamuran Fıratlı, ç. 2, İstanbul: Doz.
- Paker, S. (2003), “Tanzimat Döneminde Avrupa Edebiyatından Çeviriler”, dnd. *Çeviri Seçkisi I: Çeviriyi Düşünenler*, (amd.) Mehmet Rifat, İstanbul: Dünya Yayıncılık.
- Shakely, F. (1998), *Modern Öykü Sanatı*, werger: Rohat Alakom, İstanbul: Avesta.
- Qazî(zade), L. (1919), “Xezel”, *Jîn Kovara Kurdî-Tirkî Kürdçe-Türkçe Dergi 1918-1919*, (amd.) M. Emin Bozarslan, cild II, 1985, Uppsala: Weşanên Deng, 7:18/380.
- Tanpınar, A. H. (1985), *19uncu Asır Türk Edebiyatı Tarihi*, ç. 6, İstanbul: Çağlayan Kitabevi.
- Xeyalî, X. (1913) “Hewar û Fîzar Misilmanî”, *Rojî Kurd 1913*, (amd.) Koma Xebatên Kurdolojîyê, Stenbol: Weşanên Enstitûya Kurdî ya Stenbolê, 2, 32/163-164; Xelil Xeyalî (1914), “Ey Şairê Şêrîn Ziman Rûmî Tahîrû’l Mewlewî”, *Hetawî Kurd*, İstanbul, 10, 14-15.
- Yekdeş, Ö. F. & Erdem, S. (2014), “Bölücü Bir Edebiyat mı Bölünmüş Bir Edebiyat mı?: Geç Osmanlı Dönemi Kürt Edebiyat(lar)ı”, dnd. *Tanzimat ve Edebiyat Osmanlı İstanbul’unda Modern Edebi Kültür*, (amd.) Mehmet Fatih Uslu - Fatih Altuğ, İstanbul: İş Bankası Yay, rr. 329-357.

### Extended Abstract

There is a close relationship between literature and the town. This relationship has produced an individual who has built a wider rapport with the material and non-material layers of life, refined aesthetical and intellectual tastes and become open to new contacts in cities which have come to enjoy relative ease in the areas of security, public works and literacy with the advent of the modern times. In modern literature, which is mainly the occupation of an individual of such qualities, new genres have appeared and the old ones developed new themes. Modern Kurdish literature which came to being in Istanbul, that is, situated so far away from Kurdistan shares such a fate. This literature gained life in an environment containing foreign and different contacts and with new people. Having said that, Istanbul which served as the crib of modern Kurdish literature was later joined by other centers that came into existence due to historical and social causes. Suleymaniye, Damascus, Baghdad, Yerevan, Mahabad, Stockholm and some other Kurdish towns and colonial capitals again developed into literary spaces because Kurdistan underwent a second dismantling in the First World War, Kurds found some period of opportunities during the mandate rule in Syria and Iraq, Ezidis who migrated to the Caucasus and the Kurds resident in the Soviet

Union gained cultural rights there, they established a short-lived autonomy in the Iranian Kurdistan, some intellectuals became refugees due to military coups and they found opportunities to further literary work in the diaspora, and there were some political reforms that were realized after the Kurdish struggles gained social currency. The literary milieu and space which was formed by means of all these social and political factors, contributed to the tone and identity of modern Kurdish literature. This process has brought about a new space in which Kurdish literature made new contacts and also posed a historical threshold which limited and even fractured contact between these different spaces.

Nevertheless the most pronounced factor in all of these is the policy of centralization conducted by the Ottoman State in the twentieth century. Due to the success of this policy, the Kurdish aristocratic powerholders were eliminated, and because of this, urban development in Kurdistan was frustrated which otherwise would have resulted in a focus for intellectual, literary and political attractions and would have also posed as a political center. Instead of that, Istanbul became a substitute as a host of various attractions, and turned into a literary and political space for the exiled Kurdish aristocracy and the literate Kurds of all walks of life. This has turned Istanbul into a location where modern Kurdish literature was born and also new genres were raised. Despite their small number in current actuality, new genres such as drama, story, literary translations were born here, and a new poetry with its roots in the past also developed here.

The new genres first appeared during the Second Meşrutiyet (1908) by means of the Kurdish newspaper and periodical press but the old poetry first becomes visible in the *gazals* of the pioneer Hacı Qadirê Koyî. Because in these *gazals*, we see less of the rhetorics of the past, but more of the vernacular language, more of the experienced life rather than the things taken for granted, more of the usage of the contemporary thoughts, a desire to observe and protect the context, and paying respect to some extent to critical thinking, which is considered by some as a child of modernism.

When it comes to new structure, besides new content, the examples are to be drawn from Ebdurrehîm Rehmî Hekarî. His poems display modern tendencies in, for example, possessing titles, and a point of view. They are usually didactic product following the view of enlightenment. In these poems, with such themes as eliminating ignorance, waking up from a sleep of stupor to start working, sacrificing for the sake of one's country and for people in distress, homesickness, being a refugee and poverty, the lyrical individual is weakened to a great extent, and it is replaced by the individual who speaks for the common good and possess a political and social voice. In fact, this state is very much like a price paid by Kurdish poetry that has assumed a new voice and became political. Because the personality of the poetic voice which is also a sign of modernity, was present in such poets as Qazîzade Mistefa Şewqî, Lahûtî, Qazîzade Letîf, Mihemed Mîhrî who had produced very little in poetry. However, the same social tone was borne by the text of the *Memê Alan* by E. Rehmî Hekarî which is considered to be the first Kurdish play. In this tragic story, Memo, who had got married only a week before, obeys the call to arms of the *beg* of Hak-

kari for the defense of Salahaddin Ayyubi at Jerusalem. The author takes drama and the theater as a space where certain virtues (martial glory, patriotism, hospitality and decency) are going to be taught.

Despite its certain blunders, the most personal product of this period is by Fuad Temo and his incomplete work. "Çîrok" which is the very first example of the modern Kurdish storytelling, focusses on the orphan Şewêş, his poor shepherd father, and the old well-to-do villager. This work which takes two days in the lives of these people, is a story of section and is interesting in its aspects, because in many nations the story is supposed to have the conventions of introduction, crux and resolution.

The literary translation oeuvre from this period is by Xelîl Xeyalî. In both of the two poems he had translated from Mehmet Akif (Ersoy) and Tahir Mevlevî (Olgun), due to their religious sensibility, Xeyalî remained mature in both structure and content. After these two examples, the literary translation would not be attested again until the stage of Yerevan and Damascus (the Hawar tradition).





# Giredayeyê Edebîyatê Polîtîkî De Romanê Kılama Şilane\*

## The Novel Named Kılama Şilane (The Song of Şilane) in the Context of the Political Literature

İlyas AKMAN\*\*

### KILMVATE

Edebîyat, goreyê tay nuştoxan tena huner, estetîk nîyo. Edebîyatkarî ke no hewa fikirîyênî yew mîsyon barkenî edebîyat ra û eseranê xo, seba no mîsyonî sey yew wasita veynenî. Edebîyatê Zazakî de zafî nuştoxî, eseranê xo seba yew armancî nusenî. Înan ra yew zî Îlhamî Sertkaya yo. Eseranê ey de babetê sîyasî/polîtîkî, çayo giran gînî. *Kılama Şilane* no hewa yew roman o. Sertkaya, eserê xo de ca dano serebûtê sîyasî ke tarîxo nêzdî de ameyî meydan. Meseleyê Kurdî, zaf hokan ra girîyeno dest. Înan ra yew ziwan o. Barkerdişê mecburî, yewna babete ya ke nuştox, balayê wendoxan rê pêşkeş kenê. No romanê sîyasî de derbeyê 1980î zî çayo giran tepşeno. Meseleyê Kurdî ra vêşêr, bêdaletîye, seypênêbîyayîşê komele ser de zî vindîyeno.

**Çekuyê Kilîdî:** Romanê Kılama Şilane, Edebîyat û Ziwanê Zazakî, Edebîyato Polîtîk.

\* Romanê *Kılama Şilane* de nuştox herfa "î" nêşuxulnayo. Herfê "î" û "i" şuxulnayo. Coka ma zî nameyê romanî de û rêzî ke ma roman ra girewtî de herfa "î" ney herfê "i" û "i" şuxulna.

\*\* Alk. Doç. Dr., Zanîngeha  
Mardîn Artukluyî, Fakulteya  
Edebîyatî, Beşa Ziwan û  
Edebîyata Kurdî, Mêrdîn,  
Turkiye; Asst. Prof., Mardîn  
Artuklu University, Faculty  
of Literature, Department of  
Kurdish Language and Literature,  
Mardin, Turkey,  
ilyas-akman@hotmail.com

### ABSTRACT

Literature is not just aesthetics, according to some authors. Authors who think in this way load the missions to literature and use their works as a tool for this mission. Many writers in Zazaish/Zazakî literature write their works for a purpose. İlhamî Sertkaya is one of them. Politic issues holds an important place in his works. *Kılama Şilane* (The Song of Şilane) is a work of this kind. Political events have an important place

in the work. The Kurdish question is addressed in many ways. The language is one of them. Forced migration is another important issue. The military coup of September 12, 1980 and social injustice are other important issues.

**Keywords:** The novel named *Kılama Şilane* (The Song of Şilane), Zazaish/Zazakî Literature and Language, Political Literature.

## 1. DESTPÊK

Têkilîya edebîyat, sîyaset û îdeolojîyî, wextê verênan ra est o. Tay edebîyatkarî, yew mîsyon barkenî edebîyat ra û eseranê xo, seba no mîsyonî sey yew wasita veynenî. Heme edebîyatan de no hewa eserê sîyasî, îdeolojîkî est î.

Zafî toerîkarê edebîyatî, nuştewanê xo de behsê no fikrî kenî. Mîsale, Eagleton, ney vano: “Edebîyat, manayo ke ma mîras girewto yê çekûyî, yew îdeolojî yo” (2011: 36). Goreyê nê teorîkaran edebîyat, huner, çîyo ke tewr nîzdiyê cuyê reelî yo (Wood, 2010: 109). Çernîşevskîy zî no hewa fikirîyeno. O vano ke mîsyonê edebîyatî, îzahkerdişê cuyî yo (2012: 131). Murat Belge zî vano ke şartê bingeyê edebîyatî, aks kerdişê cuyî yo û têkilîya edebîyat, sîyaset û îdeolojîyî zaf o (1975: 40). Gama ke edebîyat, huner yeno sîyaset, îdeolojî hete zî objektîfîye wedarîyeno. No hewa eseran de mûnite, weçînişê qerekeranî û unsurê êbinî seba yew armanc yenî şuxulnayîş.

Seke ame vatiş, no hewa eseran de objektîfîye peygoş beno. No semed ra tay edebîyatkarî, ney vanî: “Qerekerî ke hetê yew nuştoxî ra virazîyayî çende objektîfî?... Têkilîya Homa û insanî de insan çende azad bo, encax hende benî” (Lukacs, 2007: 96). Yanî, goreyê înan, azadbîyayîşê qerekeran mumkun nîyo. Bira, ê seba yew armancî est î. Mîsale, gama ke nuştox yew qerekerê ke rexneyê xo û cuyê reelî keno virazeno, armancê ey o yo ke wendoxê ey zî wa rexneyê xo û cuyê reelî bikî (Felski, 2010: 40). Heto bîn ra nuştox, tay qerekeran, bi hewayo pozîtîf, tayêne zî bi xasletano xiraban pêşkeş keno. Bi no metod, wazeno ke wendoxanê xo kaşko fikrê xo ser (Pospelov, 2005: 122). Kê şînî no hewa eseran, edebîyatê Zazakî de zî veynî. Zafî nuştoxî, eseranê xo seba yew armancî nusenî. Înan ra yew zî Îlhamî Sertkaya yo. Eseranê ey de sîyaset, îdeolojî cayo muhîm gînî. Eserê ey *Kılama Şilane* serre 2007 de neşr bi û no hewa yew roman o. Nuştox, bingeyê eserê xo de ca dano meseleyê Kurdî. Zafê hokan ra na babete ser vindeno. Ma na meqale de ceribnenî ke unsurê sîyasî ke eser de vêrenî tesbît bikî.

## 2. AWANKERDIŞÊ KAMÎYÎ Û CUYÊ DEWE/CAYÊ TEBERÊ YÊ ŞARÎSTANÎ

Nuştox, kamîyê Kurdiye (Zaza û Kurmancî) ser zaf vindeno. Bira, kê şînî vacî roman, semedê na babete nusîyayo. Tay hacetan ser timutum, bala wendoxî kaş

bîyeno Kurdiye ser. Cuyê dewe, seba kamîyê Kurdiye zaf giran a. Nuştox, cuyê dewe ser ra kamîyê homojenê yê Kurdiye wendoxan rê pêşkeş keno.

Dewî û cayê bînî ke teberê şarîstanan de yî hîna homojen î. Safîyê kamîyê xo hîna zelal muhafaza kenî. Çunke nê cayî, cayî bînan rey de nîşnî bi asan têkilîya ronî. Nê cayî, teberê endustrî, turîzm û bazirganîyeyî de yî coka însanê nê cayan kamî û kultur o ke bawkalanê xo ra girewtî hîna zaf muhafaza kenî. Nesilî bedelî zî cuyê nê cayan bi asan nêbedelîno. Heto bîn ra ganî bivacîyo ke na rewşe, serranê peyênan de tay bedelîyaya. Aversîyayîşê teknolojî (bi taybetî internet, TV ) rey de dinya bi xo bî “dewa global.” Davîd Harvey vano ke bi sînyala radyoya verên a ke Eiffel ra vilabî dinya, ca/mekan hînî heme ca de ame rêzê yew wextî (2012: 300). Yanî globalîye, sînyala radyo reyde hêz gîna û xora ewro, resayo rehendo dêwendam. Hînî, heme mekanî heme cayan de yî. Cayo ke yew qirneyê dinya de yo şîno ê qirneyê dinyayê binan de têkilîya rono. Heme cayî, tesîrê yewbînan kenî. La romanê Sertkaya de fikrê “dewa global” ney, kamîyê dinyayê verên xo rê ca veyneno. Xora armancê Sertkayayî globalîye nîyo, kamîyê Kurdiye yo. Coka, romanê ey de dewe kamîyê, kulturê Kurdiye bi zelal lanse kena. Sewbîna romannuştoxî ke no hewa fikirîyeni zî est î. Mehmed Uzun, înan ra yew o. O vano ke endustrî, bazirganîye ra durkewtiş û qedexebîyayîş Kurdî rê xirabîye kerda. La heto bîn ra na rewşe, Kurdî rê hawilîye zî kerda. Nê heme sebebî, Kurdî eşta dinyaya xo zere û peynî ey de zî Kurdî pak, naîf û zelal monayo (2009: 49). Endustrî, bazirganîye û turîzm zelaleyê zîwan û kamî tay xerepnenî. Sertkaya zî seba romanê xo, yew cayo ke qet têkilîya ey yewna ca de çin o weçînenno. O, qestî/hişmendane no hewa yew ca weçînenno ke Kurdîye bi zelal lanse biko.

Rîpelê verênan de behsê yew dewe beno. Dewe, bi vatişê nuştoxî, tena xo û asmên veynena. Bi no vatiş zî zelalîye û pakîyeyê dewe nawnîyeni. Asmên pak, zelal û kewe yo û insanî şa keno. Dewe, tena no hewa yew rindîyeyî veynena û binê aye de ya. Sewbîna çî nêveynena. No cayo homojen, saf bi çend nesil o kamîyê xo muhafaza keno. Nuştox, hişmendane, têkilîya no cayî û însanê ey beno resneno yew ristimo kehan. Yew metafor zî şuxulneno: “Mabênê nê kêyan de, ju dara goze, kes nêzaneno ke, çî wext ra nata, pel û gîlanê xo, tariqe de arde bî” (Sertkaya, 2007: 7). Dewijê ewroyî, xebatî dima, binê na gozêra ke tarîxê aye nêzanîyeno de roşenî û tereqnenî. No çîyo ke ê kenî, bawkalê înan zî kerdênî. Na gozêre, heme qalî ke tarîx de na dewe de vacîyayî vîrê xo de muhafaza kena. Na dewe de heme nesilî wayîrê eynî cuyî bî. Yewna çîyo ke çend nesilan viraştro est o: “Dewe, zê her usar, bar kerd bi ame bi ware... Warê Pircanan ke nîka şênatiya, ver u vîradê dî koyan de, cayê de rut u kemerî de bi... Baya gul u çiçeğan kewt bi tîmîyan, ebe bayê de weşe, der u dormê xo de vîla kerdêne” (Sertkaya, 2007: 7). Nê dewijî, barkenî şonî ware û weyra, mîyanê boya weşe, hewayo ponkî, awa serdî de ciwîyeni.

Nuştox, rîpelê verênan de hişmendane na zelalîye, pakiye û homojenîye pêşkeş keno. Çünke, wendox weyneno ke badê, tay kesî dest erzenî no cayo rindî ser. Nê kesî wazenî ke na rindîye bixerepnî û înan bibedelnî. Yanî nuştox vano ke îdarekerdixî, no cayo ke qet kesî rê xirabîye nêkerdo, tena benetî xo û asmên de ciwîyeno zî asan nêverdonî. Ê wazenî ke kamîyê no cayî bibedelnî. Ma nîka şîni nê behsan ser zî vindirî.

### 3. SEREKÊ BEŞÊ QEDEXEYÊ KURDKÎ Û RADYOYÊ ERÎWANÎ

Roman, yew dewa Kurdan de vêreno û her kes bi zîwanê xo yanî bi Kurdkî xeberî dono. La îdarekerdixî, bire/qerar dayo ke ganî Kurdan bibedelnî. Seba ke biresî armancê xo tewr verî, Kurdkî ser vîndenî û wazenî ke aye mîyan ra wedarnî. Sertkaya, zaf ehemîyet dono na babete coka naye, babeta merkezîyan ra yew a û bi hewayo dramatîk pêşkeş bena.

Protagonîsta romanî Şîlan a. A mekteb de raştê rîyê serdinê yê îktîdarî yena. No rîyo serdin, ceribneno ke wendekaro bibedelno û înan, hewayo ke o wazeno pîl biko. No proses de nuştox, sehneyanê dramatîkan têdîma pêşkeş keno ke wendoxan kaşko fikrê xo ser. No, yew taybetê edebîyatê polîtîkî yo.

Verî, yew mamosteyo bêrehm aseyno. Rîyê ey timutim miruznaye yo, nêhuyeno û wendekarî ey ra tersenî. Pey çuwe, wezîfeyê keyeyî kontrol keno. Goreyê Şîlane ters, çuwe, mamoste û heqeret eynî çî yî. Mamoste, porê wendekarî ke wezîfeyê xo nêkerdî kaş keno, pey çuwe dono înan ra. Kê şîni çîyî ke heta nîka vacîyayî zafê mekteban de weynî. La nuştox, vano ke seba kutîşî sewbîna sebebî zî est î. Xora o, seba nê sebebana romanê xo nuşto û înan ser zaf vindeno. Mamoste, mîyanê wendekaran ra yewî ajanê xo keno. Wezîfeyê casusî no yo ke kam wendekar keye de kuçe de wendegêh de bi Kurdkî xeberî bido, o înan mamosteyî ra vano. Mamoste zî înan kuweno, heqeret keno. Roman de ajan Hesen o: “Malîmi cî ra vat bi her şew so pê keweran de vînde, goş bîde serê teleban bî dîzdî, kam ke tîrkî nê, zonê xo qesi keno, namê inan bînusne, mî ra biya” (Sertkaya, 2007: 27). Nuştox, bi no qalan nawneno ke bira mehremîyetê îdarebîyayoxan çin o. Cayo tewr mehrem keye yo û seke vacîya, no ca zî binê çîmanê iqtîdarî de yo. Ters, ameyîş ewnîyayîş, sistîye heme cayê îdarebîyayoxan piştano û ê, bêçare bi tersê derbe girewtîş, ameyîş ewnîyayîş de ciwîyenî.

Mamoste, yew gedeyo ke hama 9 serre yo ajanê xo keno. No zî nawneno ke îdarekerdixî, masumîyetê însanan zî suîstîmal kenî û prosesê îdarekerdîşî qet etîk nîyo. Sertkaya, wazeno ke wendoxî, nê hisan zerrî ra biciwîyî. Coka no sehne mûnîteno. Gedeyê êbîni Hesen ra persenî ke o qeyê na gure keno. O zî ney vano: “Nêzana... Malîmi mî ra va heni bike...” (Sertkaya, 2007: 28). Tena no bersiv şîno masumîyetê Hesenî binawno. O hama gede yo, masum o. Bira nêzono se keno.

Heme gedeyî zonî ke çimê mamosteyî înan ser o. Coka, keyeyê xo de zî rehet nî. Dewijî, şonî keyeyê Şilane û weyra radyoyê Erîwanî de kilamanê Kurdkî goşdarî kenî. Nê wextan de pêro xo vîndî kenî û seke firrenî şonî sewbîna dinyayan. Şilane bi xo kilaman ra zaf heskena û vengê aye zî zaf rind o. Xora heme kes ney zono û aye ra rîca kenî ke ge-ge kilaman vaco. Gama ke radyo de kilaman goşdarî kena aye zî xo vîndî kena. La tay wext ra dima, mamoste û Hesen yeno vîrê aye û nê fikrî hêşê aye de zimîyenî: “Hesen nîka ebe dîzdi ame bi verê keweri? O nîka goşdariya ma keno? Eke goşdariye bikero, gerê na radone keno ya gerê ma? Nê nê... Gerê radone gereke bikero, çî ke ma nê, radone kurmanci kılaman vana” (Sertkaya, 2007: 30). Şilane, mîyanê pêlanê tersî de şona yena. Ceribnana ke “guneyê xebirdayîşê Kurdkî” berzo radyo ser. Çünke goreyê aye ê ney, radyo bi Kurdkî xeberî dona, kilaman vana.

Di heman demê de dawîya her du çîrokan jî bi surprîzê diqede. Di her du çîrokan de jî serlehengên neyarên hev, di bin daran de asê dimînin. Di vê rewşê de li hev têne rehmê û dibin destebirayên hev. Hêvî û gumanên hevaltiyê yên xweş jî hev re dibêjin. Xwîner li hemberî vê rewşê wisa difikire ku dê zilamên wan bîn, wan rizgar bikin û hêviyên xweş pêk bînin. Lê çîrok qet ne li gorî van hêviyan diqede. Ev yek jî ji xwîner re dibe surprîz. Di çîroka “The Interlopers”ê de hevoka dawî “Gur in” (Saki, 1919: 45) û di çîroka “Bêbextî”yê de hevokên “Li ser berfê rêçine dehban û şopine xwîne xuya dikirin. Ji tîfingên şikestî, qetên cilan û ji kiloxên seriyên pê ve tu tişt nedîtin” (Bedirxan, 2009: 59) ji xwîner re dibin surprîz û xwîneran metel dihêlin.

### 2.1.2. Leheng

Çawa ku hate gotin di kurteçîrokan de kême leheng cih digirin. Di van her du çîrokên berdest de jî lehengên ku di bûyera çîrokê de cih girtine ev in: Ulrich Von Grandwitz û Georg Znaeym serlehengên çîroka “The Interlopers”ê ne; Çeçanê Bûbo û Serxanê Siyehpûş serlehengên çîroka “Bêbextî”yê ne. Di her du çîrokan de qala mirovên van her çar kesan tê kirin; lêbelê ev kes nabin endamên bûyera çîrokan. Di dawîya her du çîrokan de jî gur derdikevin ser dikê. Di çîroka “The Interlopers”ê de em çalakiyeke wan nabînin, lê di çîroka “Bêbextî”yê de em dibînin ku gur dibin parçeyeke bûyera çîrokê.

Di çîroka “The Interlopers”ê de Ulrich Von Grandwitz û Georg Znaeym neyarên hev in. Bi heman awayî di çîroka “Bêbextî”yê de Çeçanê Bûbo û Serxanê Siyehpûş neyarên hev in.

### 2.1.3. Cih (Mekan)

Di çîroka “The Interlopers”ê de cihê bûyerê dehleke çiyayên Karpathianan e. Di çîroka “Bêbextî”yê de cihê bûyerê dehleke Çiyayê Sîpanê ye. Di her du çîrokan de jî cihê bûyerê pir sînordar e, cih derdoreke teng a li nav darûberan e. Di her du çîrokan de jî ji bo şayesandina cihê zêde agahî nehatine dayîn. Di çîroka “The Interlopers”ê de cihê bûyerê wiha tê qalkirin: “Zilamek rojeke zivistanê di nav daristanêke gur a spîndaran de rawestiyaye. Ev daristan li ser hêla rojhilata Çiyayên Karpathianan cih girtiye.” (Saki, 1919: 42). Nivîskar bi me dide zanîn ku ev cih bi qasî xwe bi darûber e û tê de gelek ajalên kovî dijîn. Di çîroka “Bêbextî”yê de jî cih bi kurtî wiha tê qalkirin: “Di pesarên Sîpanê Xelatê de berf qerisî û bûbû kurşê. Berfê di bin reşikan de dikire xirçexirç û deng dida. Di bêlaneke rêlê de zilamek sekinî bû û guh dida dora xwe.” (Bedirxan, 2009: 55). Di her du çîrokan de jî qurm

û şaxên dareke gewre dikevin ser her du serlehengan û di binê wan de dimînin. Piraniya bûyerên her du çîrokên di vê asêmayîna her du serlehengan de diborin.

#### 2.1.4. Dem

Di her du çîrokên de jî dema bûyerê, bi şevê dest pê dike. Di çîroka "The Interlopers"ê de dem wiha tê aşkerekirin: "Zilamek rojeke zivistanê di nav daristanêke gur a spîndaran de rawestiyaye... Ulrich von Grandwitz di nav tarîtiya daristanê de li pey mirovekî dijmin digere." (Saki, 1919: 42) Lê wexteke diyar nayê gotin. Ji herîkîna çîroka "The Interlopers"ê em pê derdixin ku bûyer di demeke pir kurt de diqewime. Tam ne zelal be jî em dikarin bibêjin ku bûyer di saetekê de bi dawî dibe û çîrok diqede. Dema bûyerê çîroka "Bêbextî"yê jî wekî çîroka "The Interlopers" bi şevê dest pê dike. Hevoka yekem a çîrokê wiha dest pê dike: "Şevek ya zivistanê bû." (Bedirxan, 2009: 55) Lê çîrok danê şevê naqede. Em dibînin ku sahneya dawî ya çîroka "Bêbextî"yê danê sibê ye. Yanî şev çûye serî û bûye sibê. Bi hevokên çîrokê dem wiha hatiye aşkerekirin: "Sibetir peyayên wan di yek wextî de gihastin cihê ko axayên wan li berfê teqinîbûn." (Bedirxan, 2009: 59). Lewma dema bûyerê ya "Bêbextî"yê kêm be jî ji dema "The Interlopers"ê dirêjtir e.

#### 2.1.5 Bûyer

Bûyera çîroka "The Interlopers"ê li ser du kesan e ku bi malbatî dijminên hev in. Malbata Ulrich Von Grandwitz û ya Georg Znaeym ji bo erdekî di ber hev de ne. Çi ye ku di dema bapîrê Ulrich de malbata wan ji ya Georg hêzdartir e, bapîrê wî bi rêya dadgehê erdê ku li ser şer tê kirin, li ser xwe tapo dike. Lêbelê malbata Georg vê yekê tu car qebûl nakin û dema ku fersend dikeve destê wan dîsa dikevin vî erdî. Lewra di navbera her du malbatan de şer û ceng heta dema Ulrich û Georg tê. Dema ku ev her du kes dibin serekê malbata xwe, aloziya malbatan dikin pirsgirêkeke takekesî. Ji bo hev dilopek av jî zêde dibînin û dua dikin ku birûska Xwedê li dijminê wî bikeve.

Şeveke tarî Ulrich mirovên xwe dide hev ku biçin erdê xwe biparêzin da ku ji neyarê wan kesek nekevê. Erdê ku li ser şer tê kirin, binetara singekî ye. Ulrich mirovên xwe li ser singî bi cih dike ku ji bo dijmin kemîn daynin û ew bixwe jî ber bi binetarê ve dadikeve. Di dilê xwe de xweziya xwe tîne ku di vê şeva tarî û bagerî de ew û Georg rastî hev bînin ku dilê xwe bi kuştina wî rehet bike. Gava ku di van xeyalan de ye, di ber qurmê dareke gewre ya narewanê re dibore û bi George re rû bi rû dimîne. Demekê bêdeng û bêbiryar li nav çavên hev dinêrin. Her du jî şidiyayî ne û di destên wan de çek hene. Dilê her duyan jî bi kuştinê dikele. Beriya ku bêbiryariya xwe li ser xwe biavêjin, karekî Xwedavendî her duyan jî di bin xwe de diçilmisîne. Lewra maweya ku bê biryar li hev temaşa dikin, birûskek li dara ku ew li bin in dikeve û darê di ser wan de dirûxîne.

Her du jî di bin şaxên darê de dimînin. Destekî Ulrich di bin piştta wî de diherise û her du pêyên wî di bin şaxên giran de dimînin. Şaxên ketî, rûyê wî di nav xwînê de dihêlin. Dibîne ku va ye Georg jî tam di ber wî de ye, lê ji wî xirabtir di bin şaxan de maye. Georg hewl dide xwe xilas bike, lê hewlên wî berhewa dibin. Lê li rewşa Ulrich dinêre û dibêje ku çî edaleteke heq e ku tu li ser erdê dizî ketiyî dafikê. Ulrich lê vedigerîne û dibêje ku ez li ser erdê xwe me; dema ku mirovên min hatin em xilas kirin, tu yê ji ber van gotinên xwe poşman bibî. George dibêje tu çî dizanî ku dê pêşî mirovên te xwe bigihînin hawara me. Mirovên min jî di pey min re dihatin. Dema ku xwe gihandin me, dê zêde nefikirin ku barên li ser min rakin û yên li ser te zêde bikin; tu yê di wî halî de bimirî û çî ye ku ji edetê ye, ez ê xebera serxweşiyê bişînim ji bo malbata te. Ulrich dibêje ku min ji mirovên xwe re gotibû ku heta deh deqîqeyan bidin pey min. Jixwe va ye heşt ji wan çûn jî. Lê çî ye ku tu wekî diz ketiyî erdê min, ez ê tu serxweşiyê ji malbata te re neşînim.

Piştî demekê ku dibezin hev, her du jî bédeng dimînin. Her du jî dizanin ku dê mirovên wan zû bi zû xwe negehînin wan. Ulrich bi destê xwe yê saxlem ji ber xwe şûşa meyê derdixe û çend qurtan jê vedixwe. Piçek pê germ dibe û hesteke dilovaniyê diniqute dilê wî. Berê xwe dide Georg û dibêje ku tu dikarî xwe bigihîni vê şûşa meyê? Meyeke gelekî xweş e. Georg lê vedigerîne; nexêr hema bibêje tişteke nabînim, jixwe ez ji destê dijminê xwe ava heyatê be jî venaxwim. Ulrich piştî demekê bédeng ji Georg re dibêje ku cîran min nêrîna xwe guhert; eger pêşî mirovên min hatin, ez ê ewil te bidim derxistin. Ez te wekî mêvanê xwe dibînim. Jixwe beredayî ye ku em wiha ketine pêsîra hev. Cîran heger tu jî aliyê min bikî ku em vê dijminiyê ji holê rakin, ez ê ji te daxwaza hevaltîyê bikim. Georg jî dibêje ku eger ez û tu li ser hespên xwe bikevin meydana bajêr dê millet çawa bi heyirî li me bimeyizîne; dê xelkên derdorê erdê me bigihîne rehetiyê. Tu yê roja Sylvesterê bê mala min, ez ê bême qesra te. Dema ku te ez vexwendim ser erdê xwe, em ê bi hev re nêçîrê bikin. Ez ê te vexwînim lîtavê bo nêçîra çûkan. Erê Ulrich, ez ê bibim hevalê te.

Her du birîndar bédeng dimînin û dixwazin ku mirovên wan pêşîn bên da ku camêriya xwe nîşanî hevalê xwe yê nû bidin ku heta çend deqîqeyên berê jî dijminê hev bûn. Piştî demekê, gava ku dengê bayê piçek vedide; Ulrich ji Georg re dibêje ku belkî em bangî mirovên xwe bikin, dengê me biçe wan û bên me xilas bikin. Georg her çend ihtîmal nede vê yekê jî beşdarî Ulrich dibe û bangî mirovên xwe dikin. Çend caran bang dikin û Georg dibêje ku ji bilî dengê bayê tişteke li me venagere. Piştî bédengiyekê Ulrich bi şahî diqîre. Dibêje ku va ye ji singê ku ez daketibûm hinek ber bi me ve tîn. Her du bi hev re çiqas ji wan tê ber bi hatiyan ve diqîrin. Georg û Ulrich meraq dikin ka gelo yên tîn zilamên kê ne. Piştî demekê pê dihesin ku yên tîn ne mirov in, gur in.



Di çîroka "Bêbextî"yê de jî bûyer li ser rasthatina du kesan e ku ew bi malbatî dijminên hev in. Di çîrokê de malbatên Bûbo û Siyehpûş ev sê bavik in ku ji bo erdekî dehlî di ber hev de ne. Ji hev gelek kes kuştine. Çeçanê Bûbo kesekî jêhatî ye û erdê ku li ser dehwa tê kirin, li ser navê xwe tapo dike. Lê Serxanê Siyehpûş ji vê rewşê razî nîne û berberî li Çeçên dike. Ewqas li ser vî erdî rik dikutin hev wisa ku dikarin şevên tarî jî li ser erdî derkevin kontrolê ka gelo dijminekî wan ketiye nav erdê wan yan ne. Çeçan di şeveke tarî û bagerî de mirovên xwe li ser erdê xwe diêxe çavdêriya dijminan û derdorê erdê xwe bi tenê dimeşe. Xweziya xwe tîne ku niha li ser erdê wî Serxan rastî wî bê û dilê xwe bi kuştina wî rehet bike. Dema ku di ber qurmê dareke mezin re dibore ew û Serxan rû bi rû dibin. Her du jî serdan pê şidiyayî ne û xwedan çek in. Di dilê her duyan de jî fikara kuştinê heye. Tam di vê kêliyê de birûskêk li darê dikeve. Birûsk darê dike çend parçe û di ser wan de dirûxîne.

Çeçan û Serxan di bin darên ketî de dimînin. Destê çepê yê Çeçan di bin piştê wî de diherise. Serxan jî ji bilî ser û pêyan yekcar di bin daran de dimîne. Dema ku bi ser xwe ve tîn, di ber hev de diavêjin û dixwazin dilê yekûdu teng bikin. Her du jî dibêjin ku mirovên wî ji wî agahdar in û zêde nakêşe ku bên wî xelas bikin. Serxan dibêje ku mirovên min ê te di vê halê de bihêlin û sibe xebera serxweşiyê bişînin mala te. Çeçan dibêje bila mirovên te zûtir bên ez û hûn heta ku ji me hat em ê şer bikin. Lê her du jî dizanin ku mirovên wan zû bi zû nayên. Piştî demekê Çeçan bi destê xwe yê rastê çaya bi tarçîn û qerenfilî di ber xwe de derdixe û çend qurtan lê dide. Piştê dirêjî Serxan dike û dibêje kerem bike hinek ji vê çayê vexwe. Serxan îkrama wî napejirîne. Dibêje ku ji destê dijimê xwe ava heyatê jî be ew venaxwe. Xweşa Çeçan ji vê mêraniya Serxan tê. Wisa dixuye ku dilê wî bi vê bûyerê nerm dibe û ji Çeçan re dibêje ku wî biryara xwe guherandiye. Eger mirovên wî pêşî bên dê ew ji wan re bibêje ku bila pêşî Çeçan ji binê daran derxînin. Dibêje ku beredayî ye, ev sê babik in ku ew dijminên hev in. Ji Çeçan re dibêje ku were em bibin dost û hevalên hev. Çeçan jî gotinên Serxan di cih de dibîne û dibêje dema ku gel dît du kesên ji malbatên Bûbo û Siyehpûş bi dostanî bi ser hev de diçin û tîn dê heyirî bimînin. Piştî vê lihevkerinê her du jî bédeng dimînin. Di dilê xwe de xweziya xwe tînin ku pêşî mirovên wî bên da ku camêriya xwe nîşanî hevalê xwe bide.

Piştî demekê dema ku dengê bagerê nizm dibe, Çeçan ji Serxan re dibêje ku em gazî mirovên xwe bikin. Dibe ku dengê me biçê wan. Bi hev re dikin deng, lê ji bilî vegera dengê xwe tiştek seh nakin. Piştê dîsa bang dikin. Dûre pê dihesin ku va ye hin kes ber bi wan ve bi lez tîn. Kêfa wan gelekî tê û ji hevûdu re dibêjin yên tîn gelo zilamên kê ne. Zêde nakêşe ku ew fêhm bikin kesên ku tîn ne mirov in, belkî keriyêke gurên har in ku ber bi wan ve dibezin.

### 1.1. Berawirdkirina Çîrokan

Çîroka “The Interlopers”ê li ser temaya karên îlahî ava bûye. Her çend çîrokeke kurt be jî li ser bûyereke balkêş û vegotineke tîr ava bûye. Di kurteçîrokan de jixwe amanc ew e ku bi kurtî, lê bi saya honandineke bihêz hest û nêrîn bên vegotin. Beriya her tiştî em dibînin ku sernavê çîrokê ji naveroka çîrokê derketiye. Yanî sernavê çîrokê ji ruhê naveroka çîrokê derketiye. Bêjeya interlopers (kesê ku tevîlî karek an rewşeke kesan dibin) di çîrokê de cih digire (Saki, 1919: 44) û di honandina çîrokê de îşaretî du tiştan dike. Dema ku Ulrich û Georg li hev tîn, Georg di axaftina xwe de dibêje ku dema em aştîyê di navbera malbatên xwe de çêkin, tu kes tune ye ku bê tevîlî vî karê me bibe. Lêbelê dema ku çîrok bi temamî tê xwendin, tê dîtin ku peyva interlopersê bêhtir îşaretî guran dike. Lewra di çîrokê de tê gotin ku tu kesê ji derve, nikare tevîlî aşbûna wan bibe, lê beriya ku mirov ji aşbûna wan re atengî derxînin, gur tîn Ulrich û Georg dixwin. Bi vê yekê jî aştî di navbera malbatan de dîsa çênabe.

Munro (Saki) di honandina çîroka xwe de hinek bêje û gotinan referayê hinek rewş an jî tiştan dike. Me li jorê gotibû ku sernavê çîrokê interlopers, îşaretê bêjeya dawî ya çîrokê yanî guran dike. Di honandina naveroka çîrokê de jî îşaretên wiha cih digirin. Wekî mînak; di destpêka çîrokê de tê gotin ku her du kes jî ji bo dijminê xwe dua dikin ku bobelatek di ser wî de bê. Balkêş e ku piştî duaya wan pêk tê. Di ser wan de şaxên daran hildiweşin û kesê ku vî karî jî dike, hêzeke dermirovî (a deed of nature) ye. Yanî piştî muxatabê duayê wan û karê wî, xwe da der û lêkera hilweşînê (fall on) jî wekî îşareta rûxîna daran a li ser lehengan hatiye bikaranîn. Bi vî awayê honandina çîrokê, vegotina wê tîr dike. Em dibînin ku di çîroka “Bêbextî”yê de ev hevnişanerên wiha yên honandina çîrokê nakevin ber çavên me.

Di çîroka “The Interlopers”ê de em dibînin ku Saki veguherîna Ulrich gav bi gav bi me dide hîskirin heta ku Ulrich ji dijminatîya xwe diqere û dixwaze bi Georg re hevaltîyê bike. Nişana vê ya cara yekem; dema ku dar dikeve ser Ulrich ligel ku pir hêrs dikeve jî çî ye ku nemiriye, spasîyeke dîndarane (pious thank-offering) hîs dike. Cara duyem, dema ku meyê vedixwe, canê wî germ dibe û hestên xwedayî (Heaven-sent draught) hîs dike. Lewra dema ku berê xwe dide dijminê xwe, dilovaniyek diniquite dilê wî û meyê pêşkêşî Georg dike. Cara sêyem, Ulrich dibîne ku di hişê wî de hêdî hêdî nêrîneke nû zîl dide. Wextê ku Ulrich berê xwe dide Georg di nav êş û azaran de, ev nêrîna wî her car xurttir dibe. Ulrich di nav êş û azarên xwe de dibîne ku ew rîka wî ya berê ji holê radibe. Eger pênasîya sedemên guherîna bên kirin: Şikirdariya zindîmayîna, hîskirina hestên xwedayî û giriftarbûna heman sextîyê dikarin bên rêzkirin.

Di çîroka “Bêbextî”yê de em rastî sedemên cihê tîn ku dibin sedema veguherîna Çeçan. Ev yek jî ji ber temaya çîroka “Bêbextî”yê pêk tê ku li ser mêranî û mêrxasiyê

ava bûye. Lewra wextê ku Çeçan çay pêşkêşî Serxan dike, Serxan dibêje ji destê dijminê xwe ava heyatê jî be ez venaxwim. Ev yek xweşa Çeçan diçe. Difikire ku neyarê wî mirovekî qenc e, mêrxas e. Çeçan dibîne ku dijminê wî bêhtir diêşe, lê li ber xwe dide; lewra dilê Çeçên nerm dibe, li ber neyarê xwe dikeve. Di çîroka "The Interlopers"ê de jî nepejirandina meyê ji destê dijmin heye. Lêbelê Saki zêde li ser vê bûyerê nasekine. Saki her çend li ser hestên Georg hûr nebe jî wextê ku Ulrich ji wî daxwaza hevaltiyê dike, Georg di axaftina xwe de dibêje ku ev niv saet e, ez jî wekî berê nafikirim û hem te meya xwe pêşkêşî min kir. Lê di çîroka "Bêbextî"yê de ji bilî sedemek hebe, Serxan pêşniyara hevaltiya Çeçan dipejirîne.

Em dikarin di her du çîrokan de jî şopên çand û adetên nivîskaran bibînin. Di çîroka "The Interlopers"ê de di navbera malbatan de peywendiyên rikberî hene, lê malbatan ji hevdu kes nekuştine. Di çîroka "Bêbextî"yê de malbatan ji hevdu gelek xwîn rêtine. Em dizanin ku di nav Kurdan de gelek şerên xwînî hene li ser dewaya erdan. Georg ji Ulrich re dibêje ku tu yê roja Sylvesterê<sup>7</sup> bê mala min. Serxan ji Çeçan re dibêje ku em ê di eydan de bi hev re şahîne daynin. Serxan di axaftina xwe ya lihevhatinê de gotineke pêşiyar a "xwîn bi xwînê nayête şuştin" bi kar tîne. Di nav Kurdan de mêr û mêranî gelekî xwedan qîmet e. Dema ku Çeçan dibîne ku dijminê wî kesekî jêhatî ye, kêfa wî jê re tê û dixwaze bi vî mirovî re bibe dost. Wisa dixuye ku hilbijartina sernavê "Bêbextî"yê ji bo çîrokê jî bi vê hesta mêranîyê re têkildar e. Di çîroka "The Interlopers"ê de wextê ku Ulrich û Georg di bin şaxan de dimînin, behsa çekên wan nayê kirin. Jixwe ji bo honandina çîrokê jî ev hewce ye. Lewra bêjeya dawî ya çîroka "The Interlopers"ê gur in. Çîrok diqede û em nizanin gelo aqûbeta wan çi dibe. Gelo qet li ber xwe nadin an Ulrich bi destekî be jî bi çek li ber xwe dide.

Di honandina çîroka "Bêbextî"yê de bersiva van pirsan heye. Lewra dema ku Çeçan û Serxan di bin şaxan de dimînin tîfingên her duyan jî dişikên. Ji ber vê yekê dema ku gur bi ser wan de tîn, bê çek in û nikarin li ber xwe bidin. Lewra jî gur bi hêsanî wan dixwin. Ev yek jî bêbextiyeke mezin e. Em dibînin ku çîroka "Bêbextî"yê bi hatina mirovên Çeçan û Serxan li ser bermayiyên wan diqede. Di çîroka "The Interlopers"ê de ev sahne tune. Wisa dixuye ku di honandina çîroka "Bêbextî"yê de sernavê çîrokê, şikestina tîfingên û sahneya dawî bi xurtî îşaretên hev in û li ser hesta mêranîyê hatine honandin. Em di xebateke Celadet a adaptasyonî de jî rastî heman hestî tîn. Celadet di hejmara 31ê kovara *Hawarê* de helbesta Alfred de Vigny a "La Mort Du Loup" (Mirina Gurî) adapteyî Kurdî kiriye. Di vê helbestê de rewş berevajî ye: Mirov bêbextiyê li guran dikan. Bi komî û xefexef, bi çek û xencer

7 Cejneke dinî ya Mesîhiyan e. Salvegera mirina Papaz Sylvester e. Di 31ê Çileyê Pêşîn de tê pîroz kirin.

bi ser malbateke guran de digirin. Bavgur bi mêranî li ber xwe dide û ji canê xwe dibe. Celadet di adaptasyona xwe de ji bo vê êrîşa mirovan dibêje: “Rêçên gurên fêris /Gurên ko me dabû pey/ Û me dikir/ Bi bêbextî/ Di tariya şevê de/ Wek di-sekine tirsok/ Bi ser wan de bigirin/ Û wan/ Bidin ber tifing û xenceran.” (Bedirxan, 1998, 768). Ji ber ku em bi Fransî nizanin me li wergerên vê helbestê yên bi Îngilîzî û Tirkî nêrî. Di her duyan de jî bêbextiya bi vî awayî wiha aşkere nehatiye bilêvkirin û peyva bêbextiyê nehatiye bikaranîn. Xuyaye ku Celadet girîngî dide mêranî û berxwedanê. Lewra jî, kuştinên ne di cih de ne, wekî bêbextiyê dibîne.

Me li jorê behsa sedema yekem a guherîna Çeçan kiribû. Sedema duyem jî sedemeke çandî ye. Em dizanin ku di çanda Kurdî de dijminê mirov jî dema bê mala mirov, divê ew wekî mêvan bê qebûlkirin û zerar lê neyê kirin. Di çîroka “The Interlopers”ê de Ulrich ji Georg re dibêje ku eger mirovên min pêşî bîn, ez ê ewil te bidim xelaskirin wekî tu mêvanê min bî. Di çîroka “Bêbextî”yê de ev axaftin tam vegotîneke çanda Kurdî digire. Lewra Çeçan ji Serxan re dibêje ku madem tu di erdê min de yî, tu mivanê min î. Çawa ku diyar e, Serxan li ser erdê Çeçan e; lewma mêvan tê hesibandin, lewra divê wekî mêvan bê qebûlkirin.

Yek ji şopa çandî jî vexwarina mey û çayê ye. Di çîroka “The Interlopers”ê de Ulrich di ber xwe de meyê hêja derdixwe, vedixwe û pêşkêşî Georg dike. Di çîroka “Bêbextî”yê de dewsa meyê çayê bitarçîn û qerenfil digire. Sedem jî di dîne Îslamê de vexwarina meyê qedexe ye. Lêbelê di dîne Mesîhiyan de ev qedexe tune ye. Di çîroka “Bêbextî”yê de em dikarin hîlbijartina navên Kurdî yên Çeçan û Serxan, niqandina cihê mekanê wekî Sîpanê Xelatê jî wekî hêmanên çandî bibînin.

Em dibînin ku di honandina çîroka “Bêbextî”yê de kêşeya xwediyê erd heye. Gelo Çeçan an Serxan xwediyê erd e. Di rûpela 56an de tê gotin ku Çeçan dixwaze îşev li ser erdê xwe rastî Serxan bê. Jixwe di rûpela 55an de tê gotin ku Çeçan erd li ser xwe tapo kiriye. Di rûpela 57an de dema ku Çeçan û Serxan di bin şaxan de dimînin û dibezine hev, xwediyê erd tevlihev dibe. Serxan ji Çeçan re dibêje heye ku ez ketime çalekê. Lê ew çal di erdê min de ye. Çeçan li wî vedigerîne ku belê li ser erdekî welê ku tu dizê wî yî, te ew ji me dizî. Di çîroka “The Interlopers”ê de kêşeyê wiha tune ye. Erd di dema bapîrê Ulrich de li ser navê wî tê tapokirin. Di çîrokê de jî xwediyê erdê Ulrich e. Dema ku Ulrich û Georg di bin şaxan de dimînin û diavêjin ber hev jî ev yek naguhere. Xwediyê axê her Ulrich e.

### 3. ENCAM

Celadet Alî Bedirxan di kovarên *Hawar* û *Ronahiyê* de bi dehan navên mexlas bi kar anîne. Em dizanin Bişarê Segman yek ji van navan e ku ji bo wergerandina çîrokên dîrokî yên navdar û nivîsandina çîrokên modern hatiye bikaranîn. Bi vê xe-

bata berdest aşkere ye ku Celadet Alî Bedirxan ji bo xebatên xwe yê adaptasyonê jî ev mexlas bi kar aniye. Çîroka "Bêbextî"yê yek ji xebatên wî yê adaptasyonî ye ku ji çîroka "The Interlopers"ê ya Hector Hugh Munro hatiye adaptekirin. Her çend di adaptasyonê de guherînen naverokî û teşeyî hebin jî her du çîrok gelekî nêzikî hev in. Celadet Alî Bedirxan dema ku çîroka "The Interlopers"ê adapteyî Kurdî kiriye ji bo çîrokê sernavekî nû daniye, ji bo lehengan navên Kurdî hatine danîn û mekan jî wekî cihê Kurdnişîn hatiye adaptekirin. Di naveroka her du çîrokan de jî şopên çanda nivîskaran ên wekî xwarin û vexwarin, rojên pîroz, bawerî û nerîtên gelan xwe didin der.

Di çîroka "The Interlopers"ê de temaya karên îlahî hatiye niqandin, lêbelê di çîroka "Bêbextî"yê de li dewsa wê, temaya camêrî û mêrxasiyê derdikeve pêş. Li gorî vê guherîna temaya çîrokê, Celadet Alî Bedirxan hewce dîtiye ku sahneyeke dawî li çîroka "Bêbextî"yê zêde bike û sernavê çîrokê jî bike "Bêbextî". Di çîroka "The Interlopers"ê de ev sahneya dawî tune ye. Bi vê yekê, Sir Hector Munro (Saki) ji bo aqûbeta lehengan nediyariyek daniye, lê ev nediyarî bi sahneya dawî ya çîroka "Bêbextî"yê jî holê rabûye. Ev yek ji ber honandina naverokî ya her du çîrokan pêk hatiye û terciheke di cih de ye. Saki di çîroka "The Interlopers"ê de hin peyv îtalîk nivîsandine. Ev peyvên îtalîk di honandina çîrokê de xwedî erk in û bi awayekî veşartî îşaretê tiştêkî din dikin ku dê dû re biqewimin an jî di çîrokê de xuya bikin; bi gotineke din îşaretê karên îlahî dikin ku mirov nizane dê rewş û kar çawa biqedin. Ji ber ku temaya çîroka "Bêbextî"yê guheriye, Celadet Alî Bedirxan di çîroka xwe de tesarûfeke wiha bi kar neaniye.

#### 4. ÇAVKANÎ

- Aydogan, Î. S. (2014), *Guman 1*, Diyarbakir: Lîs.
- Aytaç, G. (2009), *Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi*, İstanbul: Say.
- Bedirxan, C. A. (2014), *Gazinda Xencera Min*, İstanbul: Avesta.
- Bedirxan, C. A. (2009), *Rojên Almanya (1922-1925)*, wer. Osman Özçelik, İstanbul: Avesta.
- Bedirxan, C. A. (1941), "Mirina Guri", *Hawar 2 Hejmar 24-57 (1934-1943)* (amd). F. Cewerî, 1998, Stockholm: Nûdem, 31, 4-5/768-169.
- Dilgeş, F. (2012), "Celadet Alî Bedirxan ve Hawar Ekolü", *Înatçı Bir Bahar Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat* (ed.) Vecdi Erbay, İstanbul: Ayrıntı.
- Doyle, S. A. C. (1892), *The Adventures of Sherlock Holmes*, <https://sherlock-holm.es/stories/pdf/a4/1-sided/adv.pdf>, 01.03.2017.
- Hansen, A. J. (2017), *Short Story*, <https://www.britannica.com/art/short-story>, 05.03.2017.
- Kefeli, E. (2000), *Karşılaştırmalı Edebiyat İncelemeleri*, İstanbul: Kitapevi.

Pirbal, F. (1994), “Bibliografyaya Çîrokên Hawar, Ronahî û Roja Nû`yê”, Nûdem, Hejmar 11, rr. 100-109.

Saki (1919). *The Toys of Peace and Other Papers*, Source: Project Gutenberg <http://www.gutenberg.org/ebooks/1477>.

Tekşan, M. (2011), *Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi*, İstanbul: Kriter.

URL-1, <http://tirsik.net/danegeh/kovar/ronahi-1940>, 04.03.2017.

URL2, [http://www.tdk.gov.tr/index.php?option=com\\_bts&arama=kelime&guid=TDK.GTS.5a4f98f92a7257.00342357](http://www.tdk.gov.tr/index.php?option=com_bts&arama=kelime&guid=TDK.GTS.5a4f98f92a7257.00342357), Türk Dil Kurumu, 10.03.2017.

URL-3, <https://tfarland.files.wordpress.com/2012/10/saki-bio-and-background.pdf>, Saki/ H.H. Munro 1870-1916, 10.03.2017.

### Extended Abstract

The first samples of Kurdish modern stories were written in the literary and political journals in the twentieth century. As a large number of Middle Eastern Literatures, Kurdish Literature has also benefited from the form of western literature to write these stories. Because the style of this genre appeared in Europe at first and then it dispersed over the Middle East. When Middle Eastern writers have encountered with this genre, they have tried to write the same genre in their own literature. We see that the Middle Eastern writers have made some translations and adaptations of western stories into their literature along with writing new samples of this genre.

Mir Celadet Ali Bedirkhan is one of the Kurdish story writers who published Kurdish modern stories in the journals of *Hawar* and *Ronahî*, translated and adapted stories from western languages for Kurdish language in the twentieth century. We know that Mir Celadet Ali Bedirkhan used so many pen names in the journals of *Hawar* and *Ronahî*. Bişarê Segman is one of these pen names that he used to write stories. Mir Celadet Ali Bedirkhan translated western stories into Kurdish and adapted some of them for Kurdish under that pen name. One of the stories that he adapted for Kurdish is “Bêbextî”, which was adapted from the Hector Hugh Munro’s story called “The Interlopers”. Hector Hugh Munro is known for his name Saki, which he adopted as a pen name. Hector Hugh Munro occupies an important place in the modern English literature by virtue of his short stories.

The story “Bêbextî” was published in the issue 27 of the journal, *Ronahî*. However, it is not demonstrated whether the story is an adaptation either at the beginning or end of the story. By this article close at hand, we have tried to prove that the story “Bêbextî” was adapted from the one called “The Interlopers” by means of a comparative reading. Adaptation is a kind of translation and in the course of that translation, addition or omission takes place, that is, the source text is modified on the basis of translator’s tradition. In this very article, we wrote the abstracts of the stories “Bêbextî” and “The Interlopers” to show the similarities of the two. It is clear from the abstracts that, although Mir Celadet Ali Bedirkhan preserved the general framework of the story, he modified it in terms of style and content,

and gave his story "Bêbextî" a new aura. We see that, in the story "Bêbextî", some of the elements have been omitted or modified, and some others have been added to it. Main elements of "Interlopers" such as hero and setting have been modified. The names of the heroes have been Kurdified (Ulrich Von Grandwitz and Georg Znaeym are protagonists of the story "The Interlopers"; Çeçanê Bûbo and Serxanê Siyehpûş, on the other hand, are those of the story "Bêbextî") and setting (In "The Interlopers" the setting for the episode is the woods of Karpathianan Mountains. In "Bêbextî" the setting for the episode is woods of the Mount Sîpan) is modified as a Kurd-situated region. Additionally, a new paragraph has been added to "Bêbextî", and in that paragraph there is information never narrated in "The Interlopers". In the content of "Bêbextî", the names of the religious days, and foods and drinks have been modified on the basis of Kurdish culture.

In the fiction of "The Interlopers", the writer has tried to propose the theme of divine power. For that reason, he has written some of the words and references in italic type to illustrate the divine laws which are beyond the slaves' power. The writer has approved of the title "Interlopers" for that theme of his. In the fiction of "Bêbextî" we realize that the theme is modified. In the story, the writer has sought to propose the theme of courage and bravery, and make the readers understand the importance of the theme. At the end of the story "Interlopers", we don't know what happens to the heroes; in the story "Bêbextî", however, wolves have eaten the heroes in a cowardly way. Depending on that modification, the title of the story has been adapted as "Bêbextî". From these close analyses, it is apparent that the story "Bêbextî" has been adapted from the one "Interlopers".





# WERGEREK / A TRANSLATION



# Lêkolînên Kurdolojiyê li Îranê Destpêkek ji bo Mijar û Xwendinan\*

Ehmed MIHEMEDPÛR\*\* & Mehdî RIZAÎ\*\*\*

Ji Farisî: Ferhat YILMAZ\*\*\*\*

## 1. DESTPÊK

Pirsgirêk û mijarên siyasî û dîrokî derbarê “Kurdan”<sup>1</sup> de li Rojhilata Navîn di çaryeka sedsala borî de bi awayekî giştî û mexsûsen di van salên dawî de bûye xwedî cihekî taybet. Wî cihî çî ji hêla jeopolîtîk û çî ji hêla zanistî-zanîngehî be, qadek ji bo derketina wêjeya teorîk vekiriye û lêkolînên berfireh ên derbarê Kurdan

\* Ev gotar cara ewil di vir de bi zimanê Farisî belav bûye: Îran Namig (نامه ایران), Sal: 1, Şomare: 4, Zimistan 1395/2017, Sahife: 172-208.

\*\* Beşa Civaknasiyê ya Zanîngeha Vanderbiltê, Amerîka. Ehmed Mihemedpûr, civaknas û etnografê Kurdê Îranê ye ku di qadên civaknasiya çandî û siyasî de li Kurdistanê Îranê û Îraqê û di heman demê de di metodolojiyên zanistên civakî de pispor e. Wî lêkolînên etnografîk ên berfireh li Kurdistanê Îranê, wekî mînak; li Êrman, Serdest, Mehabad û Banê bi encam daye. Beşên ku di bin qada xebatên wî de cih digirin: Felsefeya Zanista Civakî, Xwendinên Lêkolînên Civakî û Guherînên Civakî li Kurdistanê. Bi salan li Zanîngeha Ebu Elî Sîna ya li Hemedanê û li Zanîngeha Selahedîn a li Herêma Kurdistanê ya Îraqê ders dane û niha jî wekî doçentê alîkar ê lêkolînên civakî li Zanîngeha Vanderbiltê ya li Amerîkayê dixebite. Em dikarin berhemên wî yê wêkî; Metodoloji di Zanistên Civakî de (sê cild in), Ji Kevneşopiyê ber bi Nûsaziye, Tecrûbeyê Nûsaziye, Siyasetên Kevneşopiyê (li ber çapê ye), Dîrok bi Riwayeta Felsefeyê: Felsefe û Kevneşopî di Zanista Dîrokê de (du cild in û li ber çapê ye) bi nav binin.

Ahmad Mohammadpur:

ahmad.mohammadpur@vanderbilt.edu

\*\*\* Doçentê Alîkar ê Beşa Zanistên Civakî, Zanîngeha Peyamnûr. Mehdî Rizaî, civaknas û etnografê Kurdê Îranê ye û di beşa zanistên civakî ya Zanîngeha Peyamnûrê de doçentê alîkar e. Ligel Ehmed Mihemedpûr li cih û warên curbicur ên Kurdistanê Îranê, gelek xebatên qadî kirine. Qada lêkolînên wî ji van pêk tê: Civaknasiya mirovnasiyê û guherînên civakî û civatî li Kurdistanê.

Mehdî Rezaei:rezaeimehdil@gmail.com

\*\*\*\*Xwendekarê Doktorayê, Zanîngeha Dicleyê, Beşa Çand û Zimanê Kurdî.

1- Dema ku berhemeke Kurdî an jî bi Kurdî hatiye wergerandin û hatiye nîşandan, ji bo şopandina awayê di berhemê de û ji bo parastina rastnivîsê کرد bi awayê کرد hatiye nivîsandin.

de kom kiriye. Ligel vê rewşê, her çend telaşên curbicur ji bo têgihîştina civak û çanda Kurdistanê hatibin kirin jî riwayetên cihê û hin caran rewşên nakok, di çanda Kurdan de rê daye ku ji hêla mijarê ve bi taybetî ji hêla zanistî ve qada gengeşiyê bilindtir bibe ku vê yekê bixwe alozî û nediyariyên derbarê çand û civaka Kurdan de zêdetir kiriye. Bi van lêkolînan, bergeha mijarên dîrok û çanda Kurdistanê bi taybetî yên derbarê pîrsgirêkên siyasî û nijadî de kêmkirî bûne. Vê rewşê, ne tenê girîngiya lêkolînên çandî û civakî ber bi goşeyekê ve avêtîye, belkî di piraniya xebatan de lêkolînên zanistî jî bi teorî û metodolojiyên nediyar re rû bi rû hiştiye.

Gotara berdest dûpat dike ku çanda Kurdan, wekî gelekî çandên din, digel wekhevîyên çandî û dîrokî yên heyî, xwediyê curbicurî û cihêtiyên berbiçav e jî. Ev cihêtiya ku tê behskirin, ji aliyekî ve ji ber guherînên civakî yên gelê Kurdistanê bixwe ye, ji aliyekî din ve jî ji ber ku Kurdistan, dabeşî çar parçeyan bûye, di her parçeyê de di navbera Kurd û gelên din de têkiliyên dîrokî û çandî pêk hatine. Mahiyet û dirûvê vê têkiliyê her çî be, em nikarin bandora wê li ser siyaset û çanda Kurdan piştguh bikin ku niha di navbera Kurdan de heye. Ji ber vê yekê, divê vekolînên pîrsgirêkên Kurdan, ne tenê di cihêtiyên çandî yên navbera wan de bê dîtî, belkî divê ev pîrsgirêkên heyî di nav danûstandinên çandî yên Kurdan ên bi gelên din re jî bê vekolîn. Lêkolînên nû, van her du faktorên di nav civaka Kurdistanê de û encamên danûstandinên çandî yên gelê Kurd ên ligel dewletên herêmê û çandên din, li ber çavan digirin.

Armanca vê gotarê ew e ku bi çend xalan li ser Kurdistana Îranê hûr bibe. Pêşîn, agahiyeke berfireh derbarê Kurdolojiya li Îranê ji aliyê mijar, çarçove û beşdarvanên nivîskarên kurdîaxêv û kurdîneaxêv de bide.<sup>1</sup> Duyem, bi lêkolîna çavkaniyan û bi nivîskarên ku di vê qadê de xebitîne, cihêtiya mijaran, meylên teorîk, xwendinên metodolojîk û heta radeyekê gengeşiyên heyî yên di Kurdolojiya Îranê de zelaltir dike. Sêyem, gotara berdest dikare bi sinor jî be, çavkaniyên lêkolînên Kurdolojiya Îranê ji bo lêkolîneran û peywendîdaran radest bike. Çarem û dawî, ji ber ku Îranolojî bêtir lêkolînên gel û herêmên Îranê nikare bê dîtî, gotara berdest ji bo ku lêkolînên Îranolojiyê dewlemendtir bibe, peywira pareke biçûk, hildaye ser milên xwe.

Di vê gotarê de tê destnîşankirin ku her çend lêkolînên Kurdolojiyê, mexsûlên hewlên lêkolîner û nivîskarên curbicur in ku her yekî bi şêweyekê ji bo fêhma civaka Kurd û çanda Kurdan xebat kirine, lê ev hewl di heman demê de bûne sedem ku di Kurdolojiyê de riwayet zêdetir bibin û dirûveke taybet derkeve holê. Ji ber vê

1 Angaştî nivîskarên vê gotarê ne ew e ku hemû çavkaniyên lêkolînên Kurdolojiyê dîtine yan jî li ser wan xebitîne. Dibe ku lêkolînên pîr hêja hebin ku nivîskarên vê gotarê ji ber sedemên curbicur xwe negihandibin wan û jî ber vê yekê jî di çavkaniya vê gotarê de navê wan nehatibe nivîsandin.

yekê, em dikarin ji her yek ji van lêkolînan an jî nivîskaran, dîmeneke cuda derbarê Kurd an Kurdistanê de bi dest bixin. Bi gotineke din, lêkolînên Kurdolojiyê ne tenê ji ber rewşa civakî û siyasî ya heyî, belkî ji ber van hewlên curbicur û carinan jî jihevçuda, aloztir bûne. Kurd û Kurdistan di her yek ji van gengeşî û nivîsan de bi dirûveke cihê û newekhev derdikeve pêşberî me. Her yek ji wan, li gorî lêkolîna xwe li ser hêmanekê kûr dibe û hêmaneke din nediyar dihêle. Ji ber vê yekê, dirûvê dîmena sûtjeya ku li ser tê axaftin, di vê gotarê de -Kurd û Kurdistan e- ku wisa hatiye diyarkirin. Li gorî van agahiyên, ev pirsên han hewceyê gengeşeyê ne: Lêkolînên Kurdolojiyê li Îranê di çi çarçoveyê de hatine gengeşekirin? Gengeşiyên serdest û gengeşiyên dijber di vê qadê de çi ne? Çarçove û sînoren dawî yêncografyaya fizîkî û fikirî di qada Kurdolojiyê de li Îranê li ku ne? Lêkolînên Kurdolojiyê li Îranê li ser kîjan qadan û bûyeran hûr dibin? Di navbera xwe de Kurd li Îranê li ser çi gengeşiyên an jî gengeşiyên derbarê lêkolînên Kurdolojiyê de bêhtir gotûbêj dikin? Wekî dawî, kîjan bûyerên civakî û siyasî di teşedayîn û domandina lêkolînên Kurdolojiyê de li Îranê xwedî bandor bûne? Teqez e ku bersivdayîna van hemû pirsan di vê gotarê de ne pêkan e, belkî armanca eslî ya vê gotarê destpêkek bo lêkolînan e û heta radeyek jî nişandayîna dîmena giştî ya Kurdolojiya li Îranê ye. Nivîskarên vê gotarê di vê baweriyê de ne ku ev gotar lêkolîneke vekolana gengeşiyekê, gengeşîkirineke siyasî an jî rexne û lêkolîna berhemeke derbarê Kurdolojiyê ya çapbûyî de nîne, belkî beriya her tiştî nişandayîna dîmena giştî ya Kurdolojiya li Îranê ye ku di wextê pêwîst de an ji bo mijara eslî terxankirina cihekî berfireh e. Her çend çarçoveya vê gotarê ev jî be, hin caran bi baldarî ji vê çarçoveyê hatiye dûrketin û gengeşiyên serdest û encamên wan hatine behskirin.<sup>2</sup>

Dema lêkolîna vê gotarê ji sedsala nozdehan dest pê dibe û heya roja me tê. Di vê gotarê de qala nivîskarên Kurd û ne Kurd ên li Îranê û derveyê Îranê hatiye kirin û digel dayîna berhemên wan di jêrenotan de û bêtir ku fikra wan bê veşartin hatine nasandin. Bi heman awayî, hewceyî bi destpêkeke berheman bûye ku ji pênûsên nivîskarên Rojavayî derketine û li Îranê yan jî derveyê Îranê bi zimanê Kurdî yan bi zimanê Farisî hatine wergerandin. Heta carinan hin lêkolîn hatine destnîşankirin ku nivîskarên Kurd an nivîskarên Îranî yênc ne Kurd bi zimanê Îngilîzî nivîsandine ku ev nivîsên wan bi Kurdî yan bi Farisî hatine wergerandin.<sup>3</sup> Çavkanîyên ku

2 Lêkolînên Kurdolojiyê yênc di qada vegêrannasiyê de, bi taybetî lêkolînên nivîskarên Rojavayî bi sûretê teza doktorayê li Zanîngeha Tehranê hatine encamdayîn. Binêrin bi Celîl Kerîmî “Teoriya Postkolonyalî û Kurdoloji” (Teza doktorayê ya Civaknasiya Teorîk û Çandî ya Zanîngeha Tehranê, 1389).

Jalil Karimi, Ahmad Mohammadpur and Kerim Mahmoodi, “Dismantling Kurdish Texts: An Orientalist Approach,” *Contemporary Review of the Middle East*, 2:3 (September 2015), 220-237.

3 Çavkanîyên ku bi zimanê Kurdî hatine nivîsandin, bêhtir ji bo xwendevanên Kurd in, lêbelê

di vê gotarê de hatine bikaranîn, xwedî skalayeke berfireh e. Di vê gotarê de ji lêkolînên çapbûyî wekî; pirtûk, lêkolînên ji aliyê hin saziyên dewletî ve hatine kirin, lêkolînên zanîngehan ên wekî lêkolînên pisporî an tezên mastir û doktorayê, gotarên di kovarên herêmî û herêma Kurdistanê Îranê de diweşin ku derbarê Kurd û Kurdistanê de ne. Wekî dawî lêkolînên ku nivîskarên Îranî ji ber meraq û meylên xwe yê fikrî bi awayekî takekesî encam dane. Ligel van, divê ev xala han a pir girîng jî bê destnîşankirin ku ev xebata berdest tenê li ser nivîskarên binavûdeng ranewestiyaye, belkî wekî xebatek e ku li ser kesên kêmnasyar disekine; bi taybetî li ser nîfşên ciwan ên lêkolînerên Kurdolojiyê ku ji Îranê ne. Nivîskarên gotarê, di vê baweriyê de ne ku divê girîngî û peywendiya teorîk û zanistî ya kûr ji bo lêkolînên bi vî rengî, di qada çandî û civakî ya Kurdistanê Îranê de, neyên piştguhkirin. Herwiha, nêrîneke giştî ji bo lêkolînên Kurdolojiyê li ser esasê Kurdolojiya Îranê hatiye terxankirin.

## 2. QADA GIŞTÎ YA LÊKOLÎNÊN KURDOLOJIYÊ

Li welatên cihê û di zimanên curbicur de derbarê Kurd û Kurdistanê de cure cure lêkolîn hene. Em dikarin bi çend hêlan ve bala xwe bidin vê curbicuriyê. Pêşî, ji aliyê erdnîgariyê ve bi mebesta lêkolîna Kurdistanê (welatên Turkiye, Îran, Suriye û Iraqê); duyem, ji aliyê mijarê ve lêkolînên li ser Kurdistanê (siyasî, aborî, civakî, çandî); û sêyem, ji aliyê dîmena ontolojîk ve lêkolînên Kurdî yanî çi kesî/ê, derbarê çi cihî / çi tiştî / çi kesî/ê û çawa nivîsiye? Bi gotîneke din, nivîskarên ji bilî Kurdên Îranê (Kurd, Fars, Tirk, Ereb û ên din) yan Rojavayî çi tiştî derbarê Kurdan de û bi çi meylê dinivîsin.

Lêkolînên hêjayî behskirinê yê derbarê Kurdan de ku ji hêla nivîskar û lêkolînerên kurdîxêv û kurdîneaxêv ve –wekî mînak lêkolînerên Rojavayî, Tirk, Faris û Ereb- bi awayekî giştî û lêkolînên Kurdên li welatên Îran, Turkiye, Suriye û Iraqê niştecîh bi taybetî hatine şayesandin. Girîngtirîn berhemeke destpêkê ya ji bo vê qadê ji aliyê Bruinessen ve hatiye amadekirin.<sup>4</sup> Wî di gotara bi navê “Lêkolînên Kurdî li Rojavayê Ewropayê û Navenda Ewropayê” de bi berfirehî qala xebatên lêkolîner, diplomat û saziyên lêkolînê yê Ewropayî kirine ku derbarê Kurdan de xebitîne. Li gorî wî, gelekî lêkolînên derbarê Kurdan de ji hêla diplomat

---

çavkanîyên Farisî û Îngilîzî yan çavkanîyên wergerandî ji bo kurdîxêvan û bilî kurdîxêvan in. Ji ber vê yekê, çavkanîyên ku bi Farisî hatine wergerandin, nehatine jibîrkin û di vê gotarê de ev çavkanî, wekî berhemên qada Kurdolojiya Îranê hatine hesibandin.

4 Martin van Bruinessen, “Kurdish Studies in Western and Central Europa”, *Wiener Jahrbuch fur Kurdische Studien*, 2 (2014), 17-18.

û sefirên dewletên Ewropa û Rûsyayê ve hatine nivîsîn. Wekî; Nikitine,<sup>5</sup> Edmonds,<sup>6</sup> Minorsky,<sup>7</sup> Rich,<sup>8</sup> Noel<sup>9</sup>. Van kesan lêkolînên li ser cihên têkel ên Kurdistanê kirine.<sup>10</sup> Lêbelê, beriya Bruinessen, çend nivîskarên Kurd ên li Ewropayê, bi navê destpêkek bo Kurdolojiyê çap kiribûn ku cereyanên lêkolînên Kurdolojiyê di wê de derbiribûn.<sup>11</sup> Bi vî awayî, hin lêkolînên din ên Kurdolojiyê jî encama lêkolînên qadî yan ji bilî qadî ne ku ji aliyê lêkolînerên zanîngehî ve hatine encamdayîn. Wekî;

- 
- 5 Basile P. Nikitine and Ely B. Soane, "The Tale of Suto and Tato: Kurdish Text with Translation and Notes," *Bulletin of the School of Oriental Studies*, 3:1 (1923), 69-106; Basile Basile P. Nikitine, "Ou en est la Kurdologie?" *Annali del Reale Istituto Orientale di Napoli*, 9 (1936), 1 and 121-125; Basile P. Nikitine, *Les Kurdes, Etude Sociologique et Historique* (Paris: Klincksieck, 1956).
- Ev pirtûk bi Farisî hatiye wergerandin: Basil Nikitine, *Kurd ve Kurdistan: Mutalîyê Camîşinasî ve Tarîxî, Tercumeyê Mihemed Qazî* (Tehran: Nîlûfer, 1366).
- 6 C. J. Edmonds, "Suggestions for the use of Latin Character in the Writing of Kurdish", *Journal of the Royal Asiatic Society* (1931), 27- 46; C. J. Edmonds, *Kurds, Turks and Arabs: Politics, Travel and Research in North-Eastern Iraq, 1919-1925* (London: Oxford University Press, 1957).
- Ev pirtûk bi Farisî hatiye wergerandin: C.J. Edmonds, *Kurdha, Turkha, Erebha, Tercumeyê Îbrahîm Yûnisî* (Tehran: Rûzbehan, 1382).
- C. J. Edmonds, *A pilgrimage to Lalish* (London: The Royal Asiatic Society of Great Britain and Ireland, 1967); C. J. Edmonds, "The Beliefs and Practices of the Ahl-i Haqq of Iraq," *Iran* (1969), 89-106; C. J. Edmonds, "Kurdish Nationalism," *Journal of Contemporary History*, 6 (1971), 87-107.
- 7 Veladimir Minorsky, "Kurdistan," in *Encyclopedia of Islam* (Leiden: Brill, 1927); Veladimir Minorsky, "Kurds," in *Encyclopedia of Islam* (Leiden: Brill, 1927).
- 8 Claudius James Rich, *Residence in Kurdistan* (London: James Duncan and Paternoster Row, (1978).
- Ev pirtûk bi zimanê Kurdî hatiye wergerandin: Claudius James Rich, *Geştî Rich Bo Kurdistan 1820*, Wergera Mihemed Heme Baqî (Seqiz: Mihemedî, 1371).
- 9 Edward William Charles Noel, *Diary of Major Noel in Special Duty in Kurdistan* (n.p., n.d.).
- Ev pirtûk bi zimanê Kurdî hatiye wergerandin: Mihîcêr Noel, *Yaddaştekanî Meycêr Noel le Kurdistan*, Wergêran Hiseyn Caf, Hisên Osman Nêrgise Carî (Bîca: Bîna, Bîta)
- 10 Hewceyê gotinê ye li Îranê hin lêkolîn hene ku ji aliyê kesine ne Kurd ve hatine nivîsandin ku di pozîsyonên rêvebirî, sergerîndeyî an nizamî de cih girtine.
- 11 Ev pirtûk bi zimanê Farisî hatiye wergerandin: Qanadê Kurdo, Mesûd Mihemed, Cemal Nebez ve Ebdurehman Merûf, *Muqedimeyî Ber Kurdşinasî Der Orûpa*, Tercumeyê Mihemed Reûf Yûsifînijad (Tehran: Atîyye, 1379)

Bruinessen,<sup>12</sup> Gunter,<sup>13</sup> Blau,<sup>14</sup> Mann,<sup>15</sup> Randal,<sup>16</sup> Barth,<sup>17</sup> Eagleton,<sup>18</sup>

- 
- 12 Martin van Bruinessen, *Agha, Shaikh and State: The Social and Political Structures of Kurdi - tan* (London: Zed Books, 1992).  
Ev bi zimanê Farişî û Kurdî hatiye wergerandin: Martin van Bruinessen, *Camieşinasîyê Merdomê Kurd, Axa, Şeyx, Devlet*, Tercumeyê Êbrahîm Yûnisî (Tehran: Neşrê Panîz, 1373)  
Martin van Bruinessen, "Nationalismus und Religiöser Konflikt: Der Kurdische Widerstand im Iran," in *Geschichte und Politik Religiöser Bewegungen im Iran* [Mardom Nameh, Jahrbuch zur Geschichte und Gesellschaft des Mittleren Orients], ed. Kurt Gruessing (Frankfurt: Syndikat, 1981), 372-409; Martin van Bruinessen and Hendrik Boeschoten (ed.), *Evliya Çelebi in Diyarbekir: The Relevant Section of the Seyahatname Edited with Translation, Commentary and Introduction* (Leiden: Brill, 1988); Martin van Bruinessen, "Mullas, Sufis and Heretics: The Role of Religion in Kurdish Society," in *Collected articles* (Istanbul: The Isis Press 2000); Martin van Bruinessen, "Kurdish ethno-nationalism versus nation-building states," in *Collected Articles* (Istanbul: The ISIS Press, 2000).
- 13 Michael M. Gunter, "The Contemporary Roots of Kurdish Nationalism in Iraq," *Kufa Review*, 2:1 (2013); Michael M. Gunter, "Unrecognized De Facto States in World Politics: The Kurds," *Journal of World Affairs* (2014); Michael M. Gunter, *The Kurds Ascending* (New York: Palgrave Macmillan, 2008).
- 14 Joyce Blau, *Le Problème Kurde: Essai Sociologique et Historique* (Bruxelles: Centre Pour l'Etude des Problemes du Monde Musulman Contemporain, 1963).  
Ev pirtûk bi Farişî hatiye wergerandin: Joyce Blau, *Meseleyê Kurd: Beresîyê Tarîxî ve Camieşinasî*, Tercumeyê Pervîz Emînî (Senendec: Merkezê Kurdistanşinasî, 1379)  
Joyce Blau and Veysel Barak, *Manuel de Kurde: Kurmanji* (Paris: L'Harmattan, 1999); Joyce Blau, *Méthode de Kurde: Sorani* (Paris: L'Harmattan, 2000); Joyce Blau, "Kurdish Language ii. History of Kurdish Studies," in *Encyclopedia Iranica* (2009).
- 15 Oskar Mann, *Die Mundart der Mukri-Kurden, Teil I: Grammatische Skizze, Textein Phonetischer und Persischer Umschrift; Teil II: Deutsche Übersetzung der Texte miteiner Einleitung über Inhalt und Form der Ostkurdischen Volkslyrik* [=Kurdish-Persische Forschungen, Abt. IV, Bd. 3] (Berlin: Reimer, 1906-1909); Oskar Mann and Karl Hadank, *Mundarten der Gûrân, Besonders das Kändûlâi, Auramânî und Bâdschâlânî* (Berlin: De Gruyter & Co, 1930).
- 16 Jonathan Randal, *After Such Knowledge, What Forgiveness? My Encounters with Kurdistan* (New York: Farrar, Straus and Giroux, 1997).  
Ev pirtûk bi Farişî hatiye wergerandin: Jonathan Randal, *Ba Ên Rûsvayî Çi Bexşayîşî?*, Tercumeyê İbrahîm Yûnisî (Tehran: Panîz, 1379)
- 17 Fredrik Barth, *Principles of Social Organization in Southern Kurdistan* (Oslo: Universitets Etnografiske Museum, 1953); Fredrik Barth, "Father's Brother's Daughter Marriage in Kurdistan," *Southwestern Journal of Anthropology*, 10:2 (1954), 164-171.
- 18 William Eagleton, *The Kurdish Republic of 1946* (London: Oxford University Press, 1963).



Chailand,<sup>19</sup> Kutchera,<sup>20</sup> King,<sup>21</sup> Natali<sup>22</sup> û Mc Dowall<sup>23</sup>. Berhemên van kesên navborî bi piranî wekî pirtûk weşiyane. Digel van, hejmareke berheman jî bi pêûsên nivîskarên Kurd derketine ku bi gelemperî ji Kurdên Îranê û Kurdên welatên derdor û yên ku li Rojavayê niştecih in. Wekî mînak; Bedlîsî,<sup>24</sup> Qasimlo,<sup>25</sup> Valî,<sup>26</sup> Yasimî,<sup>27</sup>

- 
- 19 Gerard Chailand (ed.), *A People Without a Country: The Kurds and Kurdistan* (London: Zed Books, 1980); Gerard Chailand (ed.), *Kurdistan und die Kurden* (Gottingen: Gesellschaft für Bedrohte Völker, 1984).
- 20 Chris Kutchera, *Le Défi Kurde ou le Rêve fou de l'Indépendance* (Paris: Flammarion, 1997). Ev pirtûk li Kurdîstana Îraqê bi zimanê Kurdî hatiye wergerandin. Chris Kutchera, *The Kurdish Challenge* (Paris: Bayard, 1997); Chris Kutchera, *Le Mouvement National Kurde* (Paris: Flammarion, 1979). Ev pirtûk bi Farsiî hatiye wergerandin: Chris Kutchera, *Conbîşê Milîyê Kord*, Tercumeyê Îbrahîm Yûnis (Tehran: Neşrê Panîz, 1370).
- 21 Diane King, *Kurdistan on the Global Stage: Kinship, Land, and Community in Iraq* (New Brunswick: Rutgers University Press, 2013).
- 22 Dennis Natali, *The Kurdish Quasi-State: Development and Dependency in Post-Gulf War Iraq* (New York: Syracuse University Press, 2010); Dennis Natali, *The Kurds And the State: Evolving National Identity in Iraq, Turkey, And Iran* (New York: Syracuse University Press, 2005).
- 23 David McDowall, *Kurdish Modern History* (London: I. B. Tauris, 2001). Ev pirtûk bi Farsiî hatiye wergerandin: David McDowall, *Tarîx-î Muasirê Kurd*, Tercumeyê Îbrahîm Yûnisî, (Tehran: Neşrê Payîz, 1383)
- 24 Pirtûka wî ku bi orjînal bi zimanê Farsiî di dewra Safevîyan de hatiye nivîsandin, cara yekem di salên 1970yî de bo zimanê Kurdî hate wergerandin û li Bexdayê hate çapkirin. Yekemîn çapa wî ya li Îranê di sala 1360an de çap bûye: Şerefxanê Bedlîsî, *Şerefname*, Wergêr Ebdulrehman Şerefkendî (Hejar), (Tehran: Bîna, 1360).
- 25 Abdul Rahman Ghassemlou, *The Kurds and Kurdistan* (Prague: Czechoslovak Academy of Sciences and London: Collet's, 1965). Ev pirtûk bi zimanê Kurdî hatiye wergerandin: Ebdulrehman Qasimlo, *Kurdistan û Kurd*, Wergêr Ebdulah Hesenazade (Silêmanî: Bîna, 2014)
- 26 Abbas Vali (ed.), *Essays on the Origins of Kurdish Nationalism* (Costa Mesa, CA: Mazda Publishers, 2003); Abbas Vali, *Kurds and the State in Iran: The Making of Kurdish Identity* (London: I.B.Tauris, 2011). Wergêrê beşa encamê ya vê pirtûkê di hejmarên 75-76an ên kovara *Zirêbarê* de bi zimanê Farsiî hatiye weşandin. Abbas Vali, *Modernity and the Stateless: The Kurdish Question in Iran* (London: I.B.Tauris, 2015); Abbas Vali, "The Kurds and Their 'Others': Fragmented Identity and Fragmented Politics," *Comparative Studies of South Asia, Africa and the Middle East*, 17:2 (1998). Ev gotar di sala 1382an de di hejmara sêyan ya kovara *Rave* (1381) de bi zimanê Farsiî hatiye wergerandin.
- 27 Reşîd Yasimî, *Kurd ve Peyvestegîyê Nijadê An* (Tehran: Naşirê Çap, 1325).

Nûrî Paşa,<sup>28</sup> Tevhîdî,<sup>29</sup> Bozarslan,<sup>30</sup> Medenî,<sup>31</sup> Serdeştî,<sup>32</sup> Mihemedpûr,<sup>33</sup> Ûrya Qani,<sup>34</sup>

- 28 Îhsan Nûrî Paşa, *Tarîx ve Rîşeyê Nijadê Kurd* (Tehran: Encûmenê Îranşinasî Kurd Madî, 1333).
- 29 Kelîmullah Tevhîdî, *Hereketê Tarîxîyê Kurdha bi Xorosan* (Meşhed: Intîşaratê Tûs, 1366). Ev berhem bi awayekî şeş cildî di navbera salên 1366 û 1378an de bi destên çend weşangeran hatiye wergerandin.
- 30 Hamit Bozarslan, "Entre la 'Umma et le Revolution: l' Islam Kurde au Tournant du Siecle," MERA occasional paper, *Amsterdam: Middle East Research Associates* (1992); Hamit Bozarslan, "Remarques sur l'Histoire des Relations Kurdo-Armeniennes," *Journal of Kurdish Studies*, 1 (1995), 55-76; Hamit Bozarslan, *La Question Kurde: États et Minorités au Moyen-Orient* (Paris: Presses de Sciences Po., 1997); Hamit Bozarslan, *Conflit Kurde: le Brasier Oublié du Moyen-Orient* (Paris: Collection Mondes et Nations /Autrement, 2009); Hamit Bozarslan, "Un recit de vie non Autorise," in *Joyce Blau: L'Éternelle Chez les Kurdes*, eds. Hamit Bozarslan and Clemence Scalbert Yucel (Paris: Institut Kurde de Paris, 2013), 13-24.
- 31 Seîd Medenî, *Kurd û Stratejîyê Dewletan* (Bîca: Bîna, 1370)
- 32 Yasîn Serdeştî, *Kurdekanî Îran* (Silêmanî: Serdem, 2003)
- 33 Ehmed Mihemedpûr, *Tecrûbeyê Novsazî: Pêjohîşî Der Tovsee ve Tegyîratê Ictimaî Der Mînteqeyê Hewremanê Kurdistan* (Tehran: Camîşinasan, 1392); Ehmed Mihemedpûr, *Ez Sûnnet be Novsazî: Mûtalîyê Etnografîkê Şehrê Serdeşt Der Kurdistanê Îran* (Tehran: Camîşinasan: 1392). Ehmed Mihemedpûr ve Tavge Huseynpûr, "Cihanîşoden ve Baznûmayîyê Hûvîyetê Ferhengî Der Mûzîqîyê Kurdî (Lêkolîna Dîyardeyên Pêkanîna Muzîka Xwendekarên Kurdê Zanîngeha Gilanê)," *lêkolînên mirovnasîyê, heyama 2yê, hejmara 2yê* (1391), 89-116; Ehmed Mihemed, Celîl Kerîmî ve Neşmîl Merûfpûr, "Mûtalîyê Tefsîrîyê Baznûmayîyê Zen Der Zerbulmeselhayê Kurdî (Mijara lêkolînê: Biwêjên Soranî yên Herêma Mûkrîyanê)," *Zen Der Ferheng ve Honer (lêkolîna jinan), sala çaran, hejmara sêyan* (1391), 45.
- Ahmad Mohammadpur, "Disembedding the Traditional Family: Grounded Theory and the Study of Family Change among Mangor and Gaverk Tribes of Iranian Kurdistan," *Journal of Comparative Family Studies*, 44:1 (2012), 177-198; Ahmad Mohammadpur, "The Rise and Fall of Political Movements in the Late 19th Century and First Half of 20th Century Kurdistan (An Organizational Analysis)," *Canadian Social Science*, 11:1 (2015); Ahmad Mohammadpur, "Lifestyle and Identity in Contemporary Iranian Kurdistan (A Grounded Study of Marivan City)," *Quality & Quantity: International Journal of Methodology* (2016), 1907-1928; Ahmad Mohammadpur, Nariman Mohammadi and Norbet Ross, "The Fiction of Nationalism: Newroz TV Representations of Kurdish Nationalism," *European Journal of Cultural Studies* (2016); Ahmad Mohammadpur and Mehdi Rezaei, "Promoting Survival: A Grounded Theory Study of Consequences of Modern Health Practices in Ouramanat Region of Iranian Kurdistan," *International Journal of Qualitative Studies on Health and Well-being*, 5 (2010), 2.
- 34 Merîvan Ûrya Qani, *Nasyonalîsm ve Sefer* (Silêmanî: Rehend, 2005).

Şeyhûlîslamî,<sup>35</sup> Gadani,<sup>36</sup> Huseynpûr,<sup>37</sup> Yildiz,<sup>38</sup> Îzadî,<sup>39</sup> Baban,<sup>40</sup> Caban,<sup>41</sup> Heyatî,<sup>42</sup>

- 
- 35 Jaffer Sheyholislami, “Kurdish in Iran: A Case of Restricted and Controlled Tolerance,” *I - International Journal of the Sociology of language* (2012), 217; Jaffer Sheyholislami, “It is the Hardest to Keep: Kurdish as a Heritage Language in the United States,” *International Journal of the Sociology of Language*, 237, (2016), 75–98; Jaffer Sheyholislami, “Language Policy and Planning: Identity and Rights in Iraqi Kurdistan,” in *Minority Language in Today’s Global Society*, eds. G. Kunsang, A. Snaveley and T. Shakya (New York, NY: Trace Foundation, 2015), vol. 2, 106-128; Jaffer Sheyholislami, “Linguistic Minorities on the Internet,” in *Computer-Mediated Communication Across Cultures: International Interactions in Online Environments*, eds. Kirk St. Amant and Sigrid Kelsey (Information Science Reference, 2012).  
Hejmareke ji gotarên Şeyhûlîslamî di kovara Kurdî ya *Zirêbarê* de di hejmarên 83-4an de bi Kurdî hatine wegerandin.
- 36 Celîl Gadani, *Pencah Sal Xebat*, Kurtemêjûyekî Hizbî Dîmokratî Kurtistanê Êran (Kurteyeye Dîroka Partîya Demokratîk a Îranê) (Kurdîstana Iraqê: Bîna, Bîta).
- 37 Amir Hassanpour, *Nationalism and Language in Kurdistan, 1918-1985* (San Francisco: Mellen Research University Press, 1992); Amir Hassanpour, “The (Re)Production of Patriarchy in the Kurdish Language,” in *Women of a Non-State Nation: The Kurds*, ed. Shahrzad Mojab (Costa Mesa, CA, Mazda Publishers, 2001), 227-263; Amir Hassanpour, “The Politics of a-Political Linguistics: Linguists and Linguicide,” in *Rights to Language: Equity, Power and Education*, ed. Robert Phillipson (Mahawi, New Jersey: Lawrence Erlbaum Associates, In. Publishers, 2000), 33-49; Amir Hassanpour, “State Policy on the Kurdish Language: The Politics of Status Planning,” *Kurdish Times*, 4:1-2 (1991), 42-85.
- 38 Kerim Yeldiz, *The Kurds in Syria: The Forgotten People* (London: Pluto Press, 2005); Kerim Yeldiz, *The Kurds in Turkey* (London: Pluto Press, 2005); Kerim Yeldiz, *The Kurds in Iraq: The Past, Present and Future* (London: Pluto Press, 2004); Kerim Yeldiz, *The Kurds in Turkey: EU Accession and Human Rights* (London: Pluto Press 2005). Her du pirtûkên pêşîn ên Yildiz bi Farişî hatine wergerandin.
- 39 Mehrdad Izadi, “The Sharafnama: The History of the Kurdish Nation – 1597,” *Being the First of the Seven-Volume Critical Translation and Extensive Commentary of the Late Medieval Work on Kurdish History* (Costa Mesa: Mazda, 2005); Mehrdad Izadi, *The Kurds: A Concise Handbook* (Washington & London: Taylor & Francis, 1992).  
Ev pirtûk di sala 1998an de bi Fransî, di sala 2004an de bi Tirkî û di sala 2007an de bi Kurdî hatiye wergerandin û di Farişî de jî derçûye.
- 40 Ayad Baban, *The Kurd: The Story of a Nation’s Survival* (AuthorHouse, 2008).
- 41 Dana Caban, *Kurds a Nation Frozen In Time* (AuthorHouse, 2009).
- 42 Khalid Khayati, “From Victim Diaspora to Transborder Citizenship? Diaspora Formation and Transnational Relations Among Kurds in France and Sweden” (PhD Thesis; Linköping University, 2008).

Kebî,<sup>43</sup> Kendal,<sup>44</sup> Vanlî,<sup>45</sup> Kerimî,<sup>46</sup> Berzûyî,<sup>47</sup> Ocelan,<sup>48</sup> Elyasî,<sup>49</sup> Metîn,<sup>50</sup> Xedîv,<sup>51</sup> Nebez,<sup>52</sup> Ebrîşîmî,<sup>53</sup> Qadirî,<sup>54</sup> Emînpûr,<sup>55</sup> û Veledbeygî.<sup>56</sup>

- 
- 43 Marouf Cabi, “The Clashes of National Narratives and Marginalization of Kurdish– Iranian History” (MA Thesis; Department of History, Iranian Studies, the University of St. Andrews, Scotland).
- 44 Kendal, “Introduction: Les Kurdes sous l’Empire ottoman,” in *Les Kurdes et le Kurdistan*, ed. Gerard Chaliand (Paris: Maspero, 1978), 31-68; Kendal, “Le Kurdistan de Turquie,” in *Les Kurdes et le Kurdistan*, 69-153.
- 45 Ismet Cheriff Vanly, *Le Kurdistan Irakien: Entité Nationale: Étude de la Evolution de 1961* (Neuchatel: Editions de la Baconniere, 1970); Ismet Cheriff Vanly, *Die Nationale Frage Türkisch-Kurdistan: Eine Übersicht mit Historischem Hintergrund* (Frankfurt am Main: Komkar, 1980); Ismet Cheriff Vanly, *Kurdistan und die Kurden* (Göttingen: Gesellschaft für Bedrohte Völker, 1988).
- 46 Celîl Kerimî, *Nezeriyeyê Posistimrarî ve Kurdşinasî* (Tehran Neşrê Ney, Zîrê Çap).
- 47 Mûctebî Berzûyî, *Ovzayê Sîyasî Kurdistan* (Tehran: Fikrê Nû, 1378).
- 48 Gelekî nivîsên Ebdulah Ocelan ên derbarê Kurdistanê de li ber dest hene ku hin ji wan bi Kurdî û Farisî hatine wergerandin. Wekî mînak; hin ji wan ên girîngtirin ev in ku wekî pirtûk bi inglîzî derketine: Abdulla Ocalan, *Prison Writings: The Road Map to Negotiations*, trans. Havin Guner (International Initiative Edition/ Mesopotamia, 2012).
- 49 Barzoo Eliassî, *Statelessness and Belonging: The Case Study of Kurdish Youth in Sweden in New Dimensions of Diversity in Nordic Culture and Society* (Cambridge: Cambridge Scholars Publishing, 2016); Barzoo Eliassî, “Statelessness in a world of Nation-States: The Cases of Kurdish Diasporas in Sweden and the UK,” *Journal of Ethnic and Migration Studies* (2016), 1-17.
- 50 Kamiran Metîn derbarê modernîteya Îranê de gelekî lêkolîn pêk anîne. Lêkolînên wî yên derbarê Kurdistanê de piranî wekî notan di kovar û malperên sosyal de û gotûbêjên di konferansan de ne. Wekî mînak binêrin: Kamran Matin, “The Kurds and American Neo-Liberalism,” at [www.Counterpaunche.org](http://www.Counterpaunche.org); Kamran Matin, “Why is Turkey Bombing the Kurds?” at <https://www.opendemocracy.net/arab-awakening/kamran-matin/why-is-turkeybombing-kurds>; Kamran Matin, “Kobani: What’s in A Name?” at <https://thedisorderofthings.com/2014/10/15/kobani-whats-in-a-name/>.
- 51 Piranîya berhemên Xedîv wekî notan in ku derbarê rewş û guherînên her çar parçeyên Kurdistanê de ne. Wekî mînak bala xwe bidin Selahedîn Xedîv, “Kûdeta, Kurdha ve Erdogan,” di *Kurdpressê* de ye; Selahedîn Xedîv, “Kurdha der Şetrencê Sîyasîyê Sûrîye,” di malpera nûçeyên vekolînî ya Ziryane de ye.
- 52 Cemal Nebez, *Zimanî Yekgirtûyî Kurdî* (Elmanya, Bambûrg: Yekitîyî Neteweyî Xwêndekarani Kurd le Ewrûra, 1976).
- 53 Ebdulah Ebrîşîmî, *Meseleyê Kurd der Xavermîyane ve Ebdulah Ocelan* (Tehran: Tûkilî, 1394).
- 54 Farangis Ghaderi, “The Emergence and Development of Modern Kurdish Poetry” (PhD Dissertation; Institute of Arab and Islamic Studies, University of Exeter).
- 55 Salih Emînpûr, *Ceng ve Diplomasî Ber Serê Teqsimê Kurdistan* (Tehran: Neşrê Ihsan, 1394).
- 56 Behram Veledbeygî, *Ber Tarkê Tûfan*: Mola Mûstefa Barzanî be Rivayetê Metbûatê Îran ez 1324-1358 (Tehran: Salis, 1395).

Em dikarin hin mijaran jî bi bîr bînin ku ji lêkolînên nivîskarên ne Kurd ên li Îran, Turkiye û Iraqê derçûne. Wekî mînak; dikarin navên Şemîm Hemdanî,<sup>57</sup> Intisar,<sup>58</sup> Ozoglu,<sup>59</sup> Cebaz,<sup>60</sup> Guneş,<sup>61</sup> Ehmedî,<sup>62</sup> Kûhî Kemalî,<sup>63</sup> Celayîpûr,<sup>64</sup> û Mehmûdî<sup>65</sup> bi bîr bînin. Li gorî kesên ku ev lêkolîn pêk anîne, şeweya lènêzîkbûna wan a Kurdan û encamjêderxistina wan jî meseleyên Kurdistanê, ji aliyê pêşkêşkirin û hûrbûnê ve cudahî derxistine holê. Ev gotar bi awayekî giştî qesta mijarên berfireh dîkin. Ji dîrokê heta siyasetê ta zîman û wêjeyê, jîyan û nasyonalîzm li penaberiyê, bûne qada lêkolînê ya van gotaran. Divê bê gotin ku di hin lêkolînên van gotaran de li ser Kurdistana Îranê nehatiye rawestandî, wekî mînak; di lêkolînên Edmonds û Randal de yan jî hin lêkolîner di hin xebatên xwe de li ser Kurdistana Îranê hûrbûne. Wekî mînak; Kinnane<sup>66</sup> yan McDowall. Hin jî wan jî bi taybetî li ser Kurdistana Îranê lêkolîn kirine. Wekî mînak; Nezîr Velî û Kûhî Kemalî û Serdeştî.

Em dikarin lêkolînên ku derbarê Kurdistana Îranê de hatine kirin, li gorî welatê nivîskaran jî dabeş bikin. Wekî mînak; nivîskar û pisporên mîna Qasimlo,

- 
- 57 Mihemedesger Şemîm Hemdanî, *Kitabê Kurdistan* (Tebîz: Kitaxaneyê Saadet ve Sirûş, 1312). Weşanxaneya Medberê ev pirtûk di sala 1370yan de li Tehranê bi navê *Kurdistanê* jî nû ve çap kir.
- 58 Nader Entessar, *Kurdish Ethnonationalism* (Boulder, CO: Lynne Rienner, 1992). Ev pirtûk di sala 1391ê de bi naveke cuda bi Farisî hatiye wergerandin: Nadir Intisar, *Sîyasetê Kurdha der Xavermîyane*, Tercumeyê Irfan Qaniî Ferd (Tehran: Neşrê Ilm, 1391).
- 59 Akan Ozoglu, *Kurdish Notables and the Ottoman State* (New York: State University of New York Press, 2004).
- 60 Faleh A. Jabar, *The Kurds: Nationalism and Politics* (London: Saqi Books, 2007).
- 61 Cengiz Gunes, *The Kurdish National Movement in Turkey: From Protest to Resistance* (New York: Rotledge, 2011).
- 62 Hemîd Ehmedî, *Qovmîyet ve Qovmîyetgerayî der Îran*, Efsane ve Vaqîyet (Tehran: Neşrê Ney, 1377).
- 63 Farideh Koohi-Kamali, *The Political Development of the Kurds in Iran* (Basingstoke and New York: Palgrave MacMillan, 2003).
- 64 Hemîd Riza Celayîpûr, *Kurdistan ve Ilal Tedavûmê Bûhranê An Pes Ez Inqîlabê Islamî* (Tehran: Vezaretê Ûmûrê Xariciye, 1372); Hemîd Riza Celayîpûr, *Qazî Mihemed: Kurdistan der Salhayê 1320-1324* (Tehran: Emîr Kebîr, 1369); Hemîd Riza Celayîpûr, *Firaz ve Firûdê Conbişê Kurdî 1357-1367* (Tehran: Levçê Nov, 1385). Pirtûka Qazî Mihemed di sala 1386an de bi Kurdî hate wergerandin: Hemîd Celayîpûr, *Qazî Mihemedpûr*, Wergêr Îbrahîm Wirtî (Tehran: Tûkilî, 1386).
- 65 Nadir Mehmûdî, *Hizbî Demokrati Kurdistanî Îran* (Tehran: Mûesseyê Mûtalaat ve Pêjohîşayê Sîyasî 1394).
- 66 Derk Kinnane, *The Kurds and Kurdistan* (Oxford: Oxford University Press, 1972) Ji vê pirtûkê du werger di zîmanê Farisî de hene. Wekî mînak binêrin Derk Kinnane, *Kurdha ve Kurdistan*, Tercumeyê Îbrahîm Yûnisî (Tehran: Mûesseseyê Intîşaratê Nîgah, 1372). Herwiha, ev pirtûk li Kurdistana Îraqê bi zîmanê Kurdî hatiye wergerandin.

Velî, Xeyatî, Elyasî, Metîn, Xedîv û Medenî ji Kurdistanana Îranê ne. Digel vê, van nivîskaran xebatên xwe tenê li ser Kurdistanana Îranê nekirine. Bo mînak; Qasimlo bi nêrîneke Marksîzma klasîk li hemû Kurdistanê nihêriye, Metîn bi nêrîneke çepa nû li Kurdistanana Turkiye û Suriyeyê nihêriye û Ebbas Valî di lêkolînên xwe yên dawî de bêhtir berê xwe daye lêkolînên derbarê Kurdistanana Îranê de. Em dikarin mijarên lêkolînê yên ku derbarê Kurdistanana Îranê de hatine kirin bi awayekî zeltir dabeş bikin. Bo mînak; di arşîva lêkolînên Kurdnasiya Kurdistanana Îranê de gelekî çavkaniyên hêja yên di qadên dîrokî, siyasî, civakî, çandî, zimanî û çandnasî, muzîkî, oto-biyografîk, arşîvnasî, roman û wêje, lêkolînên neteweyî û monografîkê de hene. Awayekî din a dabeşkirinê jî, li gorî pîvanên vegêrana lêkolînên Kurdî ne. Bo mînak; lêkolînên ku di çarçoveya vegêrana neteweperweriya Kurdî yan jî vegêrana neteweperweriya Farişî-Îranî de ne.<sup>67</sup> Di vê gotarê de digel rawestîna li ser mijarên lêkolînan, dê nêrînek bo qada vegêrannasiyê jî bê dayîn. Wekî dawî em dikarin Kurdnasiya li Îranê ji hêla qada erdnîgarî û mijara vekolînî ve jî dabeş bikin. Yanî Kurdan di lêkolînên xwe de kîjan qadên erdnîgariyê wekî Kurdistanê fikirîn û ên ne Kurd çi fikirîn? Di berdeewama vê gotarê de dê hewl bê dayîn ku xalên navborî bîn lêkolînkirin.

### 3. LÊKOLÎNÊN DÎROKÎ/SIYASÎ YÊN KURDISTANÊ

Lêkolînên dîrokî û siyasî yên Kurdistanê ji hev cihê nabin, lewre beşeke mezin a ku wekî dîroka Kurdistanê heta îro hatiye dîtîn, heta radeyeke mezin a wê, guherîn û bûyerên siyasî ne; bi kurtî têkoşînên Kurdan, rabûn û rûniştina wan in. Di rastiyê de, mijarên dîrokî-siyasî li Kurdistanê ew qas di nav lêkolînên Kurdnasiyê de serwer bûne ku mijarên dîroka civakî ber bi goşeyekê ve hatiye dûrxistin. Di vê mijarê de em dikarin *Şerefnameyê*, berhema Şerefxanê Bedlîsî,<sup>68</sup> wekî berhema pêşîn a berhevkar bizanin ku bi şîrove û li gorî riwayetên destanî û dîrokî behsa dîroka Kurdan kiriye. Ev pirtûka ku di sedsala 16an a mîladî de hatiye nivîsandin, digel bibîrxistina gotetegotên destanî yên derbarê koka Kurdan de, bi awayekî termînolojîk, qala herêm û eşîrên biçûk û mezin ên Kurdan kiriye ku li împaratoriya Osmanî û Safewî niştetih in. Bi awayekî din ku em dikarin bibêjin vê pirtûkê qala dîroka dewletên herêmî yên Kurdistanê û bûyerên çend sedsalan ên wan dewletan kiriye. Bedlîsî qala bûyerên siyasî û rêvebirî û bi hindik be jî bi baldariyeke tam, qala jiyana civakî ya Kurdan kiriye. *Şerefname* yekem berhem e ku bi

67 Divê bê gotin ku neteweperweriya Îranî neteweperweriya Farişî dihundurîne û ev têgeh ji bo gelên nefariş wekî Loran û Tirkan jî derbasdar e.

68 Şerefxan bin Şemsedîn Bedlîsî, *Şerefname: Tarîxê Mufeselê Kurdistan*, be Ihtimamê Vlademîr William Josef (Tehran: Esatîr 1378)

awayekî giştî çarçoveyê nasnamesazî, siyasî û erdnigariyê ji bo Kurdistan daniye.

Di vê navberê de em dikarin navê hin berhemên pêşîn ji bi bîr bixin. Wekî; Hedîqeyê Nasiriye ve Miratîlzefer ve Eyalat ve Tevayîfê Kurd,<sup>69</sup> Tehfeyê Nasiriye,<sup>70</sup> Zebedetul Tevarîxê Senedecî,<sup>71</sup> Lebul Tevarîx,<sup>72</sup> Hedîqeyê Emanûllahî,<sup>73</sup> Seyrul Elekrad,<sup>74</sup> Tarîxê Selatînê Oraman<sup>75</sup> û Tarîxê Erdelan<sup>76</sup>. Bo mînak; Hedîqeyê Nasiriye ve Miratîlzefer digel erdnigariya xwezayî ya Kurdistanê, behsa dîrokçeya serdarên Erdelan û serdarên neherêmî yên di sedsala 12an a heyvî de dike. Pirtûka Lebul Tevarîx, ku di sala 1249ê heyvî de hatiye nivîsandin, bûyerên siyasî yên serdarên Erdelanê bi awayekî baş neqil kiriye.

Di sedsala 19an de berhemên din ên derbarê Kurdistanê de derketin meydanê ku yek ji van *Sefernameyê Rich* e. Ev pirtûk di sala 1820an de derketiye û tê de derbarê herêmên Kurdistana li ser împatoriya Osmaniyan û qismek ji herêmên Kurdistana Îranê de ku li ser împatoriya Qaçaran bû, agahî cih digirin.<sup>77</sup> Rich di vê *Sefernameyê* de derbarê bûyerên siyasî û civakî yên bajarê Silêmaniyê û derdora wî û Kurdistana Îranê û bi taybetî Senendecê de me agahdar dike. Berhemên bi vê cureyê, gav bi gav berfirehtir bûn. Em dikarin di vê cureyê de berhema Vasili Nikitin a berfireh nişan bidin ku demekê wekî dîplomatê Rûsyayê li Ûrmiyeyê maye û pirtûka xwe ya bi navê *Kurd û Kurdistanê* li ser Kurdistanê û Kurdistan, wekî Kurdên Îranê, bi lêkolînên civaknasîyê nivîsandiye.<sup>78</sup>

Pirtûka *Zobdeyê Tarîxê Kurdistan* berhemeke bijarte ya Emîn Zekî Beg e, ku nivîskarekî Kurd e û serbazekî împatoriya Osmanî û dewleta nû ya Iraqê bû, yek ji berhemeke berfireh e ku derbarê dîroka Kurdistan de hatiye nivîsandin.<sup>79</sup> Wî

- 
- 69 Elî Ekber Vaqîinigar, *Hedîqeyê Nasirî: Cografya ve Tarîxê Kurdistan* (Tehran: Tûkilî, 1364); Elî Ekber Vaqîinigar, *Eşayir ve Eyalat ve Tevayîfê Kurd* (Tehran: Tûkilî, 1377).
- 70 Mîrza Şekerelah Senendecî, *Tehfeyê Nasirî der Cografya ve Tarîxê Kurdistan ve Panc Meqale der Morîdê Qebayilê Kurd* (Tehran: Emîrê Kebîr, 1375).
- 71 Mela Mihemed Şerîf Qazî, *Zebedetul Tevarîxê Senendecî* (Tehran: Tûkilî, 1379).
- 72 Xosro bin Mihemed bin Menûçehrê Erdelanî, *Lebul Tevarîx* (Tehran: Kanûnê Xanevadegîyê Erdelan, 1356).
- 73 Mîrza Şekerelah Senendecî, *Hedîqeyê Emanûllahî* (Tehran: Mûesseseyê Tarîx ve Ferhengê Îran, 1366).
- 74 Ebdûlqadir bin Rustemê Babanî, *Seyrul Ekrad: Der Tarîx Cografyayê Kurdistan* (Tehran: Tûkilî, 1377).
- 75 Ebdûlah bin Ebdûlezîz Şeydayê Merdûxî, *Tarîxê Selatînê Oraman ve Tarîxê Siyasîyê 1000 Saleyê Oraman* (Senendec: Pertevbiyan, 1383).
- 76 Mestûre Erdelan, *Tarîxê Erdelan* (Senendec: Bîna, 1326).  
Ev pirtûk di sala 1988ê mîladî de li Iraqê bi zimanê Kurdî jî hatiye wergerandin û çapkirin.
- 77 Rich, *Geştîyê Rich bo Kurdistan*.
- 78 Nikitin, *Kurd û Kurdistan*.
- 79 Emîn Zekî Beg, *Zobdeyê Tarîxê Kurdistan*.

dixwest di arşiv û pirtûkxaneyên Osmanî de bi isnad û belgeyan dîroka Kurdan vekole. Lewra, armanca lêkolîna xwe li ser destanan û belgeyên nivîskî diyar kir ku derbarê koka Kurdan û çanda wan de ne. Ev pirtûk, ku ji bo zimanê Farisî hatiye wergerandin, li Îranê di nav berhemên çavkanî de tê dîtin; lewra xwediyê girîngiyek e. *Kurd ve Peyvestegiyê Nijadî*, berhema Reşîd Yasimî, berhemeke girîng a din e ku li Îranê di dema Pehlewîyê pêşîn de hatiye nivîsandin.<sup>80</sup> Vê pirtûkê bi taybetî cih daye mijara peydabûna nijada Kurdan. Wisa ku ev pirtûk bergiriyê-ke rejîma Pehlevî bû, ji bo ku li hemberî pirtûka Zekî Beg bisekine. Yasimî, bi gelemperî di vegotina xwe ya Îranperwer-Farisperwera wê çaxê de, ne tenê hewl dide ku bi belge û delîlan koka nijada Kurdan eşkere bike, belkî gumanên ji ber gengeşiya Kurdan derketî jî ji holê rake.<sup>81</sup>

Di sedsala 20an de, lêkolînên dîrokî-siyasî yên derbarê Kurdan de lezgîniyeke xurt girt ku gelekî ji wan bi awayekî, cih dane Kurdîstana Îranê jî. Piraniya van berheman ji aliyê nivîskarên Rojavayî hatin nivîsandin ku dûre bi zimanê Farisî weşyan û em dikarin di nav wan de hin berheman bi bîr binin. Wekî; Kuchra,<sup>82</sup> Nikitin,<sup>83</sup> McDowall,<sup>84</sup> Kinan,<sup>85</sup> Aegleton<sup>86</sup> çend ji wan in.<sup>87</sup> Berhemên navborî bi zimanên Kurdî û Farisî hatine wergerandin. Lewra, tevî ku nivîskarên Rojavayî ev berhem nivîsandine, em dikarin çavkaniyên wiha hêja ji bo jinûve xwendinên dîrok û siyaseta Kurdan, Kurdên Îranê jî di nav de, berçav bigirin. Berhema Nikitin ne di nav de, ku bêhtir wekî civaknasî/antropolojîk dixuye, berhemên din zêdetir bala xwe dane ser bûyerên siyasî yên beriya Şoreşa Îslamî ya Îranê. Kêman em dikarin bûyerên piştî şoreşê yên li Kurdistanê û siyaseta dewletê ya li ser vê herêmê bibînin. Behsên sereke yên van çavkaniyan, vekolîna serhildana Îsmail Axayê Simko (1910-1929) û piştî vê jî, bi taybetî avabûna Komara Mehabadê ye ku di sala 1946ê mîladî de pêk hatiye. Aegleton yek ji berfirehtirîn berhemeke derbarê komara Kurdistanê de nivîsandiyê. Kuchra jî bi hûrgilî li ser serhildana Simko û Komara Mahabadê rawestiyaye. Di gelek berbemên wergerandî yên derbarê Kurdîstana Îranê de, dîmena kronolojîk a bûyeran gelekî ber bi çav bûye

80 Yasimî, *Kurd ve Peyvestegiyê Nijadîyê An*.

81 Sîrwan Xosrûzade, "Neqđ ve Berresîyê Kitabê Kord ve Peyvestegiyê Tarîx ve Nijadîyê ve Eserê Gulam Riza Reşîd Yasimî," Zerîbar, Şomareyê 81-82 (1392), 231-138.

82 Kuchra, *Conbişê Millîyê Kurd*.

83 Nikitin, *Kurd ve Kurdistan*.

84 McDowall, *Tarîxê Muassirê Kurd*.

85 Kinan, *Kurd ve Kurdistan*.

86 Aegleton, *Cumhuriyê 1946ê Kurdistan*.

87 Divê bê gotin ku hejmara lêkolînên heyî yên derbarê Kurdan de û bi taybetî yên derbarê Kurdên Îranê de ji van zêdetir in, lê ji ber ku bi zimanê Farisî nehatine wergerandin, bi istisnayê çend xalan, li vê derê navê wan nehatine bilêvkirin.



û qala wan kesên ku di van bûyerên Kurdistanana Îranê de cihgirtî ne, hatiye kirin. Di vê pirtûkê de di şayesandina bûyerên Kurdistanana Îranê de ta radeyekê, mantiq û rêbazên wekhev li ber çavan hatine girtin. Di pirtûkê de bi dîmenên kevneşopî û eşîrî serhildanên Kurdistanê hatine derpêşkirin û pişgirî yan jî tevlibûnên hêzên derveyî, wekî alîkariya şoreşî bo Komara Mehabadê, hatine behskirin. Em dizanin ku ev tevlibûnên derveyî li ser guherîna nêrînên neteweperweriyê û nasnamesaziyê yên li Kurdistanê xwedî bandor bûne. Digel van, pirtûka *Tarîxê Muasirê Kurd*, berhema McDowall, ligel bûyerên Kurdistanana Mûkriyan<sup>88</sup> cih daye bûyerên siyasî û rêveberiyê yên herêmên din ên Kurdistanana Îranê, wekî Kirmanşahê. Ev tişt e ku em bê guman dikarin di berhemên din ên Rojavayîyan de jî bibînin. Ji aliyekî ve rawestana van berhemên navborî ên ku li ser serhildanên Kurdan ên beriya 1979an in û ji aliyekî din ve xwendina rabûn û têkçûna serhildanên li beşên din ên Kurdistanê, yanî li Iraq û Turkiyeyê, bûne sedem ku ev berhem gelek caran li Îranê bêne çapkirin.<sup>89</sup>

Digel berhemên nivîskarên Rojavayî yên derheqê dîrok û siyaseta Kurd û Kurdistanana Îranê de, hin berhemên jî Kurd û kesên ne Kurd nivîsandine ku hem ji Îranê hem jî ji derveyê Îranê ne. Ev berhem li ser bûyerên siyasî û rêveberiyê yên Kurdistanê ku beriya Şoreşa Îslamî û yên piştî wê rawestiyane. Di nav nivîskarên ne Kurd de em dikarin navên van kesan bi bir bînin: Zerbext,<sup>90</sup> Celayîpûr,<sup>91</sup> Erfe,<sup>92</sup>

- 
- 88 Kurdistanana Mûkriyan beşeke Kurdistanana Îranê ye ku ji hêla siyasî-rêveberiyê ve li ser başûr û rojavaya wîlayeta Azerbaycana Rojavayî cih digire. Serhildana Simko û avakirina Komara Kurdistanê li ser vê herêmê pêk hatiye.
- 89 Wegerandin û çapkirina berhemên derbarê beşên Kurdistanê yên Iraq, Sûrîye û Turkiyeyê tu problem li Îranê dernaxîne.
- 90 Mûrteza Zerbext, *Ez Kurdistanê Iraq Ta An Sûyê Eres* (Tehran: Şîraze, 1377)
- 91 Celayîpûr, Qazî Mihemed; Celayîpûr, *Kurdistan ve Illel Tedatovê An Bûudê Ez Inqilab; Celayîpûr, Firaz ve Firûdê Conbiş Kurd*.
- 92 Huseyn Erfe, *Kurd: Yek Berresîyê Tarîxî ve Sîyasî* (Tehran, Ana, 1372).  
Divê bê gotin ku Erfe di sala 1324an de serokê wargeha artêşa Îranê û ji sala 1337an ta 1340an jî balyozê Îranê yê li Turkiyeyê bûye.

Ramîn,<sup>93</sup> Ehmedî,<sup>94</sup> Beyat,<sup>95</sup> Rezmara,<sup>96</sup> û Fîrûzî.<sup>97</sup>

Hinek ji van nivîskarên, hereketên siyasî û rêvebiriyê yê Kurdan û nêrînên xwedî bandor yê li ser wan rexne û lêkolîn kirine. Wekî mînak; Ehmedî di hinek beşên pirtûka *Qovmîyet ve Qovmîyetgerayî Der Îranê* de mijarên sedsala dawî yê Kurdistanê û nêrîn û angaştên neteweperweriyê yê li Îranê şîrove kirine. Wî bûyerên navborî û nêrînên li pişt wan ji karên kesên xwedanhêz, ne gelê normal, û ji hêzên biyanî zaniye. Lewra, neteweperweriyê li Îranê û lewma li Kurdistanê wekî neyînî dibîne. Celayîpûr jî di pirtûka *Firaz ve Firûdhayê Conbişê Kordî* de digel lêkolîna guherînên hereketên siyasî ya li Kurdistanê, yek jî hewl daye ku rexneya neteweperweriya nijadî ligel xurtkirina neteweperweriya rewa ya li Îranê bike.<sup>98</sup> Berevajî, di danezana gotara “Heq û Naheqê Mesailê Qovmî Der Îran” de, derbarê şayesandina awayê daxwazan de ku li Îranê wekî daxwazine nijadî tî vegotin, hewl dide ku ew dîmenên bêhtir reng û bêhna nijadî jê tê (ziman) ji dîmenên din (daxwazine aborî, wekhevî û rakirina firqan) cuda bike û bi nişandana dîroka Kurdan a berê ya li Îranê, mahiyeta rewşên cuda ya wan a li Îranê digel Kurdên Iraq û Turkiyeyê berawird bike û çareseriyên pêkan bo wan pênase bike. Di danezanên ve mijarê de ew, vegotin û meylan rexne dike ku di wan de serweriya dîroka Farisan û serweriya zimanê Farişî di ser gelên din yê Îranê re tî girtin.

Layiqê gotinê ye ku lêkolînên derbarê Kurdên Îranê de xwedî hêleke navneteweyî jî ne.<sup>99</sup> Bo mînak; Beyat di pirtûka *Şorişê Kordhayê Turkiye ve Tesîrê An Ber Revabitê*

93 Huseyn Ramîn, *Fermanê Ateş Der Kurdistanê Baxter, Kurdistan 1320-1321: Bazsaziyê Xatirat Huseyn Erfe* (Tehran: *Tarîxê Muasîrê Îran*, 1389).

94 Ehmedî, *Qovmîyet ve Qovmîyetgerayî Der Îran: Efsane ve Vaqîyet*.

95 Kave Beyat, *Şorişê Kurdhayê Turkiye ve Tesîrê An Ber Revabitê Xariciyê Îran*, 1307-1311 (Tehran: Neşrê Tarîxê Muasîrê Îran, 1376); Kave Beyat, *Kurdha ve Firqeyê Demokratê Azerbaycan* (Tehran: Şîraze, 1379); Kave Beyat, “Nehzetê Gerb,” *Gortûgo*, Şomare 61 (1393), 55-62; Kave Beyat, “Heq ve Naheqê Mesailê Qovmî Der Îran,” *Goftûgo*, Şomare 43 (1387), 12-129.

96 Sahibêlî Rezmara, *Emeliyatê Orûpa: Payîz ve Zimistan 1310 Şemsî* (Tehran: Şîraze, 1387).

97 Hemîd Riza Fîrûzî, *Cumhuriyê Kurdistan: Guzerî Ber Çigûnegîyê Peydayîş ve Çirayîyê Firûpaşî* (Senendec: Nevayê Daniş, 1388).

98 Celayîpûr piştî Şoreşa Îslamî çar sal û nîvan fermandarê bajarê Neqde, çar sal û nîvan fermandarê bajarê Mehabadê û derdorê çar salan berdestê walîyê bajarê Kurdistanê bûye.

99 Hemîd Riza Mihemedî û Huseyn Xalidî, *Jeopolîtîkê Kurdistanê Iraq* (Tehran: Neşrê Intixab, 1392); Mihemed Mubarkêşahî, *Cografyayê Siyasiyê Kurdistanê Iraq ba Tekîd Ber Meseleyê Kerkûk* (Merîvan: Evîn, 1394); Tahir Arya, “Berresî Ber Neslkûşî Der Huqûqê Beynelmîlêl ba Tekîd ber Qeziyyeyê Helebçe” (Payannameyê Karşinasîyê Erşedê Huqûq Danişgahê Azadê Îslamî Vahid Tehranê Merkez, 1390); Elî Hacî Qasimlo, “Tesîrê Tehevulâtê Exîrê Xavermîyane (2011-212) Der Menatiqê Kurdistan” (Payannameyê Karşinasî Erşedê Ulûmê Siyasî Danişgahê Azadê Îslamî Vahid Tehranê Merkez, 1392); Celîl Merdadî, “Revabitê Kurd-

*Xariciyê Îran, 1307-1311* de li ser têkoşîna Kurdan a li hemberî Turkiyeyê û bandora wê ya li ser siyaseta derve ya Îranê rawestiyaye. Wî di pirtûka navborî de siyaseta derveyî ya Îran û Turkiyeyê ya li hemberî hev û veguherîna Kurdan û têkoşîna wan a li Turkiyeyê vekolaye û encamek derdixe ku piştî Şerê Cihanê ya Yekem û Serhildana Agiriyê, nelihevkirinên Îran û Turkiyeyê li ser sînoran dewam kiriye û dewleta Turkiyeyê cara pêşî êdî nekariye ji hêzên Kurdan sûd wergire ji bo ku êrîş bibê ser Îranê. Di berdêla vê de, Îran cara yekem piştgiriya neyekser da şoreşgerên Kurdên Turkiyeyê. Berhemên Rezimara û Ramîn ji derbarê serkeftinên hereketên artêşî yên Riza Xan de hene ku li ser bûyerên siyasî û rêvebiriyê yên li herêma Kurdistanê ne.

Di vê çarçoveyê de, Kûhî Kemalî ji di berhema xwe ya *Tovseyê Siyasî Der Kordistanê Îran* de bûyerên Serhildana Simko, Komara Mehabadê ya 1946an û bûyerên piştî Şoreşa Îslamî ji nû ve dixwîne û vedikole.<sup>100</sup> Bi nêrîna wî, Serhildana Simko ji hêla kirinan ve xwedî rengê talanker û eşîrî bû, lê ji ber bandora rewşên siyasî û civakî yên herêmê reng û dirûvê neteweperweriyê jî girt. Kûhî Kemalî Komara Mehabadê tevî hemû kêmasiyên wê, yekem hereketa neteweperiya modern a Kurd û serkeftineke mezin bo geşbûn û pêşketina hereketa serxwebûnxweziya Kurdan li welatên wekî Turkiye û Iraqê dizane. Bi dîtina wî, Komara Mehabadê ji Kurdan re wêneyeke dîrokî çêkir ku tê de gelê Kurd wekî miletekî yekbeden derdiket meydanê.

Kurdên di hundir û derveyê Îranê de ji berhemên hêja derbarê siyasat û dîroka Kurdistanê Îranê de bi zimanên Îngilîzî, Kurdî û Farisî li ser vê qadê zêde kirine. Bo mînak; di nav van nivîskaran de em dikarin navên van kesan bi bîr binin: Velî, Medenî, Yasimî, Serdeştî, Berzûyî, Davûdî,<sup>101</sup> Ebrîşimî, Mihemedpûr,<sup>102</sup> Xûşhalî,<sup>103</sup>

---

ha ba Eramene Ez 1905-1920” (Payannameyê Karşinasîyê Erşedê Tarîx Danişgahê Sîstan ve Belûçîstan, 1388); Metleb Metlebî, “Tesîrê Kurdha Ber Revabitê Îran ve Osmanî Ez 1914 ta 1979” (Payannameyê Karşinasîyê Erşedê Tarîx Danişgahê Sîstan ve Belûçîstan, 1386); Mihe-med Asartemir, “Teherrukatê Qovmîyê Kordha ve Emnîyetê Millîyê Turkiye (1990-2008)”, (Payannameyê Karşinasîyê Erşedê Ulûmê Siyasî Danişgahê Elame Tebatabayî, 1387).

100 Koohi-Kamali, *The Political Development of the Kurds in Iran*.

Ev pirtûk her çend bi Farisî nehatiye wergerandin jî parçeyek ji lêkolînên girîng e ku derbarê Kurdistanê Îranê de hatiye nivîsandin. Beşek ji vê pirtûkê di hejmara 2yan ya kovara *Raveyê* de bi Farisî hatiye wergerandin.

101 Mihemed Riza Davûdî, *Mehebad Der Fasileyê Du Cengê Beynelmîlê Evvel ve Duvom*, 1918-1938.

102 Ahmad Mohammadpur, “The Rise and Fall of Political Movements in the Late 19th Century and First Half of 20th Century of Kurdistan”.

103 Behzad Xûşhalî, *Qazî Mihemed ve Cumhûrîyê Kurdistan Der Ayneyê Isnad* (Naşir: Behzad Xûşhalî, 1380).

Seyfî Qazî<sup>104</sup> û Qaniû Ferd<sup>105</sup>. Nivîsên Valî, ku bi zimanê Îngilîzî hatine amadekirin û tenê hinek ji wan bi zimanên Kurdî û Farisî hatine wergerandin, wekî berhemên maqûltirîn û cidîtirîn tînen pejirandin. Pirtûka *Kordha ve Devlet Der Îran* bi lêkolîna mekanîzmaya avakirina nasnameya Kurdî di sedsala 20an de ya li Îranê hûr bûye.<sup>106</sup> Ew di vê pirtûkê de mercên piştî Şoreşa Meşrûtiyê û bi taybetî wextê hatina serkar a Riza Xan û şewaza reftarên wî ligel Kurdan li Kurdistanê vedikole û bi bîr dixê ku ew reftar li ser mekanîzmaya “afirandina dînan” ji bo tespîtkirina cihê “xwe”yê Farisî û ji bo tespîtkirina hakimiyeta dewletek-mileteke nû bûne. Ev xebata wî, bi awayekî ku dewama xebata wî ya pêşîn a ku bi navê “Kordha ve Dîgerîhayîşan” e ku tê de li ser avakirina nasnameya yekparçe li beşên cihê yê Kurdistanê û siyasetên cuda û curbicur ên dewletan ligel Kurdan rawestiyaye.<sup>107</sup> Ji taybetiyên serkeftî yê berhemên Valî yek ew e ku ew meylê nade ku tenê bûyerên dîrokî kronolojîk rêz bike û tenê navê wan bi bîr bixê, ew hewl dide gotara serdest, diyarkerên ku nasnameya nû ava dikin û hereketên siyasî yê li Kurdistanê Îranê zelal bike. Valî di xebateke din a bi navê “Tebarşinasîyê Kordha: Saxtê Millet ve Huvîyyetê Millî Der Nivîstehayê Millî”<sup>108</sup> de, ku di pirtûka *Meqalatî Der Rîşehayê Nasyonalîsmê Kord*<sup>109</sup> de weşiyaye, bi awayekî gelemperî avakirina nasnameya Kurdî li Kurdistanê û bi awayekî berfireh şeweya avakirina vê nasnameyê di sedsala 20an de li Kurdistanê Îranê vekolaye.

Berzûyî di pirtûka *Vezîyetê Siyasîyê Kordistan* de bi awayekî taybet Serhildana Simko û Komara Kurdistanê dadihûrine. Di vê pirtûkê de, nivîskar ji aliyekî ve hewl daye ku hêla eşîrî û talankerîya Serhildana Simko nişan bide, serî li belge û şahidên cuda yê vê bûyerê bide; ji aliyekî din ve jî bi lêkolîna avakirina Komara Mehabadê ya di sala 1946an de hewl dide ku para hêman û hêzên derveyî, bi taybetî Yekîtiya Sovyetan a ji bo avakirina û geşbûna Komarê, nişan bide û mahiyeta xwebixweyî û neteweperwerîya Komarê kêmqiymet nişan bide.

Berhema Yasîn Serdeştî ya derbarê Kurdên Îranê de yek ji xebateke berfireh a

104 Rehîm Seyfî Qazî, *Esrarê Muhakemeyê Qazî Mihemed ve Yaraneş*, Tercumeyê Mihemed Riza Seyfî Qazî (Tehrîz: Ana, 1379).

105 Irfan Qaniû Ferd, *Pes Ez Şest Sal: Zindegî ve Xatiratê Celal Talebanî*, 1933-1966 (Tehran: Ilm, 1388); Irfan Qaniû Ferd, *Tondbadê Hevadis: Goftogûyî ba Isayê Pijman* (Tehran: Ilm, 1390).

106 Valî, *Kurds and the State in Iran: The Making of Kurdish Atnicity*.

107 Ebbas Velî, “Kordha ve Dîgerîhayîşan: Hûviyê Parepare ve Siyasethayê Yekpare”, Tercumeyê Kave Destûre, Novîsa, Salê 1, Şomareyê 1 (1381), 3-38.

108 Abbas Valî, “Genealogies of Kurds: Contruction of Nation and National Edentity in Kurdish Historical Writting”, in *Essay on the origins of Kurdish nationalism* (Costa Mesa, CA: Mazda Publisher, 2003).

109 Valî, *Essays on the origins of Kurdish nationalism*.

din tê dîtin ku derbarê lêkolînên Kurdistana Îranê de xwedî pisporiyê ye.<sup>110</sup> Ew ku ji Kurdên Îraqê ye, wî di vê pirtûka xwe de bi hûrgilî cih daye Serhildana Simko û Komara Mehabadê. Tiştê eslî ku ji angaştê Serdeştî derdikeve ev e ku serhildanên navborî tevî bergirî û kêmasiyan jî serhildanên li pey edaletê bûne û hêjayê pesnê ne. Pirtûka *Kurd ve Istiratejiyê Dewletan*, berhema Seîd Medenî,<sup>111</sup> berhemeke din e ku bi zimanê Kurdî wekî du cild hatiye amadekirin; siyaset û stratejiyên kurt û dirêj ên dewletên Îran, Turkiye, Iraq, Sûriye û welatên din analîz dike ku derheqê pirsgerêka Kurdan de ne. Di vê pirtûkê de nivîskar hewl daye ku perdeya siyasetê van welatan a ji bo Kurdan rake. Nêrîna nivîskar a ji bo Kurdistan û Kurdan nêrîneke neteweperwer e ku li gorî daxwazên Kurdan angaştê serxwebûnê dîpat dike. Ji nav berhemên Irfan Qaniî Ferd, pirtûka *Pes Ez Şest Sal* berhemek e ku mijara wê ji bîranînên Celal Telebanî, yek ji rêberekî têkoşîna Kurdên Iraqê û serokê Komara Iraqê ye, pêk tê. Ev pirtûk her çend li ser jiyana Celal Talebanî hûr bibe jî, di naveroka xwe de cih daye mijarên dîroka modern a Îranê û hem jî kirinên hin serokên têkoşîna Kurdî ya Iraqê, wekî Mela Mustefa Barzanî, bi tundî rexne dike. Di vê çarçoveyê de, pirtûka *Tondbadê Hevadis* jî, ku mijara wê bîranînên Eysa Pijman e, bi awayekî eşkere hewl dide ku erka rêvebiriya Pehlevî û bi taybetî ya Savakê di têkoşîna Mela Mustefa Barzanî de û bi cureyeke giştî di têkoşîna Kurdên Iraqê de nîşan bide.

Digel van hemiyana, lêkolînên Kurdî yên li Îranê tenê bi van berhemên navborî sînordar nînin. Hinek lêkolînên berfireh û keys ên derbarê qada dîrok-siyasetê Kurdistanê de di kovarên çapkirî yên hundir û derveyê herêma Kurdistanê de weşiyane. Wekî mînak, em dikarin li Kurdistana Îranê navên kovarên *Rojev*,<sup>112</sup> *Zirêbar*,<sup>113</sup> *Jîwar*,<sup>114</sup> *Nivîsa* û *Rave*<sup>115</sup> bidin ku di qada zanistên civakî û mirovî de xwedî pisporiyê ne û bi du zimanan, Kurdî û Farişî, çap bûne. Di van kovaran de her çiqas di mijarên derveyî siyaset û dîrokê de nivîs weşiyabin jî bi gelemperî naveroka van kovaran bi mijarên siyasî-dîrokî dagirtî ne. Beşeke van lêkolînan, xwe spartine wergera berhemekê ku li derveyî Kurdistanê bi zimanê Îngilîzî hatine nivîsandin. Ev xebat pêkan e ku derbarê Kurdistana Îranê yan beşeke din a Kurdistanê de be. Tiştê ku dixuye, berhemên wergerandî, bêhtir li ser beşên din ên Kurdistanê hatine nivîsandin. Hinek ji van xebatan bi kurtî hatine amadekirin.<sup>116</sup>

110 Serdeştî, *Kurdekani Êran* (Silêmanî: Serdem, 2003).

111 Medenî, *Kurd û Istiratejiyê Dewletan*.

112 Rojev di zimanê Kurdî de tê wateya behsa rojê.

113 Zirêbar navê goleke li Kurdistana Îranê ye ku di nav sînoren bajarê Merîwanê de ye.

114 Jîwar di wateya şaristanîyê de ye.

115 Rave di wateya şirovekirinê de ye.

116 Hewceyî gotinê ye ku li Ewropayê ji sala 1995an ve kovareke wiha payebilind a bi navê

Kovara *Rojevê* yek ji kovarên girîng e ku di vê deh salên dawî de li Kurdistana Îranê dest bi weşanê kiriye. Ev kovara ku di nava salên 1380yan de li Kurdistana Îranê ji hêla hin mamosteyên zanistên mirovî ve hatiye çapkirin û weşandin, di çarçoveya vegotina neteweperweriya Kurdî de bi awayekî maqûl û rexneyî cih dide civaka Kurdistanê û dewletên serwer ên li ser Kurdistanê. Di vê kovarê de qada siyasetê cihêkî berfirehtir digire û digel mijarên derbarê Kurdistana Îranê de, mijarên derbarê Kurdistanên Türkiye, Iraq û Sûriyeyê de jî cih digin. Hinek dosyeyên pisporane yên vê kovarê ev in: “Dîroka Siyasî ya Nûjen a Kurdistanê”,<sup>117</sup> “Demokrasî û Sistemên Rêvebiriya Herêmi”<sup>118</sup> û “Beşdarbûna Siyasî ya Kurdistan”.

Em dikarin ji nav kovarên xwedî bandor ên li herêma Kurdnîşîn, navê kovara *Zirêbarê* bidin ku ji deh salan bêhtir e bi meyleke rexneyî û lêkolînî mijarên curbicur ên derheqê civaka Kurdistanê de bi awayê dosyeyên pisporane analîz dike. Lijneya nivîskarên vê kovarê, piranî ji mamosteyên civaknasiyê pêk tê. Heger em bixwazin mijarên naveroka wê bêhtir bizanin, em dikarin navên hin dosyeyên wê yên çapkirî bi bir bînin: “Cihanîşoden ve Meseleyê Milliyetha”, “Demokrasî ve Camiye Medenî”, “Edebiyyat ve Ferheng”, “Conbişhayê Ictimaiyê Novîn”, “Conbişhayê Islami Der Kordistan”, “Mutaliatê Pesistimrari”, “Îlam ve Kirmanşah”, “Sermayeyê Ictimai”, “Şiirê Muassirê Kordistan”, Edebiyyatê Dastaniyê Kordistan, “Modernîte”, “Zeban ve Camie”, “Zebanê Kordî ve Ferhengnûsi”, “Nalî”,<sup>119</sup> “Tarîxnigariyê Kordistan”. “Resaneyê Kordî”, “Siyaset der Kordistan” û “Daiş ve Daişîsm”. Digel gotarên vê kovarê yên navborî yên derbarê Kurdistanên Türkiye, Iraq û Sûriyeyê de, gotarên curbicur ên derbarê civaka Kurdistana Îranê de hene ku bi awayekî taybet li ser

---

Lêkolînên Kurdî (Journal of Kurdish Studies) diweşe ku bala wê, bêhtirîn li ser Kurdistana Türkiye û Iraqê ye; di wê de lêkolîneke taybet a derbarê Kurdistana Îranê de neweşiyaye.

117 Celil Meradî, “Imperatoriyê Osmanî, Kord ve Ermenî”, *Rojev*, Şomareyê 8-10 (1387), 77-88; Mihemed Kemanger (Hemayûn), “Cemîyetê J.K. Der Kirmanşah”, *Rojev*, Şomareyê 8-10 (1387), 125-138; Elî Riza Merûfî, “Îlelê Nakamîyê Cumhûriyê Kurdistan”, *Rojev*, Şomareyê 9-10 (1387), 145-156; Emîr Ehmediyan, “Ingilistan ve Cumhûriyê Kurdistan”, *Rojev*, Şomareyê 9-10 (1387), 139-144; Qasim Ehmedî, “Camieşinasîyê Tarîxê Hizbê Demokratê Kurdistanê Îran”, *Rojev*, Şomareyê 9-10 (1387), 251.

118 Ebdûlezîz Mevlûdî, “Dîdgahayê Peyremûnê Asîbşinasîyê Mudîriyet Der Kurdistan”, *Rojev*, Şomareyê 2 ve 3 (1385), 61-66; Xalid Ismaîlzade, “Erzyabîyê Muşareketê Siyasîyê Kordha”, *Rojev*, Şomareyê 2 ve 3 (1385), 67-112; Yunis Ebbasîzade, “Cumhûriyê Kordistan (1324) ve Tecrubeyê Edemê Temerkuz Der Îran”, *Rojev*, Şomareyê 2 ve 3 (1385), 137-148; Sibah Mofîdî, “Gozerî Ber Edem Temerkuzxahîyê Siyasî Der Îran (ba tekîd ber hizbê Demokratê Kordistan), *Rojev*, Şomareyê 2 ve 3 (1385), 169-212.

119 Nalî (1795-1855) yek ji navdartinên û bibandortirîn helbestavanê Kurd e. Ew li navçeya Xakûxûl a li ser bajarê Şarezûrê hatiye dinê. Şarezûr wê çaxê li ser împaratoriya Osmanî bûye.

mijarên civakî hûr bûne.<sup>120</sup>

Lêkolîneke deqîqtir a li ser vê kovarê nişan dide ku vê kovarê meyleke rexneyî ji bo civaka Kurdistanê û dewletên serwer ên li ser Kurdistanê ji xwe re kiriye armanc. Beşeke mezin a vê kovarê ji lêkolînên wergerandî pêk tê ku li welatên cihê, bi taybetî li welatên Ewropayê, hatine amadekirin. Ji ber vê yekê, kovar derbarê Kurdistanê Iraq, Turkiye û Sûriyeyê de xwedî gelekî nivîsan e. Lewra, di nav gotarên

- 
181 Ev enstîtu di sala 1379an de li Tehranê hatiye damezirandin. Di nav xebatên wan de weşandina du hejmar a kovara Kurdistanê heye. Hejmara duyem a vê kovarê wekî pirtûkekê bi navê *Kîtabê Kordistan hate çapkirin* ku di xwe de gotarên curbicur ên di qadên ziman, teorîyên wêjeyê û rojnamegeriya Kurdî dihewîne. Wekî nimûne em dikarin gotarên jêrê nîşan bidin: Reza Şecêî, “Rojnamegeriyê Kurdî: Gemey Bercistekirdinewey Qeran”, *Der Kîtabê Kordistan* (1382), 175-196; Rehber Mehmûdzade, “Awazmendîyê Kurdî Le Nêwan Nawerokê Nawçeyiyekan û Mêtode Cîhan yê Yekan Da”, *Der Kîtabê Kordistan* (1382), 41-62.

182 Ev navend ku di sala 1383yan de li Senendecê hatiye damezirandin, xwedî çar departmanên di qadên dîrok, wêje, avahîsazî, aborî û peywendiyên navxweyî de ye. Heta niha du konferansên herêmî û neteweyî di qadên hermeneotîk û sînemaya Kurdî de pêk anîne û pirtûkên derbareyê wêjeya Kurdî de weşandine.

Kurdistana Îranê de hatine kirin, nişan didin ku ji hêla erdnîgariyê ve lêkolîn zêdetirîn bi mijarên Kurd, Kurdistan, qewmîyet, gengeşiyên siyasî û pêşketina wîlayeta Kurdistanê û herêmên kurdnîşîn ên wîlayeta Azarbeycana Rojavayî re têkildar bûne. Li wîlayetên Îlam û Kirmanşahê lêkolînên bi vî rengî nîspeten kêmîtir hatine encamdayîn. Li van her du wîlayetên kurdnîşîn, lêkolînên zanistî yên bi Kurdistanê re têkildar, bêhtir di qadên arkeolojî (bi taybetî wîlayeta Îlamê), çanda rojane, erdnîgarînasî, giyannasiya herêmî, tenduristiyê de hatine encamdayîn. Hin lêkolînên derbarê jinên Kurd de ku behsa wan hate kirin, ji hêla zanyarên wîlayeta Kirmanşahê ve hatine kirin. Eger em wîlayetên Îlam û Kirmanşahê berawird bikin, divê bê gotin ku lêkolînên civakî û çandî yên ku li wîlayeta Îlamê tên kirin ji yên ku li wîlayeta Kirmanşahê tên kirin zêdetir in. Li wîlayeta Îlamê, lêkolîna mijar û meseleyên kronîk ên civakî, wekî xwekujî û xwesoji ji mijarên sereke bûne.

Li Îranê digel Kurdên niştecihê herêmên Kurdistanê, komeke mezin ji Kurdan, li herêmên Xorasana Bakur û Rezavî dijîn ku ji ber sedemên koçberiyê yên dîrokî ji demên Safewî û Efsarî ve li wan herêman in. Ev Kurd wekî Kurdên Kurmanc jî tên binavkirin. Derbarê vê koma Kurdan de lêkolînên nîspeten kêmîtir ji hêla nivîskarên Kurd û yê ne Kurd ve hatine encamdayîn. Lêkolînên derbarê vê herêma kurdnîşîn de bêhtir bi dîrok û çand, ziman û kevneşopiyê ve eleqedar bûne.<sup>183</sup>

Qada lêkolînên nivîskaran, bi taybetî nivîskarên Kurdistanê Îranê yên li welêt û derveyî welêt, tenê bi Kurdistanê Îranê re sînordar nînin. Heman awayî ku berê jî hate nişankirin, hejmarek ji lêkolînên dîrokî-siyasî ku li Îranê derbarê Kurdistanê de hatine kirin, bi giştî derheqê Kurdên welatên derdor de ne. Hinek nivîskarên Kurdên Îranê jî ku li derveyî Îranê niştecih in, lêkolînên xwe ne bi tenê bi Kurdistanê Îranê re têkildar, belkî bi beşên din ên Kurdistanê re jî têkildar nivîsandine. Di nav van lêkolînan de lêkolînên ku derbarê beşa Kurdistanê Sûriyeyê, Tirkîyeyê û Kurdên niştecihê welatên Ewropayê de cih digirin.<sup>184</sup> Ev rewş dibe ku ji ber çend hokaran pêk hatibin: Pêşî, girîngiya gelemşeya Kurd û Kurdistanê li welatên din ên wekî Iraq û Sûriyeyê ji bo siyaseta Komara Îslamî ya Îranê û di encamê de pejirandina wergerandina berheman an lêkolîna di vê qadê de ya li Îranê; duyem, meyla fikirî ya hinek nivîskarên Kurd ên ku bi rewşa siyasî û têkoşînî ya Kurdên welatên wekî Turkiyê û Suriyeyê re -berteka têkoşîna çepgiriyê- hemhal in; sêyem, cihê navnetewetiyê yê hin beşên Kurdistanê yên wekî Kurdistanê Iraq, Sûriyê û

183 Tevhîdî, *Hereketê Tarîxîyê Kord Be Xorasan*; Yûsûf Mutevellî Heqîqî, “Temîlî Peyremûnê Îlel ve Çigûnegîyê Muhaciretî Kurdha Be Xoresan, Fesilnameyê Fîqh ve Tarîxê Kûçendeganê Kurmanc (Şîraz: Keyanneşîr, 1389); Kelîmûllah Tovhîdî, “Ehemmîyet ve Esaletê Mûsiqiyê Kordîyê Xoresan”, *Meqamê Mûsîqayî, Şomareyê 3 (1377)*, 106-113.

184 Matin, *Kurds and American Liberalism*; Khalid Khayati, *Kurds in France and Sweden* (Linköping: Linköping University Press 2008).

Turkiyeyê ku di derdorên navneteweyî de di nav mijarên rojhilata navîn de cih girtine û bi meseleyên Kurdistana Îranê re wekhev nînin û ji ber vê yekê jî ji hêla hin nivîskarên ve bêhtir dibin şayanê lêkolînê.

Em dikarin heman diyardeyê di lêkolînên Kurdolojiya Kurdên Îranê de jî bibînin. Çawa ku hate gotin, lêkolînên derbarê Kurdolojiya Îranê de gelek nivîskarên Kurd bala xwe bêhtir didin wîlayeta Kurdistanê û wîlayeta Azarbeycana Rojavayî. Tiştê ku dixuye, tu nivîskarekî Kurd lêkolîneke giştî ya derbarê mijara Kurdistana Îranê de, yanî lêkolînên xwe derberê hemû Kurdên Îranê de nakin ku li wîlayetên Kurdistan, Azarbeycana Rojavayî, Kirmanşah, Îlam, Xorosan û cihên din dijîn. Bi heman sedemê di hejmareke zêde ya lêkolînên Kurdolojiya Îranê de têgehên “Kurd” û “Kurdistan”ê ji bo herêmên sînordar hatine bikaranîn. Ev heman rewş jî bo nivîskarên ne Kurd û Kurdên aktîf û heta nivîskarên Rojavayê jî derbas dibe ku di rabêjên nasyonālîzma Îranî-Farîsî û nasyonālîzma Kurdî ya hundirê Îran û derveyî Îranê de xwedan raman in. Nivîskarên Rojavayî jî di lêkolînên xwe de xwedî tarîfeke taybet a erdnîgariya Kurdistanê û meseleya Kurdî ne. Mînak, lêkolînên Kurdolojiyê di xebatên nivîskarên ne Kurd de wekî Ehmedî, Celayîpûr û Imtîsar, bêhtir li ser rewşa siyasî û civakî ya modern a wîlayetên Azarbeycana Rojavayî û Kurdistanê ne. Van nivîskarên lêkolînên derbarê wîlayetên Îlam û Kirmanşahê de wekî parçeyê ji Kurdistana Îranê encam nedane yan bala xwe nedane yan jî dibe ku ji ber rewşa resmî ya wîlayetan van her du wîlayetan wekî parçeyek ji Kurdistanê nedîtine. Di vê babetê de em dikarin navê xebateke îstîsna bi bîr bînin ku ji çend gotaran pêk tê. Ev gotar di dosyeyê de taybet a bi navê “Îlam û Kirmanşah”ê di kovara *Zirêbarê* de di sala 1385an de hatine weşandin. Di van gotaran de Îlam û Kirmanşah wekî parçeyê Kurdistana Îranê hatine dîtin. Di dawiyê de divê em vê xala girîng nîşan bidin ku baldariya nivîskar û lêkolînerên ku li ser beşên Kurdistanê rawestiyane, heta radeyê mezî li gorî nêrîn û baweriyên wan a derbarê beşên Kurdistanê de bûye. Nivîskarên ne Kurd li Îranê dibe ku beşên Azarbeycana Başûr û Rojava û wîlayeta Kurdistanê wekî Kurdistan fêhm kiribin. Lê nivîskarên Kurd ên li Îranê dibe ku xwedî fêhmek û çarçoveyê firehtir bibin ji bo sînorê Kurdistanê. Ji ber vê yekê, di xebatên wan de navên beşên Kurdistanê Iraq, Turkiye û Sûriyeyê jî tên dîtin.

## 7. ENCAM Û ENCAMGIRÎ

Gotara berdest hewl da heta radeya pêkan bi awayekî pîrhêlî qala lêkolînên Kurdolojiyê ya li Îranê bike. Di heman demê de di vê baweriyê de ye ku li Îranê şaxê zanîngê ya taybet a bi navê Kurdolojiyê tune. Saziyên ku bi vî navî ne, du heb jî wan navendên Kurdolojiyê ne ku li wîlayeta Kurdistanê ne; yek jî li enstîtuya Tehranê ye. Di vê gotarê de, têgeha “Kurdoloji li Îranê” jî bo hemû

lêkolînan hatiye bikaranîn ku ji hêla nivîskarên Kurd ên hemû beşên Kurdistanê yên wekî Kurdistanîya Turkiye, Iraq, Suriye û Îranê, ji hêla nivîskarên ne Kurd yên li Îranê û derveyê Îranê ve hatine nivîsandin. Ji ber vê yekê hewl hate dayîn ku ne tenê pirtûk, belkî heta radeya pêkan kovarên herêmî, giştî û navneteweyî bi zimanên Kurdî, Farisî û Îngilîzî bigirin ber çavan. Herwiha hewl hate dayîn ku derbarê naveroka gelek ji van lêkolînan de, çiqas ji destê me hat, bê behskirin da ku heta awayekî pêkan nîşandana Kurd û Kurdistanê ya di xebatên curbicur de bêne eşkerekirin. Bêguman, li vê derê bi tu awayî teşenasîya gotarî bi awayekî rasterast derbarê vê lêkolînê de pêkan nebû; lewra xebateke wiha hewceyê xebat û lêkolîneke zêde û berfirehtir ji vê gotarê ye. Digel vê rewşê, em dikarin encamên ji vê xebatê derketî di çend xalan de kurt bikin.

Lêkolînên Kurdolojiyê yên li Îranê ji hêlekê ve deyndarê lêkolînerên zanîngehî, zanyarên Kurd û yên ne Kurd ên nezanîngehî, rojnamevan, weşangerên pispor û aktivîstên siyasî yên li Îranê û derveyê Îranê ne; ji hêleke din ve deyndarê berhemên çapbûyî û wergerandî yên li Îranê û derveyê Îranê ne ku bi zimanên Kurdî û Farisî hatine weşandin. Ji ber vê yekê divê em rola girîng a wergêran di van lêkolînan de piştguh nekin.

Li Îranê, wergerandin û çapkirina berhemên derbarê Kurdên welatên wekî Iraq, Suriye û Turkiyeyê de gelek in. Herwiha, weşandina berhemên derbarê Kurdên Îranê de bê problem e ku bi nêrîna serdest a dewletê hatibin nivîsandin. Pirtirê berhemên di vê çarçoveyê de, derbarê bîranîn û belgeyên kesayetên siyasî yên Kurd û bi taybetî kesayetên siyasî yên Kurd ên piştî şoreşa Îslamî û kesayetên siyasî yên parçeyên din ên Kurdistanê de ne. Di navbera nivîsandina lêkolînên siyasî yên derbarê Kurd û Kurdistanê û nêrînên siyayî yên dewletan de peywendiyê nêzik heye. Xwendinên Kurdistanê piştî şoreşa Îslamî di pirtûk, kovar û bîranînan de, ev jî bi awayê ku di vê xebatê de hate behskirin, ji bilî pejirandina dezgehên îdarî û ewlehiyê nayên nivîsandin.

Her çend zêdetirê lêkolînên Kurdolojiyê ji aliyê nivîskarên Rojavayî ve hatine nivîsandin ku ji bo karên dîplomatîk, siyasî û îdarî li Kurdistanê û li welatên Turkiye-Osmanî, Iraq, Suriye û Îranê mane; hejmareke nekem a van berhemên derbarê Kurdistanîya Îranê de ji hêla nivîskarên ne Kurd ve hatine nivîsandin ku ji bo karên fermanberî û kar û barên dewletê hatibûn Kurdistanîya Îranê. Çavenêriyek bi sê hejmarên weşana Çeşmendazê Îran, vê angaştê ispat dîke û di rastiyê de nîşaneya nêrîna rojhilatnasyîyê ya nivîskarên ne Kurd ên Îranî ya derbarê Kurdistanê de ye. Berhemên ku nivîskarên ne Kurd ên li Îranê û derveyê Îranê derbarê Kurdên Îranê de nivîsandine, bêhtir qadên dîrok û siyaseta nûjen di hundirîn; yanî, Kurd û Kurdistanê bi giştî wekî bikerekî siyasî-dîrokî dinirxînin. Di rabêja dewletên serdest de ev nêrîn her dem ji bo bikerê navborî derbasdar bûye.

Lêkolînên ku nivîskarên Kurdên Îranî yên li Îranê û derveyê Îranê nivîsandine, tenê ne derbarê qada dîrok û siyasetê de; belkî derbarê qadên din ên civakî û çandî, hunerî, avûhewa û kanên xwezayî de bûne. Bi gotineke din, ji hêla nêrîna nivîskarên Kurd ve, Kurd û Kurdistan ne tenê wekî kirdeyeke siyasî tê dîtîn. Ji ber vê yekê, çawa ku ji agahiyên vê gotarê derdikeve; di van dehsalên dawî de mijar û meseleyên nû li lêkolînên Kurdolojiyê li Îranê zêde bûne.

Geşedana lêkolînên Kurdolojiyê, heta radeyeke zêde deyndarê pîrbûna zanyarên Kurd ên li Kurdistanê û derveyê Kurdistanê ye. Nêrîneke li ser berhemên weşandî, bi taybetî yên di kovaran de, vê rewşê destnîşan dîke.

Di berhemekê de ku derbarê Kurdistana Îranê de hatiye nivîsandin, em dikarin gelek dengên cihê bibihîsin: Dengên Kurdên ku li Îranê ne, di qadên cihê de bi meyla nasyonalîzma Kurdî, nivîsên xwe nivîsandine, dengên Kurdî ku li Îranê di çarçoveya rabêja nasyonalîzma Îranê de nivîsên xwe nivîsandine, dengên nûnerên siyasî yên Kurd û dengê lêkolînên nesiyasî yên li Kurdistana Îranê.

Gelek lêkolînên Kurdolojiyê, di qadên ziman û wêjeya Kurdî de derketine holê. Em dikarin vê rewşê di zêdebûna rojbiroj a hejmara ferhengên, çîrokên Kurdî, roman, wêjeya zarokan, berhemên folklorîk û wêjeya teorîk de bibînin. Herwiha, ev qad di xwe de ferhengnivîsînê ji dihindirîne. Hêjayê gotinê ye ku beşeke pir a van lêkolînan ji hêla lêkolîneran ve hatiye encamdayîn ku tenê bi meylên xwe yên takekes û helbet bi xwestinên civakî dest avêtine van xebatan. Herwiha damezîrandina beşên ziman û wêjeya Kurdî, di Zanîngeha Kurdistanê de hêviyên ji bo vê qadê berfirehtir kirine. Zêdebûna baldariya derdorên rewşenbîran ji bo girîngiya fêrkirina zimanê dayîkê û girîngiya wê di avakirina nasnameya neteweyî de ji bo geşedana lêkolînên Kurdolojiyê yên di vê qadê de xwedî roleke mezin e.

Di hundirê du dehsalên dawî de li Kurdistana Îranê, em şahidê hin lêkolînan dibin ku ji sûdên rabêja dîrokî-siyasî wêdetir, di lêkolînên bûyerên civakî, komelayetî, çandî, aborî, siyasî, dîroka kevn a Kurdistanê de hewl didin. Ev xebat ji gelek hêlan ve xwedî bingeheke zanistî û zanîngehî ne; lewra ev destelêkolîn ji ber van hêlan xwe li ber çavên me taybet in. Di vê babetê de, hin berhemên ku têne çapkirin û weşandin, heta radeyeke mezin li dijî daxwaz û pêwistiyan îroyîn ên civaka Kurdistanê ne. Ev destelêkolîn ji bilî rabêja siyasî û nasnameyî ya Kurd bûne û bi dewsa ku qala nasnameya Kurd bikin, derbarê Kurdan de têgeha “hemwelatî” û derbarê Kurdistanê de jî “civak” an “ferheng” bi kar anîne. Di van lêkolînan de pîrsgirêkên sereke yên bi nasnameya Kurdî re têkildar wekî pîrsgirêkên hemwelatîyê an pîrsgirêkên normal ên jiyana modern hatine destnîşankirin. Lewra ev rabêj dê çî navî hilgire ew qas ne girîng e, ya girîng ew e ku hereketeke teorîk a nû di lêkolînên Kurdolojiya Kurdistana Îranê de dest pê kiriye ku di wan de Kurdistan wekî civakên din bi ferheng, aboriya huqûqî û civakeke xweser hatiye pênasakirin.



Herî dawî, demekê Kurd wekî “yên din” dihatin lêkolînkirin, lê îro em dibînin ku ev “yên din” êdî bixwe bûne lêkolîner. Bi gotineke din, îro gelek ji lêkolînên Kurdolojiyê, ji hêla Kurdan bixwe tên kirin. Di rewşeke wiha de em dibînin ku li Kurdistanê, rabêja bi tenê dîrokî û siyasî tê terkkirin û meseleyên bi qadên civakî re têkildar dibin mijarên lêkolînê.



DOKUMENTEK / A DOCUMENT



# Nivîsteka Medreseya Mîr Hesenê Welî

## An Inscription of Madrasah of Mîr Hesenê Welî

Hanifi TAŞKIN\*

### PUXTE

Ji aliyê mîran ve di serdema mîrekiyên Kurdan de gelek medrese hatine avakirin. Medreseya Mîr Hesenê Welî yek ji wan medreseyan e ku di nav Kurdan de gelekî navdar bû. Medreseya Mîr Hesenê Welî li Mîrekiya Miksê ji aliyê mîrê Miksê ve hatiye avakirin. Heta niha derheqê vê medreyê de li ber destê me agahiyên vebir tunebûn. Di demeke nêzîk de nivîsteka Medreseya Mîr Hesenê Welî hate dîtin. Di vê dokumentê de me ev nivîstek da nasandin. Bi saya vê nivîstekê me pê zanî ku ev medrese ji aliyê kê ve hatiye avakirin û çend caran hatiye restorekirin.

**Bêjeyên Sereke:** Nivîstek, Medrese, Mîr Hesenê Welî, Kurd, Mîrekiya Miksê.

### ABSTRACT

A lot of madrasahs were built by Kurds in the period of the emirates. The madrasa of Mîr Hesenê Welî is one of those madrasahs which was famous among the Kurds. This madrasa was built by the Emirate of Miks in Miks District (Turkish: Bahçesaray). We haven't had certain information about this madrasa. An inscription of the Madrasa of Mir Hesenê Welî was found recently and in this document we are introducing that inscription. Thanks to this inscription we now know by whom this madrasa was built and how many times it has been restored.

\*Mamoste,  
Edremêt/Wan,  
hnftskn@hotmail.com

**Key Words:** Inscription, Madrasa, Mîr Hesenê Welî, Kurdish, The Emirate of Miks.

## 1. DESTPÊK

Belge, nivîstek û dokument encam e. Gotina dawiyê ye. Biryara teqez e. Ji ber vê yekê em ê serencama nivîsteka Medreseya Mîr Hesênê Welî di vê gotarê de parve bikin. Di demeke nêzik de hostayên ku medreseya Mîr Hesênê Welî restore dikir nivîstekekê di kavilê medreseyê de dît ku ev medreseya Mîr Hesênê di nav bajar de ye.

Ji bo me Kurdan derheqê kesayatiyên ku sed sal berê jiyabin, berhevkerin û xwegihandina agahiyên wan zor e. Nemaze ku ev kesayet pênc sed û şeş sed sal berê jiyabin û tu çavkanî jî li holê nemabin ev kar zehmettir e. Qaîdeyek heye ku dibêjin meriv li ku derê çi winda bike, divê dîsa li wê derê lê bigere. Em jî li gor vê qaîdeyê di vê gotarê de tarîxeke ku me winda kiriye di vir de ji nû ve nîşan didin. Peydabûna vê nivîstekê bû sedema lêkolîna me ya derheqê Mîr Hesênê de.

Berî ku em derbasî danasîna Mîr Hesênê Welî bibin li vir vegotina serboriya peydabûna vê nivîstekê jî îcap dike. Ev nivîstek di Çiriya Pêşîn a 2017an de ji aliyê hostayê ku medreseya Mîr Hesênê Welî restore dikir, di tûşa serdera medreseyê de ji bin xweliyê di nav kelefê medereseyê de hatiye dîtin. Piştî ku ev nivîstek peyda dibe, seydayê Mela Muhemed Gulnar jî vê yekê tê agahdarkirin. Gulnar niha nêzî Pira Sor avahiyek daye çêkerin û dîsa bi heman navî, yanî bi navê Mîr Hesênê Welî medrese vekirîye, li vir bi dersdayîna feqîyan re mijûl e. Gulnar Piştî ku di heqê vê nivîstekê de tê agahdarkirin, sûretê wê dikişîne û paşê jî nivîstekê teslîmê Şaredariya Miksê dike. Me jî xwe bi rêya Mela Muhemed Gulnar gihand vê nivîstekê ku me di vê xebatê de jî deşîfrefra wê daye. Berî ku em derbasî deşîfrasyona nivîstekê bibin, em ê pêşî derheqê Mîrên Miksê de, paşê jî derheqê jiyana Mîr Hesênê û kesayetên ku peywendîya wan bi Mîr Hesênê re hebûye, di vê xebatê de nîşan bidin.



Sûretêk ji Kavilê Medreseya Mîr Hesênê Welî

## 2. MÎREKTIYÊN MIKSÊ

Agahiyên ku Şerefxanê Bidlîsî di Şerefnameyê de dide ev in: “Sê bira yan kurap ji Bilêcana nehiya Xînisê hatine heremê. Ev her sê bira/kurap navê wan Dil, Bil û Biliç in. Dil Hîzan hilda, Bil Miks hilda û Biliç Îsparît hildaye.” (Bidlîsî, c.1, 2013: 253). Li Miksê piştê, neseba Mîrên Miksê bi Mîr Abdal dest pê dike. Ji Mîr Abdal bi navê Ehmed Beg û Hesên Beg du kur hebûne (Bidlîsî, c.12013: 260-261). Mîr Hesênê Welî ev e û weku Mîr Hesênê Iem tê nasîn. Ahmed Beg bûye Mîrê Miksê. Mîr Hesên jî ji bo birêvebiriya Karkarê bi alîkariya Mîrê Hekkarî Mîr Zeynel diçe Stenbolê û ji Qanûnî Sultan Suleyman (1494-1566) fermana mîrtiya xwe û emirnameya xwe ya ji bo Sancaxiyê ya Karkarê digire. Mîr Hesênê Welî bi vê emirnameyê bûye şîrikê desthilatdariyê. Li Miks û Karkarê sî sal mîrektiya wan didome (Bidlîsî, c. 1, 2013: 260-261). Zeynel Begê Mîrê Hekkarî jî ku hemdemê Şerefxanê Bidlîsî ye, di sala 1585an de dema ji êrîşeke sefera li ser Îranê vedigere, li ser nimêja esirê, di quncikeke Xana Elkê de li şehrê Merendê, ji aliyê Turkmenan ve tê kuştin. (Bidlîsî, c.1, 2013: 149), (*Tarihte Hakkari*, c.1, 2016: 284).



Sûretek ji Xebatên Arkeolojîk ên li ser Medreseya Mîr Hesênê Welî

## 3. DERHEQÊ MÎR HESENÊ WELÎ DE KÊ ÇI GOTIYE

### 3.1. Muhemedê Qutub

Muhemedê Qutubê ku malbata wan ji ber êrîşên Moxolan ji Bexdayê têne Serhedê. Seyîd Muhemed Paşa li Miksê li gundê Arvasê bi cî dibe. Muhemedê Qu-

tup kurê Seyîd Qasim e. Çawa ku Ekrem Boğra Ekinci di pirtûka xwe ya *Hayatî ve Hâtîralarıyla Seyyid Abdulkakîm Arvâsî* de nivîsiye: “Seyîd Emînê Xerbî derheqê Muhemedê Qutup û Mîr Hesenê Welî de wiha gotiye. Muhemedê Qutup, li gorî riwayetekî ji Berwariyê (Nûbihar, 137: 69), li gorî rîwayeteke din ji Hekariyê hatiye (Ekinci, 2017: 490). Hatiye gotin ku Mîr Hesenê Welî pêncî sal beriya Muhemedê Qutup, wefat kiriye. Muhemedê Qutup di vê bareyê de wiha gotiye: “Hatina min a Miksê, ji bo cînariya du kesan e. Ji miriyan; Mîr Hesenê Welî, ji saxan jî Elî Axayê Delî (eşîra Delan) ye. Ekinci bêyî ku çavkanî nîşan bide, dibêje ku Muhemedê Qutup, li Arvasê medrese û mizgefteke duqatî çêkiriye. Tarîxa vê kuliyyeyê li gorî teqwîma hîcrî 959 e û ew jî mîladî teqabûlê sala 1552an dike. Di heman cihî de dinivîse ku Mîr Hesenê Welî, di sedsala 15an de jiyaye. Ji mîrên Miksê Mîr Hesenê Welî alim û adil bûye. Ji bo êwirandina rêwiyan ku meriv ji Miksê bê Wanê, li serê çiyayê Axîrofê xanek çêkiriye.

### 3.2. Î. A. Orbelî

Îosîf Abgar Orbelî di 23ê Tebaxa 1911an de pênc hefte û di Nisana 1912an de deh hefte, li bajarê Miksê maye. Di pirtûka xwe ya bi navê *Li Miksê Foklor û Jiyana Rojane* de ku Sînan Hakan amade kiriye, dibêje ku derheqê xana Mîr Hesen de ku dêrek jî di nav xanê de ye, çîrokek tê gotin. Lê dibêje ku nayê bîra min ka kê ev çîrok jê re gotiye û çîrokê wiha neqil dike (Orbelî, 2011: 42):

“Dibê di sedsala 9an de ev der di destê qiralekî bi navê Hesen hatiye çêkirin. Ev çîrok hem di nav misilmanan de hem di nav ruhaniyan de û hem jî di nav xaçperestên Ermenî de belav bûye. Dibêjin ku Qiral Mîr Hesen çûye nêçîra xeza-lan. Dema daye pey xezalan, di daristanê de rêya xwe winda dike. Gêorgî hatiye hewara wî û ew ji belayê xelas kiriye. Dibe ku li ser vê qenciya Gêorgî Mîr Hesen jî di nav Xanê de jê re dêrek çêkiriye.”

### 3.3. Muhemed Emîn Zekî Beg

Muhemed Emîn Zekî Beg di pirtûka xwe ya *Kürtler ve Kürdistan Tarihi* de di bin serenavê Mîrektîya Hîzanê de ji Şerefnameyê agahiyek neqil dike û dibêje ku di sala 1005ê hîcrî de (ku beramberî 1596ê mîladî ye), biraziyê Mîr Hesen Mîr Abdalê II. Bin Emîr Ehmed di burca kela Miksê de ji ber serxweşiya vexwarina eraqê, dikeve xwarê û dimire. Bi vî şiklî derdikeve holê ku Mîr Hesen teqez beriya vê dîrokê wefat kiriye. (Zekî Beg, c.2, 2011: 698), (Bidlîsî, 2013: 260-261).

### 3.4. Mela Muhemed Gulnar

Mela Muhemed Gulnar derbarê vê meseleyê de dibêje ku Mîr Hesenê Welî sê xan çêkirine: Yek li serê rêya Kawaşê ku jê re Xana Pûtî dibêjinê. Ya duyem li ser rêya Şaxê ava kiriye ku xelk jê re dibêje Xana Duderî. Ya sêyem jî li aliyê Miksê ye ku Xana Mîr Hesen e û ya herî mezin ev e û niha jî li ser pêyan e.



### 3.5. Aydın Talay


Şaredarê Wanê yê kevin Aydın Talay di pirtûka xwe ya *Bizim Eller Vanê* de wiha dibêje: “Mîr Hesên ji begê Miksê ye. Ji zuriyeta Selçûqîyan e. Di navbera 1020-1070yan de ji Humusê hatine (Talay, 1998: 180). Lê Şerefxan di Şerefnameyê de di bin serenavê Hukûmdariya Hîzanê de behsa Mîrekên Miksê dîke û dibêje ku ji nehiya Bilêcana Xînisê hatine vir (Bidlîsî, c.1, 2013: 253). Li ser serilêdana Mîr Zeynel, di emirnameya ku di 30ê Adara 1556an de ji Beglerbegê Wanê re hatiye şandin, weha behsa Mîr Hesên tê kirin: “Mîr Hesênê ku xwediyê 60.000 akçe ceh e, bi her aliyê ve mukemmel û muselleh e” (Talay, 1998: 180). Dîsa heft sal piştî wê di 1562an de di emirnameyekê de ji Walî û Qadiyê Wanê re tê fermankirin ku biçin Mîr Hesênê Welî teftîş bikin (Talay, 1998: 180). Ev jî nişan dide ku Mîr Hesên di wê tarîxê de li heyatê ye.

### 3.6. Şakir Epözdemir

Nivîskar Şakir Epözdemir derheqê Mîr Hesênê Welî de, di pirtûka xwe ya bi navê *Medreseyên Kurdistanê Di Dewra Mîran û Neqşibendiyan De*, bêtî ku tu çavkaniyekê nişan bide, dibêje ku Mîr Hesênê Welî di navbera salên 1520 û 1566an de jiyaye. (Epözdemir, 2015: 59)

## 4. DOKUMENT: NIVÎSTEKA MEDRESEYA MÎR HESENÊ WELÎ

**Wêne/Photo:**



**Deşîfrasyona rêza yekem:**

چون ز فاضل میر حسن سی صد سنین شد نو ساخت  
 احمد از ولدش که ”با باغی علوم“ تاریخ داشت

**Latînîzekirin:**

Çûn zî fadil Mîr Hesên sî sed sinîn şod nev saxt  
 Ehmed ez weledeş ke ”ba baxî ‘ulûm” tarîx daşt

**Werger:**

Dema ku ji wextê mirovê xwedî fezîlet, Mîr Hesên sê sed sal derbas bû, ji zuriyeta wî Mîr Ehmed ji nû ve ev medrese çêkir. Yanî Mîr Ehmed piştî Mîr Hesênê xwedî fezîlet tê ku wî ji nû ve ev medrese çêkiriye.

**Translation:**

One hundred years after Mîr Hesên, who had merit, his descendant Mîr Ehmed rebuilt it. In other words, Mîr Ehmed comes after Mîr Hesên, who had merit, and he rebuilt this madrasa.

Seydayê Mela Muhemed Gulnar dibêje: “Dibe ku ev Mîr Ehmedê Kal be. Herwiha dibe ku ew kalikê Şêxê Bagê (?-1821) Miksî be. Lewma dibe ku Mîr Ehmed gotina “Ba baxî ulûm” ji bo vê kiribe tarîx. Îcar dema ku em “با باغی علوم” bi hesabê Ebcedê bihesibînin, tarîxa jêrîn derdikeve holê:

ب	2	ا	1	ب	2	ا	1	غ	1000	=1162
ي	10	ع	70	ل	30	و	6	م	40	

Dema ku em 300 salan jê derxin dike 862ê hîcrî ku ev jî teqabûlî 1457 yan jî 1458ê miladî dike. Mirov dikare vê yekê weku wefata Mîr Hesên bihesibîne. Jixwe tewatura giregirê Miksê jî li ser vê dîrokê ye.”

**Deşîfrasyona rêza duyem:**

چون ز میر احمد بگزشت صد و پنجاه و هشت  
نو ساخت ناظر و اولاد او سیرت فرشت

**Latînîzekirin:**

Çûn zî Mîr Ehmed beguzeşt sed û pencah û heşt  
Nev saxt nazir ve ewladê û sîret fireşt

**Werger:**

Dema ku ji Mîr Ehmed sed û pêncî û heşt sal borî; birêvebirê medereseyê û ewladê wî yê ku xuyê wî weku milyaketan e, medrese ji nû ve çêkir.

**Translation:**

One hundred and fifty eight years after Mîr Ehmed, the director of the madrasa and his son, whose owner is like an angel, rebuilt the madrasa.

**Deşîfrasyona rêza sêyem:**

میر مطیع الله یارب طایق نامش بدار  
کردی تاریخ بنایش «روضهء بلبال مزار»

**Latînîzekirin:**

Mîr Mutîullah ya Reb tabiqê nameş bedar  
Kerdî tarîxê binayêş “rewdeê bilbal mezar”

**Werger:**

Ew Mîr Mutîullah e. Ya Reb tu wî bikî mutabiqî navê wî. Yanî ya Rebbî tu wî bikî mutîê Xwedê. Mezelê ku baxçeyê dilan e, kiriye tarîxa bînayê.


**Translation:**

He is Mîr Mutîullah. My God, may you make him agree on his name. In other words, My God, may you make him obedient of God. The grave, which is garden of the hearts, he did the date of the building.

Li gorî hesabê ebcedê gotina روضهء بلبال مزار ev tarîxa jêrîn derdikeve holê:

ر	200	و	6	ض	800	ا	1	ب	2	=1320
ل	30	ب	2	ا	1	ل	30	م	40	
ز	7	ا	1	ر	200					

Ev tarîx jî li gorî mîladîyê teqabûlî 1902 yan jî 1903yan dike. Li gorî vê ev nivîsteka ku ji aliyê Mîr Mutîullah ve di dema temîrkirina medreseyê de nivîsiye, nîşan dide ku Mîr Ehmed 300 sal piştî Mîr Hesên ev medrese ji nû ve ava kiriye ku ew teqabûlê sala 1162yê hîcrî dike û 158 sal piştî Mîr Ehmed yanî di sala 1320ê hîcrî de Mîr Mutîullah vê medreseyê dîsa ava û temîr dike. Lewma jî dema ku em her du hesabên ebcedê didin ber hev em rastî tarîxa Mîr Hesên jî tîn ku ew jî 300 sal berî restorekirina Mîr Ehmed e ku dibe sala 862yê hîcrî ku ew jî teqabûlî 1457 an jî 1458ê mîladî dike.

**Wêne/Photo: Nivîstekeke din a bi heman naverokê****5. ÇAVKANÎ**

- Epözdemir, Ş. (2015), *Medreseyên Kurdistanê Di dewra Mîran û Neqşebendîyan De*, İstanbul: Weşanxaneyê Nûbihar.
- Bidlîsî, Ş. (2013), *Şerefname*, Kürt Tarihi C.1, İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- Zeki Beg, M. E. (2011), *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, C. 2. İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- Talay, A. (1998), *Bizim Eller Van*, Van: Van Belediyesi Yayınları.
- Eyyub, G. (2016), *Sempozyûma Dîroka Hekkariyê Ya Navneteweyî, Hakkari Beyliği Beyle-rin Şeceresi*?, Ankara: Canset Form Matbaacılık.

Taşkın, H. (2016), “Mela Haşimê Miksî û Ditina Terîq- un Necata Wî”, *Nûbihar* Kovara Çandî û Hunerî, Hejmar 137, r. 69.

### **5.1. Çavkaniya Devkî**

*Nav û Paşnav:* Muhemed Gulnar

*Temen:* 63

*Medrese:* Medreseya Mîr Hesenê Welî

*Cih:* Miks

*Kar:* Muderris

## DERBAREYÊ KOVARA NÛBIHAR AKADEMIYÊ DE

Kovara Nûbihar Akademî kovareke bihekem, akademîk û navneteweyî ye ku dê weşana gotarên kêrhatî yên di qada Kurdolojiyê de bike. Kovara Nûbihar Akademî, bi rêbazeke akademîk dê cih bide her cure nivîsên zanistî û bi nêrîneke multidisiplînerî dê nivîsên li ser zanistên ziman, edebiyat, çand, huner, aborî, civakî, olî û hwd. di nava xwe de bihewîne. Di kovarê de dê nivîsên mîna gotar, werger, tîpguhêzî, danasîna sempozyum, pirtûk û tezan biweşin. Gotarên ku ji bo weşandinê bîna şandinê de bi sistema “hekemtiya kor” ku dê ji hêla hekemen pişpor ên ku navên wan dê bîna weşartinê ve bîna nixandîna. Kovara Nûbihar Akademî dê di demsalên bihar û payîzê de salê du caran bê weşandin. Zimanê weşanê Kurdî (bi hemû zaravayên xwe ve) û Îngilîzî ye.

### Nixandîna Gotaran

1. Lêkolîna ewilîn ji aliyê lijneya weşanê / edîtoriyê ve tê kirin. Gotarên ku ji aliyê ruxsarî û naverokî ve ne li gorî rêzîknameyê hatibin nivîsandîna, bi armanca ku bîna rastkirin li nivîskaran tîna vegeandîna. Piştî wê merheleyê gotarên ku guncaw in (dema werger bin digel orjînalên wan) ji sê hekeman re tîna şandin. Biryara weşandîna gotarên ku ji kovarê re tîna şandin li gorî nixandîna van hekeman tê dayîn. Eger bi kêmasî du rapor erênî bin, wê demê gotarê weşandin. Dema ku hekeman sererastkirin xwestin û pêşniyazên xwe vegotin, gotar demildest ji nivîskaran re tê şandin û ji wan li gorî nêrîna hekeman daxwaza pêşxistin û guherandîna gotaranê kirin. Gotarên ku ji bo sererastkirinê ji hekeman re tîna şandin divê herî dereng di nava mehekê de dîsa ji kovarê re bîna şandin. Heger di dema sînorkirî de guherîn û sererastkirin nehatibin çêkirin û şandin, biryardayîna weşanê wê demê di destê lijneyê de ye. Di rewşa nelihêvkirina di navbera hekem û nivîskaran de, biryara weşandîna gotarê ya lijneya weşanê (edîtoriyê) ye. Gotarên sererastkirî di halên pêwîst de ji aliyê hekeman ve dîsa tîna kontrolkirin.

2. Nameya ji bo pejirandîna yan nepejirandîna gotarê tevî raporên hekeman ji nivîskaran re tîna şandin. Ev bi rîya postê, yan mailên elektrônîk dibe. Ji dema teslîmkirina nivîsê bigire heya derketina du jimarên kovarê ku gotar nehatibe weşandin, derbarê wê yekê de dê bo nivîskaran agahî bê dayîn. Gotarên ku hatine şandin biweşe jî neweşe jî li nivîskarê wê nayên vegeandîna.

3. Berpirsê naveroka gotaran nivîskar bi xwe ye. Gotarên ku ji bo weşanê tîn pejirandin, heqê weşana wan yê kovarê ye.

4. Bi şertê ku navê kovarê bê gotin, gotar û xebatên dîtbarî yên di kovarê de weşiyane dikarin bîn wergirtin.

### **Esasên Rastnivîs û Weşana Kovara Nûbihar Akademiyê**

1. Divê nivîsên ku bîne şandin berê li cihekî dî nehatibin weşandin, an jî ji bo weşanê divê di asta nixandî de nebin. Heger gotar berê di kongreyek, sempozyûmek an jî civînekê de hatibe pêşkêşkirin, bi şertê eşkerekirina dem û cihê wê û guncawdîtina lijneya weşanê dikare bê weşandin. Di vê babetê de hemû berpirsiyarî ya nivîskar e.

2. Divê gotar bi tevahiya metnê, serbend, nişê û referansên xwe ve tenê di rûyekî rûpelekî A4ê de bi karakterê Times New Roman û 12 pûntoyê bin û valahiya di navbera rêzan de 1, 5 înk be. Valahiya kêlekên rûpelan divê ji bo çep û rastê 4, 5; ji bo jor û jêrê jî 3 santîmetre be. Wekî di divê li koşeya rastê ya di binê rûpelê de jî jimara rûpelê bê nivîsandin. Gotar bi nişê û referansên xwe ve divê ji 30 rûpelî derbas nebe û heger hebe digel tablo, şikil û xêzan bê teslîmkirin. Divê ji bo şikil, wêne, grafîk û xêzan jimar bîne dayîn û dema cihê wê hat jimareyên wan bîn diyarkirin û sernavên wan li jêrê wan, heger ku ji cihekî din hatibe neqîlkin divê jêderka wan bê nivîsandin. Divê jêderk û referans di nava gotarê de (li gorî sîstema APAyê) bîn nivîsandin. Agahiyên berfireh ên jêderkan dê di dawîya gotarê de bê nivîsandin û heger rewşeke awarte hebe dikare di jêrenotê de jî bê nişandan.

3. Divê gotar ji bo ku karê rûpelsazî û çapê bi awayekî zûtir bê meşandin di dosyeya Microsoft Wordê de bîn nivîsandin û ji e-maila kovara Nûbihar Akademiyê re bîn şandin. Gotarên ku bi destan hatine nivîsîn dê neyên nixandin.

4. Di gotarên ku dê bîn şandin de divê ev rêz bê şopandin: Sernavê gotarê, navê nivîskar, puxte (abstract), deqê gotarê, referans û kurte (Extended Abstract)

Sernav divê bi her du zimanan (Kurdî-Îngilîzî yan jî Îngilîzî-Kurdî) bê nivîsandin. Divê sernav ji 14 kelîmeyan ne zêdetir be û herfên pêşî yên kelîmeyên girdek bin.

Li binê sernavê divê navê nivîskar an jî nivîskaran cî bigre. Di jêrenotê de divê unvana akademîk, sazî, fakulte, beş, binbeş û navnişana elektronîk bîn dayîn.

Divê bi her du zimanan puxte bîn nivîsandin. Puxteya yekem bi zimanê ku gotar pê hatiye nivîsîn, puxteya duyem jî bi zimanê duyem dê bê nivîsandin. Puxteyên Kurdî di gotarên Kurdî de, dê bi diyalekta ku gotar pê hatiye nivîsandin û di gotarên Îngilîzî de dê bi diyalekteke ku nivîskar tercîh bike bîn nivîsandin. Puxte divê ji 120 kelîmeyan ne zêdetir be. Piştî her puxteyekê divê peyvên bîngêhî yên gotarê bîn nivîsandin.

Divê di deqê gotarê de teqez beşên Destpêk (Introduction) Encam (Conclusion) û Jêderan (References) bîn nivîsandin. Eger pêwîstî hebe divê beşên wekî Rêbaz (Method), Nişane (Results), Gengeşe (Discussion) jî hebin.

Kurte (Extended Abstract) di gotarên Kurdî tenê de bi Îngilîzî tê nivîsandin. Kurte divê ji 500 kelîmeyî ne kêmtir û ji 750 kelîmeyî ne zêdetir be. Divê kurte hemû hizr û ramanên gotarê di nava xwe de bihewîne. Kurte, bi şiklê paragrafan tê nivîsandin û tê de sernavên navxweyî (destpêk, rêbaz û hwd.) û jêgîrên wekxwe cih nagirin.

5. Nivîskar bi xwe ji rastî û nerastiya jêderkan berpirsiyar e. Jêderk mîna ku li jorê ji hatiye eşkerekirin divê di nava gotarê de bîn nivîsandin, heger nişe hebin divê di hundirê gotarê de bîn nimrekirin û li jêra gotarê li gor nimreya xwe bîn nivîsandin.

6. Di nameya serîlêdanê de divê bê ifadekirin ku gotar resen e û ji hêla nivîskar an ji nivîskaran ve hatiye xwendin, pesendkirin û bi tu awayî û tu cihî de nehatiye weşandin.

## SERERASTKIRINA GOTARAN

Li nava welat û li dîyasporayê gelek pispor, akademîsyen û lêkolerên Kurd hene ku di qadên curbicur ên zanistên mirovayeti de xwe pêgihandine û di warên zanistî de kar dikin. Lê gelek ji van pisporan, ji ber mercên ku tê de pêgihîştine, nikarin gotarên xwe yên zanistî bi Kurdî binivîsin. Kovara Nûbihar Akademiyê bangewazî li kesên bi vî rengî dike ku ev kes gava yekem bavêjin û gotarên xwe bi Kurdî binivîsin. Dema ku gotarek bi Kurdî bê nivîsandin û ji bo sererastkirinê ji Nûbihar Akademiyê re bê şandin, ew gotar dê ji aliyê pisporan ve bê sererastkirin. Gotarên ku bîn şandin dê ji du aliyên ve bîn kontrolkirin û sererastkirin:

### 1. Sererastkirina Normal

Sererastkirina normal, ji aliyê rênivîsê ve tê kirin. Ev cure sererastkirin ji bo kesên ku Kurdiya wan a nivîskî û zanistî baş e, lê rênivîsa wan kêm e tê kirin.

### 2. Sererastkirina Pêşketî

Sererastkirina pêşketî, ji aliyê wate û jinûvesazkirina hevokan ve tê kirin. Ev cure sererastkirin ji bo kesên ku axaftina wan baş e, dikarin hizr û ramanên xwe derbasî nivîsê bikin, lê ji aliyê termînolojî û gramera Kurdî ve kêm in tê kirin.

**Têbînî:** Piştî ku karê sererastkirina gotarê qediya, êdî gotar ji hekeman re dê bê şandin. Xizmeta sererastkirina gotaran ji bo zaraveyên Kurmancî û Dimilî ye.

Ji bo sererastkirinê gotarên xwe bişînin vê mailê: [nubiharakademi@gmail.com](mailto:nubiharakademi@gmail.com)

## ABOUT NÛBIHAR AKADEMÎ JOURNAL

Nûbihar Akademî is an international peer-reviewed academic journal that will be publishing articles in the field of Kurdology. *Nûbihar Akademî* journal covers with an academic style all kinds of scientific articles and accommodates with a multi-disciplinary approach writings in the fields of linguistics, literature, culture, art, economy, sociology, religion, etc. Works such as articles, translations, transcriptions, symposium papers, books and theses will be published in the journal. The articles that are submitted to be published will be evaluated by expert peer-reviewers whose names will not be disclosed. Nûbihar Akademî is published biannually in spring and autumn. Publication languages are both Kurdish (all dialects) and English.

### Review Procedure for Articles

1. The first evaluation of the articles is done by the publication board. The articles that are not in line with regulations of the journal in terms of form and content are sent back to their authors to be corrected. In the next phase, the articles that are suitable (with original versions if they are translated from another language) are sent to three reviewers. The decision to publish the articles submitted to the journal is made according to critique of these reviewers. If at least two (out of three) referees decide that your manuscript can be published, then your study will be published (after a revision based on the suggestions). If the reviewers ask for corrections and make suggestions, the articles are immediately sent to their authors and are asked to make improvements and corrections to the articles according to suggestions of the reviewers. The articles sent for corrections must be resent to the journal at latest within a month. If requested corrections are not made and the articles are not resent to the journal before the deadline, the publication board has the authority (this time) to decide whether to publish the articles or not. In case of disagreement between the reviewers and the authors, the decision to publish the articles is taken by the publication board. The articles that have been corrected can be re-evaluated by the reviewers if necessary.

2. A letter about whether their articles are accepted or rejected along with copies of referee reports is sent to authors. This could be done via post or e-mail. Authors will be informed about the articles not published in the first two issues of the journal from the delivery date. Whether published or not, the submitted articles are never returned to authors.



3. Responsibility of opinions in the articles belongs to their authors. Publication rights of the articles approved to be published belong to the journal.

4. Articles and figures in the journal can be quoted on condition that the name of the journal is mentioned.

### **Writing and Publishing Guidelines of Nûbihar Akademi Journal**

1. The articles submitted for publication must not have been published somewhere else before or be in reviewing process. If an article has been presented in a congress, symposium or another meeting, it can be published upon approval of the board of publication and on condition that the date and place of the presentation are stated. The responsibility in this respect belongs exclusively to the author.

2. Articles including whole text, indented paragraphs, notes and references must be written only on one face of an A4 paper with 12 font size in Times New Roman writing characters and with 1.5 line of writing space; 4.5 cm space on both sides of paper and 3 cm space on the top and bottom of paper. The article must bear page numbers on right bottom corner. Articles must not be more than 30 pages, including notes and references, and must be delivered with tables, figures and drawings if any. Figures, photographs, graphics and drawings must be numbered and in the text when it is necessary the numbers must be mentioned and their titles must be written on the below. If they are quoted from a different source, then their source must be stated. The source and references must be given within the text (according to APA 6th Edition style). Referencing information must be provided in detail at the end of article and if necessary references can be given in footnote.

3. Articles must be written in a Microsoft Word file for faster page-setting and publication, and sent to Nûbihar Akademi Journal e-mail address. Handwritten articles will not be reviewed.

4. Articles must be submitted in the following order: Title (capital letters), name of author or authors, abstract, the full text, references and (Extended abstract).

The titles of the articles need to be written in both languages (Kurdish-English or English-Kurdish). Titles cannot be written with more than 14 words. The first letter of each word in the title should be capital.

Under the title, names of authors will be presented and in the footnote their academic appellation, their affiliation, department, research area, and e-mail addresses will be indicated.

Abstracts must be written in both Kurdish and English. The first abstract will be provided in the language the article is written in and the second abstract will be in the second language. In Kurdish articles the Kurdish abstract needs to be provided in the dialect the article is written in, while in English articles the abstract can be written in any dialect the authors prefer. Abstracts must be written with less than 120 words. Key words should be defined below every abstract.

The articles must absolutely have “Introduction” and “Conclusion” parts. Meanwhile, the “references” part must be placed, as well. References need to comply with the APA style instructions. In case of need, additionally parts such as “method”, “results” and “discussion” can be included.

Only in Kurdish articles, “(Extended abstract)”. part will be written in English. “Extended Summary” must be written in the range of 500 to 750 words and should not include subsections (e. g. Introduction, Method) and should reflect the basic ideas in the article in paragraphs. Quotation should not be included in the summary.

5. The author is responsible for the accurateness of references. As mentioned above, references must be given within the text. If there are any notes, they should be numbered within the text and placed at the bottom of the text by order of numbers.

6. It must be stated in the application letter that (a) the article is original, (b) it has been read and approved by author(s) and (c) it has not been published as a whole in any publication before.

### **Editing Articles (Proofreading)**

In the homeland and diaspora, there are many Kurdish researchers, experts and academics who have developed themselves in various scientific fields. However, lots of them cannot write their scientific articles in Kurdish because of the conditions and circumstances which they have lived in. Nûbihar Akademi Journal invites them to take the initiative for writing their articles in Kurdish. Articles which have been written in Kurdish and sent to Nûbihar Akademi Journal will be examined, reviewed and edited by our experts. The submitted articles will be checked and edited in two aspects:

#### **1. Normal Editing**

Normal editing is a kind of making corrections in spelling. This sort of proofreading is for the authors whose Kurdish knowledge is good enough and acceptable academically but not in spelling.

#### **2. Advanced Editing**

Advanced editing is reconstituting sentences semantically. This kind of proofreading is for the authors whose speaking skill in Kurdish is good enough to transfer their thoughts into writing but their terminological and grammatical ability in the language is not adequate.

**Note:** After editing of articles is completed, the articles will be forwarded to referees. Proofreading works will be done only in Kurmanji and Zazaki dialects. Proofreading and editing articles is a paid work.

- To have your articles proofread by our referees, please send them to the following e-mail; nubiharakademi@gmail.com